



# Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2025 Sayı/Hejmar/Issue: 11

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>

# KURDIYAT

Periodical Journal for Kurdish Studies

Year/Sal/Yıl: 2025 Issue/Hejmar/Sayı: 11  
e-ISSN: 2717-8315

**Publication Date | Tarîxa Weşanê | Yayın Tarihi**

June 2025 • Hezîran 2025 • Haziran 2025

**Period | Peryod | Periyod**

Biannually, June and December  
Salê du hejmar, Hezîran û Kanûna Pêşîn  
Yilda iki sayî, Haziran ve Aralık

**Scope | Vegirî | Kapsam**

Kurdish Language, Culture, Literature, History and Art  
Ziman, Çand, Wêje, Dîrok û Hunera Kurdî  
Kürt Dili, Kûltürü, Edebiyatı, Tarihi ve Sanatı

**Language Publication | Zimanê Weşanê | Yayın Dili**

Kurdî • English • عربي • فارسی • Türkçe

Articles should include a title, abstract (250-450 words), keywords (at least 5 concepts) in at least two languages, especially Kurdish and English, and should be prepared in accordance with APA 7 citation system.  
Gotar divê sernavê, kurteyê (250-450 peyv) û peyvên sereke (herî kêr 5 têgeh) bihewîne ku ew kêrî bi du zimanan bê nivîsîn, bi taybetî jî kurdî û îngilîzî, herwiha gotar divê li gorî sistema jêderan a APA 7ê bê amadekirin.  
Makaleler Kürtçe ve İngilizce başta olmak üzere en az iki dilde başlık, özet (250-450 kelime), anahtar kelimeler (en az 5 kavram) içerir ve APA 7 atıf sistemine uygun olarak hazırlanır.

**Executive Office | Rêvebirî | Yönetim Yeri ve Adresi**

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van  
e-mail: kurdijat@yyu.edu.tr | web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdijat>  
Tlf: 0432-225-1452 | Fax: 0432-225-1228

**Indexes | Dizinler**



**Data Platform | Veri Platformları**

ASOS, SOBIAD, OpenAIRE, Google Scholar, Ideallonline, İSAM, ResearchGate

Kurdijat is licensed under a Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International Licence.  
Kurdijat di bin lîsansa Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License de derbasdar e.  
Kurdijat Creative Commons Atıf-GayriTicari 4.0 Uluslararası Lisansı ile lisanslanmıştır.



**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**Owner | Xwedî | Sahibi**

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Rektörü | Rector of Van Yuzuncu Yil University  
Prof. Dr. Hamdullah ŞEVLİ

**Managing Editor | Editorê Berpirs | Sorumlu Yazı İşleri Müdürü**

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-6887-6223 | atimurtas@yyu.edu.tr

**Editor-in-Chief | Edîtor | Editör**

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-2602-484X | yakupaykac@yyu.edu.tr

**Assistant Editor | Cîgirê Edîtor | Editör Yardımcısı**

Dr. Öğr. Üye. Mehmet YILDIRIMÇAKAR, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0003-3565-1156 | memycakar@yyu.edu.tr

**Editorial Board | Lijneya Weşanê | Yayın Kurulu**

Prof. Dr. Mehmet Salih GECİT | Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-7212-2291 | msgecit@agri.edu.tr

Prof. Dr. Abdullah KIRAN | Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-9136-7665 | a.kiran@alparslan.edu.tr

Prof. Dr. Mehmet Nesim DORU | Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-3519-7654 | mehmetnesim.doru@asbu.edu.tr

Prof. Dr. Atik AYDIN | Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-5995-945X | atik.aydin@asbu.edu.tr

Prof. Dr. Kemal KAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-8797-5980 | kemalkaya@yyu.edu.tr

Doç. Dr. Abdulhalim OFLAZ, Iğdır Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-9921-5444 | abdulhalim.oflaz@igdir.edu.tr

Dr. Hewa Salam KHALID | Indiana University, USA  
ORCID: 0000-0003-4513-6596 | hewasalam@gmail.com

Dr. Nevzat AĞÇAKAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-4606-9279 | nagcky@yyu.edu.tr

**Advisory Board | Lijneya Şêwrê | Danışma Kurulu**

Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-5914-8323 | hcicek@yyu.edu.tr

Prof. Dr. Mahmut DÜNDAR | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0003-1856-6494 | mahmutlardan@hotmail.com

Prof. Dr. Hayreddin KIZIL | Dicle Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-9165-3274 | hkhayreddin@gmail.com

**Sekretariat | Sekreterî | Sekreteryâ**

Öğr. Gör. Hacı YILMAZ, Van YYÜ  
ORCID: 0000-0003-4034-8565 | haciyilmaz@yyu.edu.tr

**Field Editor (Language and Grammar) | Edîtorê Biwarî (Ziman û Rêziman)**

Doç. Dr. Zafer AÇAR, Bingöl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-5323-9531 | zacar@bingol.edu.tr

**Field Editor (Modern Literature) | Edîtorê Biwarî (Edebiyata Klasîk)**

Doç. Dr. İlyas SUVAĞCI, Hakkari Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-6409-1229 | ilyassuvagci@hakkari.edu.tr

**Field Editor (Classical Literature) | Edîtorê Biwarî (Edebiyata Klasîk)**

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-6315-6075 | nesimsonmez@yyu.edu.tr

**Field Editor (Cultural Studies) | Edîtorê Biwarî (Xebatên Çandî)**

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-4621-435X | hozdas@yyu.edu.tr

**Field Editor (Folklore and Folk Literature) | Edîtorê Biwarî (Folklor û Edebiyata Gelêrî)**

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI, Mardin Artuklu Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-7744-1646 | kenansubasi@artuklu.edu.tr

**Book Review Editors | Edîtorên Nirxandina Pirtûkan**

Dr. Öğr. Üye. Abdulsemet AYDOĞDU, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-0312-4928 | saydeniz@yyu.edu.tr

**Ethics Editor | Edîtorê Etîkê**

Doç. Dr. Kenan BULUT | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0003-4771-0459 | kenanbulut80@yyu.edu.tr

**Index Editor | Edîtorê Îndeksan**

Dr. Öğr. Üye. Sinan ÇAKAR | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr

**Kurdish Language Editors (Kurmanji) | Edîtorên Zimanî (Kurmançî)**

Dr. Ahmet SEYARİ, MEB, Ankara  
ORCID: 0000-0002-9388-8517 | ehmedseyari@gmail.com

**Kurdish Language Editors (Sorani) | Edîtorên Zimanî (Sorani)**

Dr. Faez Aziz ALI, Araştırmacı-Yazar  
ORCID: 0000-0003-3459-4225 | faezazizali@yahoo.com

**Kurdish Language Editors (Zazaki) | Edîtorên Zimanî (Kirdkî)**

Dr. Buşra GÖKALP, Bingöl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-7374-2388 | bgokalp@bingol.edu.tr

**English Language Editors | Edîtorên Zimanî (Îngîlîzî)**

Dr. Öğr. Üye. Nevzat AĞÇAKAYA, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-4606-9279 | nagcky@yyu.edu.tr

**Dr. Sami Çeliktas, MEB, Van**

ORCID: 0009-0005-3190-7179 | samiceliktas030@gmail.com

**Turkish Language Editors | Edîtorên Zimanî (Türkçe)**

Dr. Öğr. Üye. Bilal DEMİR, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-2913-7946 | bilaldemir@yyu.edu.tr

**Persian Language Editors | Edîtorên Zimanî (Farsi)**

Öğr. Gör. Mazhar Ebrahimi, University of Kurdistan, Iran  
ORCID: 0009-0006-1566-0572 | mazharebrahimi@gmail.com

**Arabic Language Editors | Edîtorên Zimanî (Erebî)**

Dr. Faez Aziz ALI, Araştırmacı-Yazar  
ORCID: 0000-0003-3459-4225 | faezazizali@yahoo.com

**Final Proofreading | Xwendina Dawî | Son Okuma**

Dr. Öğr. Üye. Sinan ÇAKAR | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr

**Website Editor | Edîtorê Malpera Kovarê**

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-2602-484X | yakupaykac@yyu.edu.tr

**Layout Editor | Edîtorê Mîzanpajê**

Öğr. Gör. Erdal YILDIZ | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-5285-3492 | erdalyildiz@yyu.edu.tr

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Kurdiyat, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Haziran- Aralık) olarak yayımlanır. Dergide Kürt dili, kültürü, edebiyatı, tarihi ve sanatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, İngilizce, Arapça ve Farsça dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir. Kurdiyat'da yayınlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur.

Kurdiyat, which is a scientific publication of Van Yüzüncü Yıl University, Institute of Living Languages, is an international refereed journal and is published twice a year (June - December). The journal includes scholarly works in the fields of Kurdish language, culture, literature, history and art written in Kurdish, Turkish, English, Arabic and Persian. The authors are responsible for the content of the articles published in Kurdiyat.

## contents | naverok | içindekiler

### Research Articles | Gotarên Lêkolînê | Araştırma Makaleleri

- 1- BERAWORDIYA DESTAN Ê MESNEWIYA SIYABEND Ê XECÊ JI ALİYÊ MOTÎF Ê VEGÊRANÊ VE**  
*Comparison of the Epic and the Masnavi of Siyabend and Xece in terms of Motif and Repetition*  
*Siyabend ile Xecê Destanı ve Mesnevisinin Motif ve Anlatı Açısından Karşılaştırılması*  
Özcan ÇİÇEK.....6-18
- 2- DANASÎNA NAVDARÊN KURDAN BI NAVBEYNKARIYA PIRTÛKÊN ZAROKAN**  
*Introducing Kurdish Notables through Children's Books*  
*Kürt Büyüklerinin Çocuk Kitapları Aracılığıyla Tanıtımı*  
Ferhat ÇİFTÇİ.....19-33
- 3- HAFİZEYA KOLEKTÎF Ê REWŞA MEKANÊN HAFİZEYÊ DI ROMANÊN OMER DILSOZÎ DA**  
*The Status of Collective Memory and Memory Spaces in Ömer Dilsoz's Novels*  
*Ömer Dilsoz'un Romanlarında Kolektif Hafıza ve Hafıza Mekanlarının Durumu*  
Leyla POLAT.....34-45
- 4- نەحمەد موفتیزادە و بێزافین نەوی یێن نەتەویدی و نایینی ل رۆژھەلاتی کوردستانی (1932-1993) خواندنەکا میژوویی**  
*Ahmed Muftizade and His National and Religious Role in Eastern Kurdistan (1932-1993) A Historical Study*  
*Ahmed Muftizade ve Doğu Kürdistan'daki Ulusal ve Dini Rolü (1932-1993) Tarihsel bir İnceleme*  
Karwan Salih WAISY.....46-66

## BELGENAME

### Biography | Jînenîgarî | Biyografi

- 5- محمد زاهر گولعهنبري (1869-1922): سەرپۆردەى موفتييهكى هەلەبجەيى لە نەرشيفى عوسمانيد**  
*Muhammed Zahir Gulanberi (1869-1922): The Career of a Halabjani Mufti in the Ottoman Archives*  
*Osmanlı Arşivlerinde Helebçeli Bir Müftünün Hayatı: Muhammed Zahir Gulanberi (1869-1922)*  
Hemin Omar AHMAD.....67-82

## KITABIYAT

### Book Review | Nirxandina Pirtûkê | Kitap Değerlendirmesi

- 6- EDEBİYATA BERXWEDANÊ**  
*Resistance Literature*  
Ramazan KAYA.....83-90



# BERAWIRDIYA DESTAN Û MESNEWIYA SIYABEND Û XECÊ JI ALİYÊ MOTÎF Û VEGÊRANÊ VE

Özcan ÇİÇEK

Comparison of the Epic and the Masnavi of Siyabend and Xece  
in terms of Motif and Repetition

Siyabend ile Xecê Destanı ve Mesnevisinin Motif ve Anlatı Açısından Karşılaştırılması

**Özcan ÇİÇEK**

ORCID: 0000-0002-8880-4251 | cicek2134@gmail.com  
PhD Student, Institute of Social Sciences, Department of Turkish  
Language and Literature. Van Yüzüncü Yıl University, Türkiye.

**Citation/Jêgir/Atîf:**

Çiçek, Ö. (2025). Berawirdiya destan û mesnewiya Siyabend û Xecê  
ji aliyê motîf û vegêranê ve. *Kurdiyat* (11), 6-18. DOI:  
10.55118/kurdiyat.1654368

**Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:**

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi  
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 09.03.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 21.06.2025  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2025

**Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:**

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

**Plagiarism Checks/Kontrola İntihalê/Benzerlik Kontrolü:**

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

**Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:**

It is declared that scientific and ethical principles have been followed  
while carrying out and writing this study and that all the sources used  
have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsina  
vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû  
çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken  
ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm  
kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

**Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:**

There is no conflict of interest between the author and any parties in  
the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya  
berjewendîyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

**Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:**

The authors acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı  
desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
haklarını saklı tutarlar.

### Kurte

Mijara vê xebatê berawirdkirina destan û mesnewiya Siyabend û Xecê ye. Di vê gotarê de herdu berhem, li gorî edebiyataberawirdî hatine nîrxandin. Armanca vê xebatê nîrxandina her du berheman li gorî mijar, motif, form, cudahî û manendiyên hev in. Siyabend û Xecê, di nav kurdan de bi kevneşopîya sedan salan bi awayekî devkî û bi rêya efsane û destanan ve heta îro hatiye. Siyabend û Xecê bi forma destanî jî aliyê dengbêjên wekî Şakiroyê Muşî, Salihê Qubînî, Îsa Berwarî ve hatiye zaravakirin. Ev destana folklorîk di serdema modern de gelek caran bi vîariantên cuda hatiye tomarkirin û weşandin. Siyabend û Xecê di destpêkê de metnekê devkî ye û di nav xwe de hêmanên mitolojîk jî dihewîne. Di nav pêvajoyê de derbasî nivîsê bûye û li gorî herêman vîariantên cuda hatine afirandin. Her çiqas li ser navlêkirina metnê nîqaşên zêde hebin jî, ji ber ku di metna Siyabend û Xecê de taybetiyên destana zêde ne û berhevkarê metnê bi şiklê destanê metnê bi nav kiriye, em jî di vê xebatê de metnê dê wekî destan bi nav bikin. Di vê gotarê de varyanta devkî ya ku ji aliyê Ahmet Aras ve hatiye berhevkirin û mesnewiya Dilbikûlê Cizîrî ya ku bi forma mesnewiyê hatiye nivîsîn, ji aliyê hêmanên mitolojîk yê wek şûr, gustîlk, xewn û hvd., motif, naverok û vegêranê ve bi awayekî berawirdî hatine nîrxandin. **Peyvên Sereke:** vegêran, mesnewî, destan, berawirdî, motif, Siyabend û Xecê.

### Abstract

The subject of this study is the comparison of epic and the Mesnewi version of Siyabend and Xecê. In this article, both works have been evaluated according to comparative literature. The aim of this study is to evaluate the two works according to their themes, motifs, forms, differences and similarities. Siyabend and Xecê has been passed down among the Kurds through oral tradition and legends and epics for hundreds of years. Siyabend and Xecê has been narrated in epic form by singers such as Şakiroyê Muşî, Salihê Qubînî, Îsa Berwarî. This folkloric epic has been recorded and published many times in different variants in the modern era. Siyabend û Xecê is originally an oral text and also contains mythological elements. In the process, it has been transferred to written form and different variants have been created. Since the text of Siyabend û Xecê has many epic features and the compiler of the text has named the text as an epic, we will also call the text as an epic in this study although there is much debate about the naming of the text. In this article, the oral variant compiled by Ahmet Aras and the Dilbikûl Ciziri mesnevi written in the form of a mesnevi are comparatively examined in terms of mythological elements such as swords, rings, dreams, etc, motifs, content, and interpretation.

**Keywords:** narrative, masnavi, epope, compare, motifs, Siyabend û Xecê.

### Öz

Bu çalışmanın konusu Siyabend û Xecê Destanı ile mesnevisinin karşılaştırılmasıdır. Bu makalede her iki eser, Karşılaştırmalı edebiyat yöntemine göre değerlendirilmiştir. Bu çalışmanın amacı her iki eseri de konu, motif, anlatım, biçim, farklılık ve benzerliklerine göre değerlendirmektir. Siyabend û Xecê, Kürtler arasında yüzlerce yıllık mit ve destanlardan beslenerek sözlü gelenek yoluyla günümüze kadar ulaşmıştır. Destan özelliği taşıyan eser, Şakiroyê Muşî, dengbêj Salihê Qubînî Îsa Berwarî gibi dengbêjler tarafından seslendirilmiştir. Folklorik özellikler taşıyan bu destanın, modern dönemde farklı versiyonları derlenmiş ve yayımlanmıştır. Temelde sözlü gelenekten gelen ve içinde çok sayıda mitolojik unsurlar barındıran Siyabend û Xecê adlı destan zaman içinde yazıya geçirilmiş ve süreçte çok fazla değişime uğramıştır. Her ne kadar metni adlandırma noktasında çeşitli tartışmalar olsa da metinde destan özelliklerinin fazla olması, metni derleyen yazarın destan şeklinde adlandırması nedeniyle bizde bu çalışmada metni destan olarak adlandırmayı uygun gördük. Bu çalışmada Ahmet Aras'ın derlediği destansı versiyon ile Dilbikûlê Cizîrî tarafından mesnevi biçiminde kaleme alınan versiyonu, kılıç, yüzük, rüya ve benzeri mitolojik unsurlar, motif, içerik ve anlatı bakımından karşılaştırmalı olarak incelenmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** anlatı, mesnevi, destan, karşılaştırma, motif, Siyabend û Xecê.

## Destpêk

Piraniya berhemên nivîskî bingeheên xwe ji berhemên folklorik û edebîyata devkî werdigirin. Yek ji van nimûneyan ya herî mezin Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye ku çavkaniya xwe rasterast ji destana Memê Alan girtiye. Ji xwe Xanî di Mem û Zînê de di derbarê vê mijarê de wiha dibêje:

Hindek ji fesaneyê di Bohtan

Hindek di behane hin di bûhtan (r. 778).

Bi heman awayî Siyabend û Xecê jî di destpêkê de bingeha xwe ji edebîyata devkî werdigire. Bi rêya stran û kilamên dengbêjan, çîrokbêjan di nav gel de belav dibe. Ev belavbûn jî nîşan dide ku di edebîyata devkî de di navbera varyantên folklorik de gelek cudahî çêdibin. Her wuha “Çawa ku keresteyên folklore dibin mijara berhemên edebî, her wiha berhemên edebî jî piştî demekê ger ku di nav zimanê gel de biguherin û çend varyantên wan ên cuda peyde bibin, hingê ew jî dibin berhemên folklorê.” (Yıldırım, Pertev & Aslan, 2013, r. 39). Di vî warî de mirov dikare Destana Siyabend û Xecê ya dengbêjan, mesnewiya Siyabend û Xecê ya Dilbikulê Cizîrî û romana Siyabend û Xecê ya Ramazan El- Butî, weke mînak nîşan bide.

Siyabend û Xecê, di destpêka xwe de berhemekê devkî ye û di nav Kurdan de bi vî awayî berbelav bûye. Ji aliyê folklorê ve gelek varyantên vê destanê hene. Cara pêşîn 1845an de ji aliyê Mele Mehmudê Bazîdî vebatîye nivîsîn. Piştî re jî di sala 1932yan de di hejmarê 13an ya *Hawarê* de bi navê *Çirçiroka Siyabendê Silivî* (r. 201) hatiye weşandin. Di sala 1936an de Heciyê Cindî û Eminê Evdal bi navê *Folklorê Kurmanca* xebateke hevpar li dardixin û di vê xebata xwe ya hevpar de cî didin destana Siyabend û Xecê. Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl di sala 1978an de di nava *Zargotina Kurda* de cî dane destana Siyabend û Xecê. Hüseyn Erdem (1990), Zeynelabidin Zinar (1992), Ahmet Aras, (1993) bi heman navî destan tomar kirine. M. Saîd Ramazan El-Bûtî di sala 1998an de bi navê *Siyamend Ibnu Edxal* romanekê bi zimanê Erebi dinivîse. Ronî War jî di 2011an de bi navê *Siyabend û Xecê* romanekê dinivîse. Siyabend û Xecê, cara dawîn ji aliyê Dilbikulê Cizîrî ve bi terzê mesneviyê hatiye nivîsîn.

8

Di destana Siyabend û Xecê de varyantên ji hev cuda derketine holê. Guhertinên mezin tê de çêbûne. Di hin varyantan de zarokatiya Siyabend weke tiştêkî ji rêzê hatiye vegotin lê di hin varyantan de zarokatiya Siyabend weke lehengên destanan, bi rengekî derasayî hatiye vegotin. Siyabend hê di zarokatiya xwe de “ji hevalên derdora xwe bihêztir, wêrektir, heya wê çaxê karê ku kesî neşiyabû pêk bîne, hel kiribû.” (Valî & Subaşı, 2022, r. 118) Her çiqas di navbera varyantan de cudahî hebe jî guhertin hatibin çekirin jî mijara sereke weke xwe maye û xwe parastîye. Destan, çîrok û efsane bi piranî bi saya dengbêjiyê gihîştine heya îro. Hin dengbêjan li ser evînê, hin dengbêjan li ser bingeha civakê, hin dengbêjan jî li ser zilma axa û began ava kiriye Dengbêj bi vî awayî: “cîhê xwe di nav perwerdekirina gel de digre.” (Filiz, 2014, r. 56). Li gel vê yekê cewhera destanê -ku evin û lehengiye- neguheriye û destan mayinde bûye. “li ser zimanê dengbêjan bi sedan sala ev evîn bi notaya nemiriyê li hember mirinê xwe parastîye” (Aras, 2016, r. 5). Ev jî ji bo edebîyata Kurdî ya devkî bûye dewlemendiyeke mezin û nirxeke neteweyî.

Di vê gotarê de ji bo berawirdiya her du berhemên, me pirtûka Siyabend û Xecê ya ku ji aliyê Ahmet Aras ve hatiye berhevkirin û ji bo mesnewiya Siyabend û Xecê jî me kîteba Siyabend û Xecê ya Dilbikulê Cizîrî esas girt. Ahmet Aras di derbarê xebata xwe de dibêje ku: “Min ev destan ji Sebrîkoyê Gundê Xellê girt.” (Aras, 2016, r. 5) Ev her du berhem ji bo berawirdî wek bingehe hatin hilbijartin û berawirdî, li gorî wan her du berhemên hatin çekirin. Ji ber ku: “Lêhûrbûyîna berhemên an jî nivîskarê jî yekî zêde, berî her tiştî navbereke rexneyî û objektîfî bidest dixe. Berawerdkirin rasterast li ser du berhemên nayê çekirin. Hevce ye ku berhemên tîn berawerdkirin taybetiya berawirdî nîşan bidin. Ev taybetî jî manendiya mijar, motif û teknîkên vegotinê de hevbandorê hevdu bin.” (Aytaç, 2003, r. 105). Li gorî vê esasê herdu berhemên me jî taybetiyên berawirdiyê didin. Di herdu berhemên de jî evîn heye û serborîn di herdu berhemên de jî hevbeş e.

Berawerdkirin rasterast li ser berhemên sînordar nayê çekirin. Berhemên ku tîn berawerdkirin dîve taybetiya berawirdiyê di naverokên xwe de bi rengekî zelal nîşan bidin da ku ev taybetî jî di manendiya mijar, motif û teknîkên vegotinê de hevbandorê li ser hev bikin. Ev her du berhemên ku hatine nirxandin jî vê taybetiya berawirdî didin. Di bingeha her du berhemên de jî evînek û serpêhatiyên hevbeş hene. Berawirdî ne rexneya berhemên e, bereksî vê heke lekolîneke rast bê çekirin, qîmetê berhemên bi vî bilindtir dibe. “Dema ku berawirdî tê çekirin tiştên ku hatiye vegotin û hin tişt jî di kûraniya vê vegotinê de derdikeve

hole.” (Aslan, 2015, r. 87). Ev jî nîşan dide ku berawirdî rasterast rexnekirina metnan nîne, bereksê wê yekê bi saya lêkolînê hin tiştên teze û nû lê zêde dibe.

Bingeha destanê ji aliyê dengbêjan ve hatiye vegotin û her dengbêjekî li gor xwe hin tişt lê zêdekirine. Gelek caran li gor dem û herêman guherîn tê de çêbûne. Lewma jî gelek varyantên destanê derketine holê. Ji ber ku berhem devkî ne ew rewş jî dibe tişteke ji rêzê. Her çiqas berhemên nivîskî çarçoveyên wan diyar bin jî yên devkî serbixwe ne û bêsînorin.

## 1. Binavkirina Metna Siyabend û Xecê

Gelo Siyabend û Xecê li gor cureya xwe ya edebî destan e an çîroka gel e? Ev arîşe hin nîqaşan jî bi xwe re derdixe pêş. Yek ji van nîqaşan jî binavkirina metna Siyabend û Xecê ye. Hin lêkolîner, Siyabend û Xecê wek çîroka gel dipêjirînin ku di kovara Hawarê de jî bi navê *Çirçiroka Siyabend û Xecê* derbas dibe. Li dijî vê yekê hin lêkolîner jî metnê wek destan dipêjirînin. Li gorî senifandina Kenan Subaşı, destana Siyabend û Xecê di bin navê destanên evînî yên mêmûyî de ne ku evînî û lehengî têkel in. Subaşı diyar dike ku “di kurdî da meneyeke berfireh a destanê heye. Em hemû vegêranên ku xisûsiyetên lehengîyê yan jî şopên wê tê da mabin an jî vegêranên ku ji wê tradîsyonê nizilî bin weku destan qebûl dikin.” (2024). Berhevkarên wekî Ahmet Aras jî metnê wek destan bi nav dikin. Wexta ku em li şêwe û naveroka metnê dinêrin, em dibînin ku di nava metnê de hemanên destanan yên wek xewn, şûr, hesp, dîtîna kalekî û hvd. zêdetir ci digirin. Ev tişt jî nîşanî me didin ku ev metin ji çîroka gel bêtir metnekê destanî ye.

Me jî di xebata xwe de ji ber du sedeman metin wek destanê pêjirand û bi vî şiklî jî binav kir. Ya ewil taybetiyên ku me li jor behs kirin û ya duduyan jî ji ber ku di vê lêkolînê de metna Ahmet Aras esas hatiye girtin û wî jî metnê wek destan bi nav kiriye. Lewma me jî wek destan bi nav kir. Bi vî awayî me hewl da ku nîqaşên ser metnê zelal bikin û bi awayekî berhevkarî metnê ji nû ve bidin nasîn. Siyabend û Xecê bi awayên cur bi cur hatiye vegotin û nivîsîn. Ji destpêkê heya niha wek destan, çîrok, pexşan, roman hatiye nivîsîn û her cure, li gor xwe hin tiştên nû lê zêde kiriye. Siyabend û Xecê, cara dawî bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Di vê xebatê de me hewl da ku cudahiyan navbera destan û mesnewiyê bi hûrgulî vekolin.

## 2. Mijarên Destan û Mesnewiya Siyabend û Xecê

### 2.1. Sêwî û Êtîmbûna Siyabend

#### 2.1.1. Di Metna Destanê de

Di çîrokên gelêrî de trajediya leheng bi mirina dê an jî ya bavê dest pê dike. Lê bi piranî dê li pêşiya bavê dimire û leheng dikeve berdestê damariyê ango jinbavê ku ew jî niheqî û zordestiyê li leheng dike.

Heman tişt di destana Siyabend û Xecê de jî derdikeve pêşberî me. Li Silîva nexweşiyek derdikeve, dê, bav, xwişk û birayên Siyabend tev pê dikevin û dimirin. Siyabend di biçukatiya xwe de bê dê û bê bav dimîne. Lewma jî Siyabend êtîm û sêwî li cem ap û amojina xwe dibe berdestî. Her du jî zor û zilmê, tedayiyê li Siyabend dikin. Kar û barên giran pê didin kirin. Wî birçî û tazî dihêlin, li wî dixin û rojekê wî ji malê diqewitînin. Siyabend diçe li kêleka gund, di qefa kendalekî de ditele û di xew re diçe. Pirê caran di tariya şevê de ji xew hişyar dibe.

Carcaran Siyabend ku diçe nav gund, jinên gund kerîk nan didinê, dile wan bi halê wî dişewite û ji hev re dibêjin ku “felekê çerxa wî ters zivirandiye, qedera wî reş kiriye.” (Aras, 2016, r. 8). Dema ku Siyabend van gotinan dibihîse çav lê sor dibin û agirê heyf û tolan girtina ji felekê dikeve dile wî.

#### 2.1.2. Di metna Mesnewiyê de

Di mesnewiya Siyabend û Xecê ya Dilbikulê Cizîrî de li gorî metnên destanê; him ji aliyê peyvan ve him jî ji aliyê mijarên ve xalên cuda hene. Di destanê de navê dê û bavê Siyabend derbas nabe. Lê di metna mesnewiyê de navê bavê wî derbas dibe ku navê wî Hecî Hemîd e. Bi heman awayî ji destanê cudatir navê damarî û bavmarî (zirbav) jî derbas dibe.

Siyabend yekane zarokê dê û bave xwe ye. Gava ku Siyabend digihîje heşt saliya xwe êşek li diya wî der dibe, dê diçe rehma Xwedê û Siyabend sêwî dimîne. Çend sal şunde jî bavê Siyabend, bi xanimekêre dizewice ku navê wê Sînem e. Lê Sînem roj bi roj zor û tedayiyê li Siyabend dike, wî ti û birçî dihêle. Bavê Siyabend her çiqas jî vê rewşê agahdar dibe jî êdî xwediyê wê hêzê nîne ku vê rewşê biguherîne. Demek şunde jî Hecî Hemîd nexweş dikeve. Lê Hecî Hemîd, ji bo piştî mirina xwe di derbarê jiyana Siyabend de

dikeve fikarê. Di dawiyê de diçe cem jinika cîran ku navê wê Helîmê ye û jê re dibêje ku tu û kurê xwe werin ser mal û hebûna min. Bax û bostanên min him hûn jê feyde bigrin him jî Siyabend û Sînem ku yek zarok e yek jî ciwan û nezane, bi vî awayî bêxwedî namînin. Piştî mirina Hecî Hemîd, Helîmê ji Sînemê re dê, ji Siyabend re jî dibe dapîr. Di kar û barên wan, di xem û kêfxweşiyên wan de ji bo wan dibe dost û alîkar. Demeke şunde jî kurê Helîmê Şerîf bi Sînemê re dizewice. Ev zewac ji bo Siyabend dibe destpêka jiyanê nû, zor û dijwar. Edî çerxa felekê ji bo Siyabend xerab digere. Mal û bax û bostan ji Şerîf û Sînemê re dimînin, di heman demê de Siyabend di mala xwe de dibe derbeder, penaber û bêxwedî. Zilma li ser Siyabend çendî zêde dibe, Siyabend jî ew çendî dibe nerihet û asî. Şerîf, kar û barên giran bi Siyabandê dide kirin.

## **2.2. Golikvaniya Siyabend**

### **2.2.1. Di Destana Siyabend û Xecê de**

Siyabend dema ku hate duwazdeh saliya xwe apê wî bi gundiyan re diaxive û Siyabend dikin golikvan. Golikvanî rewşa Siyabend bêtir xerab dike. Siyabend sêwîtî û êtîmîyê bêtir li ser xwe hîs dike. Tî, birçî di gelî û newalan de li pey golikan digere. Pirê caran birçî di xew re diçe. Lê ev jiyana wî ya xwezayî di heman demê de tiştekî jî bi Siyabend dabû fêr kirin ku Siyabend hemû giya û cureyên hêşinahiyê nas kiribû. Her ku diçû fêrî jiyana xwezayê dibû.

Rojekê ku di Sa Siyabend golikan diçêrîne lingê golikê dişikê. Siyabend her çiqas ji xwediyê golikê re dibêje ku ew bi xeletî çêbûye jî, xwediyê golikê li ser vê bûyerê diçe mala apê Siyabendî û giliyê wî dike. Li ser giliyê xwediyê golikê, ap û amojîn, Siyabend didin nav hev û bi daran li wî dixin. Wî jî saq û sima dikin. Siyabend çawa ku fersenda xwe dibîne ji nav destên wan direve û di tariya şevê de wenda dibe û diçe. Ap demekê dirêj li pey Siyabend digere. Di vê beşa destanê de xala herî balkêş ewe ku siwarekî xerîb Siyabend jî destê apê xelas dike.

### **2.2.2. Di Metna Mesnewiyê de**

Piştî zewaca Sînemê û Şerîf, zordestî û tedayîya li ser Siyabend her ku diçe zêdetir dibe. Şerîf, karên giran bi Siyabend didekirin. Çendî ku wan zorî li Siyabend dikirin Siyabend jî ewqas bêzar û nerihet dibû. Di dawiyê de Sînem û Şerîf fikirîn ku heya Siyabend ji wan dûr nebe aramiya wan namîne. Lewma biryar dan ku wî bikin golikvan. Bi gundiyan re axivîn û Siyabend bû golikvan. Siyabend her roj zû radibû, mal bi mal digeriya, golikên gundiyan kom dikir û dibir çolê ji bo çêrê. Tî, birçî û bi zehmetî golikvanî dikir. Pirî caran xwarina wî keriyekî nanê zuwa bû ku wî jî gundiyan didanê. Ev jiyana zor û bêrehm, di dilê Siyabend de agirê kîn û rikê zêde dikir û fikra tolhildanê di serî de çêdibû.

Di destanên kurdî de carnan civak, leheng ji xwe re wek hêviyekî dibîne. Lewra gava civak dikeve bin xetereyê an jî zilm û zordestiyê, ew leheng tê û wê civakê ji wê rewşa xerab xelas dike. Lê ev yek di destana Siyabend û Xecê de xwe nadê nişan. “Di vê destanê de leheng (Siyabend) lehengiya xwe tenê ji bo kesayeta xwe dike.” (Güneş, 2019, r. 23). Lewma Siyabend biryar dide ku bela gundiyan bi Şerîf û Sînemê de bike. Bi vî awayî jî dema ku nêzikî gund dibe lingê golikê dişikîne.

Di vê beşa mesnewiyê de xala balkêş û ya ku ji destanê cudatir e ewe ku, di destanê de lingê golikê bi xeletî dişikê, lê di mesnewiyê de lingê golikê ji aliyê Siyabend ve û bi zanetî tê şikandin. Ya din jî ew e ku di destanê de xwediyê golikê pîrejinek e, lê di mesnewiyê de zilamekî gundî ye. Piştî vê bûyerê xwediyê golikê diçe cem dê û bavê (damarî û zirbav) Siyabend û gilî gazindan dike. Şerîf li ser vê gilî û gazindê dest bi lêxistina Siyabend dike. Siyabend çawa ku fersenda xwe dibîne ji destê Şerîf direve û di tariya şevê de diçe. Şerîf heya berdestê sibehê li pey digere lê Siyabend nabîne û pey re jî vedigere mala xwe.

## **2.3. Jiyan Çol û Çiya û Terkeseriya nav Gund û Civakê**

### **2.3.1. Di Metna Destanê de**

Siyabend ku dê û bavê wî dimirin, sêwî û êtîm dimîne û dibe berdestî, gelek zilm û tedayî dibîne. Demek şunde jî ji neçarî terkeserî dibe. Çol û çiya ji xwe re dike war, fêrî jiyana kûvî dibe. Di metna destanê de dema Siyabend jî apê xwe direve rastî şivanekî tê. Bi şivan re rûdinên, xwarin û vexwarina xwe dixwin. Ku Siyabend behsa kurtejiyana xwe ji şivan re dike, şivan jê re dibêje ku felekê qedera te reş kiriye. Ev gotina şivan, fikra tolhildanê dike bin hişê Siyabend. Êdî dijmînê ku dê Siyabend heyfa xwe jê hilibigre felek e.

### 2.3.2. Di Metna Mesnewiyê de

Di metna mesnewiyê de piştî ku Siyabend dikeve berdestê Sînem û Şerîf, li hember zilm û zordestiya wan nema îdare dike û ji mal direve. Bi roj di şikeftan de xwe vedişêre û bi şev jî tê gund û xesarê dide bax û bostanên Şerîf. Piştî van bûyeran Şerîf û gundiyan li pey Siyabend dikevin da ku wî biqefêlin û ceza bikin. Lê Siyabend naqefêlin û Siyabend demekê direj li çol û çiya diji. Di metan mesnewiyê de rasthatina şivan tune.

### 2.4. Berawirdiya Teşeyên Destan û Mesnewiya Siyabend û Xecê

Piraniya destanan bi şiklên nezmê tî xwendin an jî tî nivîsîn, yê ku bi awayê pexşan jî hatine nivîsîn hene. Lê dema ku em li destpêka destanan dinêrin em dibînin ku “serî da destan bi gîştî menzûm dihatin îcrakirin û bi demê ra dema ku çanda menzûm li cem îcrakeran lawaz bû, pexşan jî tîkelî nav bû û vêca awayê îcrayê bû menzûm-pexşan tîkel.” (Subaşı, 2024, r. 109). Destana Siyabend û Xecê destaneke devkî ye. Piraniya destanê pexşan e, lê di destanê de pexşan û menzûm tîkel in. Destan him bi devkî û him jî nivîskî bi her du awayan jî ji bo edebiyatê berhemên giring in. Têkiliya mijara destanan bi jiyana gel a rojane va girêdayî ne. Di çanda kurdan de destan bi riya dengbêjan gihaştine roja me û bi vî rengî wêjeya devkî ji bo kurdan bûye weke dibistanekî. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku “gel jî ji wan berhemên devkî sûd girtiye.” (Aslan, 2015, r. 92). Di avakirina vî dibistanê de rola dengbêjan gelekî zêdeye. Her dengbêjekê/î destan û çîrokên Kurdî li gor herêma xwe vegotîye û li gor xwe hin tişt lê zêdekiriye an jî jê kêmkiriye.

Di edebiyata klasîk de xezel û qesîde di nav diwanan de cî digirin, lê Mesnewî bi tena serî xwe wek berhemekê serbixwe ye. Ji ber ku ev berhemên serbixwe, tenê ji vî teşeyê pêk tînin, bi navê teşeya xwe hatine binavkirin û ji van berhemên re mesnewî hatiye gotin. “Hemû berhemên ku bi vî teşeyê hatine nivîsîn bi awayekî kolektîfî hatine binavkirin û navên xwe yê gîştî ji teşeya xwe wergirtine. wekî mînak Mesnewîya Mem û Zînê.” (Adak, 2019, r. 247). Di mesnewiyan de, her malik di nav xwe de biqefîye ne û bi qalibên wezna aruzê yê kurt tî nivîsîn. Mijarên mesnewiyan bêtir evin: şoreş, tesewûf, lehengî û hwd... Heman tişt di mesnewiya Dilbikûlê Cizîrî de jî heye. Dilbikûlê Cizîrî, her çiqas di berhema xwe de li gor rê û rêbazan mesnewiyê çûbe jî di naverokê de guhertin çekiriye. Di rêbaza mesnewiya wî de bandora romana M. Seîd Remezan El-Bûtî gelek zêdeye. Em dikarin bibêjin ku Dilbikûlê Cizîrî, romana El-Bûtî bi terzê klasîk veguhestiye mesnewiyê. Taybetiya Dilbikûlê Cizîrî ew e ku di serdemeke postmodern de bi terzê klasîk berhem nivîsiye. Jixwe di pêşgotina mesnewiya Siyabend û Xecê de di derbarê xebata xwe de wuha dibêje: “Awayê xebata min, ji ya wan hinkê cihê tete hesabandin. Ji ber ku min çîrok bi helbestî hem jî bi erûz amade kiriye.” (Cizîrî, 2015, r. 12). Di mesnewiya Siyabend û Xecê de 2100 malik hene û ew malik li gor qalibên wezna Mem û Zînê ya “mefûlû mefâilû feûlun” hatiye amade kirin. Her çiqas di hin destanên Kurdî de lehengên destanê ji çîna serdest bin jî him di destana Siyabend û Xecê de him jî di mesnewiya Siyabend û Xecê de her du leheng jî ji rêzê ne.

## 3. Berawirdiya Naverokê

### 3.1. Bawerî

Di her du berhemên de jî bawerî heye. Bes di metna destanê de bawerî rasterast dernakeve pêş. Bi tenê di cihekî de Siyabend dema ku terkeseî dibe û li çol û çiya dimîne beriya ku dê xewnekî bibîne bang li Xweda dike û dibêje: “Ya Rebî, gelo çî sûc û gunê min hebû ku ez ketime vî halî? Yan rihê min bistîne min jî vî ezabî xelas ke yan jî rêkî ji min re veke!” (Aras, 2016, r. 14). Di metnên gelêrî de leheng di xewna xwe de bi piranî Xizir dibîne, lê di metna destanê de ew pîrê ku tê xewna Siyabend rasterast ne diyare gelo ku ew Xizir e an na. Lewma jî di metna destanê de motîfên olî zede nînin. Muqayese bi vî re di metna mesnewiyê de bawerî bêtir derdikeve pêş. Ji ber ku şeweya mesnewiyê şeweyeke Îslamî ye mesnewî bi pesindana Xweda û pêxember dest pê dike. Lewma jî Dilbikûlê Cizîrî, di mesnewiya Siyabend û Xecê de di serî de bi pesnê Xwedê, di’ a, pesnê pêxember û mucîzeyên wî û hwd. dest pê dike. Piştî derbasî metnê dibe. Ji bilî vî di metna mesnewiyê de navê bavê Siyabend, Hecî Hemîd e ku peyva hecî bi xwe jî rasterast nişana ol û oldariyê ye.

### 3.2. Rastîhevhatin

#### 3.2.1. Di Metna Destanê de

Di metna destanê de rasthatina Siyabend û Xecê, ji rasthatina metna mesnewiyê cudatir e. Li gor metna destanê, Siyabend û destbirakê xwe Qedê, li geliyê Bedlîsê rêbiriye dikin û li pey Felekê digerin ku heyf û tola xwe hildin. Di wê tengavê de li Mêrga Gulistanê li Textê Hesengolê rastî konê Xecê û birayên wê tên. Siyabend di şuna Felekê de di kon de rastî Xecê tê, cara yekem li wir hev dibînin.

#### 3.2.2. Di Metna Mesnewiyê de

Di metna mesnewiyê de rasthatina Siyabend û Xecê li ser kaniyê pêk tê. Siyabend birîndar e, ji dût ve kaniyekê dibîne û tê ser kaniyê. Xecê li ser kaniyê dibîne.

”Ser kaniyê dît ewî xezalek

Emma çi xezal bû ew şepalek ” (r. 161).

Ji ber ku birîndar e, Xecê ji bo alîkariyê wî bi xwe re dibe bin kon.

Got: ”wa diçim ez tu wer li pey min

Ez dê te bibim li ber derkî eymin” (r. 163).

Di metna mesnewiyê de cara yekem rasthatina wan bi vî awayî pêk tê.

### 3.3. Leheng

Di her du berheman de ji lehengên sereke Siyabend û Xecê ne. Lê ji aliyê lehengên din ve cudahî di navbera wan de heye.

#### 3.3.1. Di Metna Destanê de

Di destana Siyabend û Xecê de navê dê û bavê Siyabend nehatiye gotin. Siyabend, piştî mirina dê û bavê xwe li cem ap û amojna xwe dimîne ku navê wan ji nehatiye gotin.

Xecê: Lehenga jin a sereke ya destanê Xecê ye. Xecê ji Beriya Şikaka ye. Di destanê de navê bavê Xecê Mamo ye. Lê li gor Ordîxanê Celîl navê bavê Xecê Resul Axa ye. Heft birayên Xecê hene. Di metna destanê de navên wan: Leter, Meter, Heyder, Cafer, Qelender, Mistefa û Emer in. Ordîxanê Celîl di kitêba xwe ya bi navê *Zargotîna kurda I*’î de navê birayên Xecê wuha bi rêz dike: “Îtî, Wîtî, Qereqot, Malmîret, P’êxas, P’êe’bas, Canfidane.” (2013, r. 122). Ji xeynî birayên Xecê, duwazdeh pismamên Xecê hene ku ew ji dor bi dor tên xwazgîniya Xecê û destvala diçin.

Hesen Axayê Şikakî: Lehengeke dîtir ji Hesen Axayê êla Şikaka ye ku di heman demê de figurekî antagonist ango dijber e. Wî ji ji bo xwe xwazgîniyê şandibû ji bo Xecê. Ji ber ku Xecê wî ji destvala dişîne, birayên Xecê neçar dimînin ku ji beriyê koç bikin.

Qeregêtranê Salê: Di metna destanê de lehengên dîtir Qeregêtran e ku jê re dibêjin Qeregêtranê Salê an ji Qedê. Qedê, di pêşerojê de dibe destbirakê Siyabend. Navê dêya wî Zemê û navê bavê wî ji Hemê ye.

Qelb Hesen: Lehengekî din ji Qelb Hesen e ku neyarê Qedê ye.

Erebê lêvdeqandî lehengekî din yê destanê ye ku ev karakterekî fêsiad û xerab e. Erebe lêv deqandî parsekekî sîxur e. Li pey Xecê digere ku xeberekî ji Hesen Axayê Şikakî re bibe.

Pîrejîn: Karaktereke din ji pîrejîneke ku alîkariya Siyabend dike.

#### 3.3.2. Di Metna Mesnewiyê de

Di metna mesnewiyê ya Dilbikulê Cizîrî de navê bavê Siyabend Hecî Hemîd e. Lehengên din yê ku di metna mesnewiyê de derbas dibin Sînem û Şerîf in ku dêmarî û zirbavê Siyabend in. Ji bilî van her duyan, hin lehengên din jî hene ku di varyantên din de cî nagrin. Lehengên metna mesnewiyê evin:

Nu’man: Nu’man, şivan e û ji Siyabend re dibe alîkar da ku Siyabend bibe dergevanê qesra Emîrê Mûşê. Di metna mesnewiyê de du jin hene.

Hacer: lehengekê din ya metna mesnewiyê ji Hacer e ku keça mîrê Mûşê ye. Siyabend cara pêşîn dibe evîndarê wê. Lê Hacer, Siyabend layiqî xwe nabîne û dibêje ku:

“Heçiyê wekî min keçe mîr in

Ew layiqê padeşah û wezîr in

Hetta ku li vir u dergevan î

Çawa bo te ez bibim kevanî ” (Cizîrî, 2015, r. 12).

Lehenga jin ya din Xecê ye ku lehenga sereke ew e. Di metna mesnewiyê de navê dê û bavê Xecê nehatiye gotin. Di vir de bi tenê behsa Xecê û birayekî wê tê kirin ku navê wî jî ne diyar e. Di vir de tiştê herî balkêş ewe ku di metna mesnewiyê de behsa Qedê an jî Qeregêtranê Salê nayêkirin. Di şuna wî de Nu'man heye ku ew jî him ne xwedîyê hêza Qedê ye û him jî destbiratiya wî wek ya Qedê mayînde nîne.

### 3.4. Ziman

Zimanê herdu berheman jî kurdî ye. Ji ber ku cî û warên her du metnan jî heman in û kurdistan bi xwe ye, axaftin û dîyalogên metnê bi kurdî ne. Lewma tu guman tune ye ku ev metin bi zimanê kurdî hatiye afirandin. Di destana Siyabend û Xecê de ziman pexşanî ye. Cî bi cî tê de menzum hebe jî vegotin bi piranî bi pexşanê hatiye nivîsîn. Di mesnewiya Siyabend û Xecê de ziman yekser menzum e, bi awayê helbestê hatiye nivîsîn.

### 3.5. Şûnwar (Mekân)

#### 3.5.1. Di Metna Destanê de

Her çiqas di destpêk û dawiya metna Siyabend û Xecê de mekân hevpar be jî di hin versiyonan de mekanên cuda jî hene. Di metna destanê de mekanê destpêkê Silîva ye. Navê lehengê destanê Siyabendê Silîvî ye. Piştî dîtina xewnê mekân diguhere û edî mekân Serhed, Bedlîs, Mêrga Gulistanê, Textê Hesengolê, Sîpanê Xelatê, Beriya Şikaka û Elcewaz e.

#### 3.5.2. Di Metna Mesnewiyê de

Di metna mesnewiyê de jî metin li Silîva dest pê dike. Piştî ku Siyabend terke dinê dibe diçe Mûşê û li wir dibe dergewanê qesra Mîrê Mûşê. Demeke şunde jî Mûşê derdikeve û ber bi Wanê ve diçe. Li ser rêya Wanê leqayî Xecê dibe. Di destanê de jî mekanê dawî çiyayê Sîpanê Xelatê ye, bes di metna mesnewiyê de behsa Mêrga Gulistanê û Textê Hesengolê nayêkirin.

## 4. Berawirdiya Motîfan

Destan û vegêranên gelêrî bingehen xwe li ser motîfan ava dikin. “Motîf di eslê xwe da parçeyê herî biçûk ê vegêranê ye û bi heman şiklî hevpar e di nav gelek varyantên vegêranên ziman û milletên cuda da.” (Subaşı, 2023, r. 159). Di her du metnên hîlbijartî de gelek motîf hene. Ji ber ku motîf “hêmanên sereke yên çîrokan in.” (Demir, 2015; Filiz & Aykaç, 2022). Em ê jî bêtir li ser xewn, listîka kapê, gustîlik, hesp, şûr, pezkovî, hejmar û mirinê ku motîfên sereke yên wek destan û vegêranê ne rawestînin.

### 4.1. Xewn

Xewn, him di destanan de him jî di mesnewiyan de xaleke hevpar û berbelav e. Pêşeroja motîfa xewnê heya destana Gilgamêş diçe. Lewra di destebiratiya Gilgamêş û Enkidû de “Gilgamêş wî di xewna xwe de dibîne û Nînsûn radigihîne ku ewê bibîne destebira.” (Tarduş, 2016, r. 170). Lehengên destana, bi riya xewnê ji bûyerên paşeroj agahdar dibin. “Carinan leheng bi saya dîtina xewnan xwe xelas dike, carinan aşîqê ku ew periya di xewna xwe de dîtîyê dibe û carinan jî ew tiştên xewna xwe de dîtî rêya wî ronî dikin û li gorî wê xewnê jî biryarên nû distîne.” (Güneş, 2019, r. 37).

#### 4.1.1. Di Metna Destanê de

Di metna Siyabend û Xecê de motîfa xewnê, ji bo Siyabend dibe destpêka ronîkirina rê û jiyanekê nû. Di metna destanê de piştî ku Siyabend ji gund derdikeve û terkeseî dibe, li çol û çiya de di qefikên keviran û şikeftan de dijî. Şevê xewnekî dibîne:

Di xewê de kalek hate xewnê  
Got, Rabe ser xwe Siyabendê Silê!  
Tê bibî paliwankî mezin û çê  
Navê te yê bela be li her derê  
Min te re aniye Hêşînbozê Surê  
Qaşa zîn daye Lahorê Qetlê  
Qedera te nivîsiye ser devê şûrê,  
Netirse ji însanê rûyê dinê!  
Hevza bike ji heywanê çolê'

Tuyê bibî destbirakê Qedê,  
Jê re dibên Qeregêtranê Salê.  
Birakê te kurê Hemê û Zemê. (Aras, 2016, r. 14).

Weke ku li jor jî hate gotin leheng, bi riya xewnê, jî bûyerên paşerojê agahdar dibe. Di metnên vegêran yên gel de xewn, bêtir li ser dîtina evîndarê ye. Lê di destana Siyabend û Xecê de Siyabend, di xewna xwe de evînadara xwe nabîne. Bervajî vê di dewsa evîndarekê de lehengê ku wê bibe destbirakê wî dibîne. Herwiha Siyabend, di xewna xwe de agahdar dibe ku ev leheng kî ye, navê wî û navê dê û bavê wî çî ne. Herwiha jî hespê xwe û navê hespê xwe jî agahdar dibe. Tiştêkî din jî ku bi riya xewnê Siyabend fêr dibe da ku xwe ji çî biparêze û ji çî bitirse an jî netirse. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku xewn, riya leheng ronî dike û terzê tevgera wî jî diyar dike.

#### **4.1.2. Di Metna Mesnewiyê de**

Di metna mesnewiyê de dîtina xewnê bi rengekî cuda hatiye hunandin. Li gor mesnewiyê dema ku Siyabend di xew re diçe:

Xewnek wî di lê çiqas ecêbî  
Tirs û heyecan ji wî re çêbî  
Yek hat gotê “hey reben belengaz  
Sekna vêdê bo te nabe gengaz  
Lazim tu li vir nemînî êdî  
Hazir bike tu xwe hêdihêdî  
Derbas neke dem ji vir tu dur be  
Yan jî îşê te dê gelkî zor be  
Piştî vî çiyayî tu dibînî  
Hicret bikî lê hizûr bibînî (Cizîrî, 2015, r. 109).

Di metna mesnewiyê de yê ku tê xewna Siyabend, zayenda wî/wê ne diyar e. Di derbarê bûyerên paşerojê de agahî nade. Rêyeke zelal nîşan nade. Bi tenê şîreta guhertina cî lê tê kirin.

14

#### **4.2. Lîstika Kapê**

Lîstika kapê, lîstikeke fêlbaziyê ye. Armanca lîstika kapê, bi gelemperî beriya şer an karekê giring tê avêtin da ku encam bêdîtin. Ev kevneşopî di nav kurdan de gelekî kevnar e. Kap, jî sembolên wek mîr, hâkim, sofî, diz, ker û cendirme pêk te. Lîstik li ser kulavekê têlîstin û ji bo veşartin û parastina kapê, qabên taybet tên amadekirin. Ji ber ku ev lîstik di metna destanê de tune ye em nikarin bêjin ku motifêke hevbeş e. Di metna mesnewiyê de piştî Şerîf û Sînem bi hev re dizewicin mal û bax û bostanên Siyabend dikevin destê Şerîf. Zilm û tedaya li ser Siyabend ku zede dibe Siyabend, aramiyê di kolanên de digere û fêrî lîstika kapê dibe. Ev lîstika kapê, di heman demê de dibe sebeba xwenasîna Siyabend da ku êdî xwediyê hêzekê ye.

#### **4.3. Gustîlk**

Motîfa gustîlikê “hem motîfeke efsaneyî ye hem motîfekê çîrokî ye û hem jî motîfeke çanda gelêrî ye.” (Attî, 2013, r. 144) Carinan wek nîşana evîne, carinan wek nîşana sedeqet û soz dayîne, carinan jî wek motîfa hêz û hikimdariyê ye. Gustîlk, “ji bo lehengê çîrokê, bûjeneke/maddeyeke pir nîrxdar û bikêrhatî ye.” (Zinar, 2009, r. 125). Çi wexta ku leheng dikeve tengasiyan, gustîl dibe alîkarê wî/ê. Ev motif di metnên ku me daye berhev de motîfekî hevbeş nîne. Di metna mesnewiyê de motîfa gustîlkê nehatiye bikaranîn, lê di metna destanê de ev motif hatiye bikaranîn. Hesên Axayê Şîkakî tevî leşkerên xwe erîşî ser Mêrga Gulistanê, Textê Hesengolê dike, Qedê û heft birayê Xecê dike û bi destê zorê Xecê direvîne tîne Beriya Şîkaka. Siyabend dema ku tê Beriyê, bi riya pîrejînekê gustîla xwe ji Xecê re dişîne. Bi vî awayî Siyabend, Xecê ji xwe haydar dike ku dê wê bi revîne û xelas bike.

#### **4.4. Hesp**

Di edebiyata Kurdî de hesp, xwediyê cihekî pir giring e. Lewra pîrî caran lehengên çîrok û efsaneyan bi hespê xwe tên bi navkirin. Bo numune Bavê Fexriya siwarê Gêjo an jî Dewrêşê Evdî siwarê Hedwan û hwd... “Ev hesp, bi piranî bi bezabûna xwe ya derasayî û sêdaqeta xwe ya li xwediyên xwe tên zanîn.” (Attî, 2013, r. 218). Yek ji taybetmendiya hespa ev e ku hesp ne tenê di destan, efsane û çîrokan de di heman demê de di jiyana gel ya rojane de jî bi heman awayî tîne zanîn. Hesp, di şer û cengan de, di bez û rewan

de, di wexta zor û bêkeysîyê de alîkarê herî mezin e. Di derbarê navê hespê Siyabend de çend nav hene: “Demîrqirê Xeybê, Bozoyê Rewan,” (Temo, 2023, r. 17), “Deybîlqiran” (Güneş, 2019, r. 49). Di metna mesnewiyê de li ser xala hespê nehatiye rawestî lê di metna destanê de hesp bi nav û nîşaneyê xwe cî digire. Navê hespê Siyabend Hêşînbozê Surê ye. Dema ku kalemêrekê tê xewna Siyabend, jê re dibêje ku “min te re aniye Hêşînbozê Surê” (Aras, 2016, r. 14).

#### 4.5. Şûr

Burton dibêje ku, “dîroka şûr, dîroka mirovahiyê ye.” (1884) Bes dîroka şûr ne dîroka şer û cengê ye. Her çiqas ku şûr amûreke parastîne be jî bi tenê amûrê şer nîne. Şûr, jî bo leheng, di heman demê de weke amûrekî kesayetê jî tê hesibandin. “Şûr dibe kesayetê wusa ku rituelên nîrxanên weke rûmet, şan, şeref û mêrxasî bi wî tîr meşandin.” (Sevinç, 2013, r.622).

Taybetiyeke şûr jî ev e ku di nav kurdan de amûrekî pîroz e û bi şûr sond tê vexwarin. Heman tişt di destana Memê Alan de jî heye. Hesen, Çeko, Qeretacîdî li ser şûr sond xwarine ku derdê mêvanê xwe - yê Memê Alan-çareser bikin.

Di destana Siyabend û Xecê de şûrê Siyabend jî weke hesp, nav û dengê wî, bi awayekî derasayî jê re tê. Lewra navê şûrê wî jî derasayî ye ku jê re tîgotin Lahorê Qetlê. Heman motîf di metna mesnewiyê de cî nagire lewma jî motîfeke hevbeş nîne.

#### 4.6. Jimar/Hejmar

Di destan û efsaneyan de jimar gelekî cî digirin. Bi taybetî jî hin hejmar bêtir derdikevî pêş. Yek ji wan hejmara heftan (7) e. Heft tebeqê erd û esmana hene, “mîrov bi heft bavê xwe tê nasîn” (Demir, 2015, r. 155). Gerdûn di şeş rojan de hatiye afirandin û roja heftan Xweda li ser erşa xwe derdikeve îstivayê. Di metna destanê de heft birayên Xecê hene.

Yek ji wan jî hejmara 12an e. Sedema hejmara 12an yek ji ewe ku di Qur’an’a pîroz de hejmara heywanan wek duwazdeh hatiye diyarkirin. Herwiha hejmara bîrcan jî duwazdeh in. Heman hejmar di her sê olên semawî de jî xwediyê cihekî giring in. Bo numune duwazdeh kurê Hz. Yequb hene. Duwazdeh hewariyên Hz. Isa hene. Di bawerîya Şîîyan de duwazdeh îmam hene û hvd... Heman hejmar di mîtolojiya Yewnaniyan de jî heye. Di mîtolojiya Yewnaniyan de hejmara xwedawendên wan yên Olîmposê duwazdeh in, hejmara sêzdeha di çanda wan de wek bîyomî ango felekreşî tê hesibandin. Di metna destanê de jî xeynî birayên Xecê, duwazdeh pismamên Xecê hene ku ew jî dor bi dor tîr xwazgîniya Xecê û destvala diçin.

Tiştê balkêş ewe ku di metna destanê de jî dema ku behsa gakuviya tîkirin hejmara wan duwazdeh in, ya sêzdehan pezkûvî ye. Ji xwe ew jî bîyomîyê bi xwe re tîne. Di metna mesnewiyê de her çiqas ku behsa pezkûviyan hatibekirin jî ji bo wan peyva “keriyek” hatiye bikaranîn ku hejmara wan nediyar e.

#### 4.7. Astengêrî

Astengêrî di nav metnên edebiyata gelêrî de motîfeke giring e. Di hemu metnên gelêrî de cî digrin. Astengêrî carinan bi destê mirovên xayîn û xerab pêk tîr. Di metna Memê Alan û Mem û Zîna Xanî de astengêrî bi destê Bekoyê fesad pêk te. Carinan bi nexwşînan pêk te ku di çîroka Heso û Nazê de êş li laşê Heso peyda dibe. Carnan jî bi rêya ajalan pêk te ku destana Siyabend û Xecê de jî astengêrî gakuvi ye.

#### 4.8. Pezkûvî/Gakuvi

Motîfa pezkûviyê di çanda kevnar de xwediyê cihekî gir giring e. Di edebiyata cîhanê de semboleke hevbeş e. Her miletekî li gor çanda edebiyata xwe rolekî lê bar kiriye. Di tesewufê de motîfa pezkûviyê tê maneya parastina giyanên xerab û xerabiyê. Pezkûvî, “Bi gelemperî wek ajaleke alîkar û tebiîtpak tê zanîn.” (Alsan, 2020, r. 215) Bi piranî li cihê tenha, li çiya dijî. Ji ber ku qencîkar û tebiîtpak e “însanê ku nêçîra pezkûviya bike îflah nabe.” (Aytaş, 2013, r. 162). Li gor hin efsaneyan, “Şîvanên xwedî hêzên efsûnî carinan wekî mê, hevaltiya pezkûviyan dikin û wan diparêzin. Nêçîrvanên ku nêçîra pezkûviyan dikin wan bi mirînê, bi birîndariyê û carina jî bi nîşaneyê kesekî ya mayînde ceza dikin.” (Akman, 2020, r. 155).

Di her du metnan de jî motîfa pezkûviyê motîfekî hevbeş e. Di metna destanê de piştî ku Siyabend û Xecê derdikevî serê Sîpanê, Siyabend diweste, serê xwe dide ser çoka Xecê û di xew re diçe. Di wê tengavê de Xecê dibîne ku pezkûviyek diçe û duwazdeh gakuvi jî li pey diçin. Di nav wan gakuviyan de yek li yên din dixê û nahêle ku ew nêzî pezkûviyê bibin. Dema ku Xecê vê dîmenê dibîne dilê wê dişewite, birayên wê tîne bîra wê û digirî. Çend hêsiyên Xecê li ser eniya Siyabend ve dibarin û ew ji xew hişyar dibe. “Siyabend, piştî ku sebebê giriyê Xecê hîn dike, şûr, tîr û kevana xwe hildide û dibêje heya ku ez

neçim wî gakûviyî şerjê nekim, dil û gurçikên wî ji te re neynim, ez ji serê Sîpanê Xelatê nayê xwarê.” (Aras, 2016, r. 50). Siyabend, nêzikî gakûvî dibe, tîrekê davêje lê dixê. Dû re serî wî badide, xençera xwe derdixe ku serê gakûvî jêke. Di wê tengavê de gakûvî serê xwe dihêjîne, qiloçî wî li Siyabend dikeve û Siyabend ji jora gelî de dikeve xwarê, li dara benûstokê asê dibe, guliyên darê li qolincê wî dikeve û di piştê wî re derdikeve. Weke ku li jor jî hatibû gotin motîfa pezkûviyê, motîfekî hevbeş e û di metna mesnewiyê de jî ev bûyer bi heman awayî hatiye vegotin.

#### 4.9. Mirin

Di edebiyata gelêrî de mirin perçeyekî honaka vegotinê ya bingehîn e. Bi piranî di çîrok û destanan de evîn trajîk in û bûyer bi mirinê dawî dibe. Tiştê ku lehengan mayînde dike jî ev mirina trajîk e ku evîndar nagihîjin hev ango weslet çênabe. Di destan û mesnewiya Siyabend û Xecê de jî wesleta her du lehengan dimîne dinyayeke din.

##### 4.9.1. Di Metna Destanê de

Di metna destanê de piştî ku Siyabend li pey gakûvî dikeve cara pêşîn tîrekî davêje û wî birîndar dike. Di metna destanê de piştî ku Siyabend li pey gakûvî dikeve cara pêşîn tîrekî davêje û wî birîndar dike. Pey re jî diçe cem gakûvî ku wî şerjê ke. Ji hewla rihê xwe gakûvî serê xwe dihêjîne û bi qiloçê xwe li Siyabend dixê û wî jor de dike xwarê. Siyabend, li dara benûstokê daliqandî dimîne, Xecê, heta serê sibê li Siyabend digere. Li ser newalekî rastî cendekê gakûvî tê. Dibîne ku xûna wî di kendal de çûye xwarê. Li berjêr mêze dike û dibîne ku Siyabend ser dara benûstokê da ketiye. Wê dême pirsra ku di xewnê de jî Siyabend ra hatibû gotin tê bîra Xecê ku kalê gotîbû:

Siyabendê Silê

Tuyê bibî palîwanê dunê

Kesek piştê te nayne erdê

Her hevza xwe bike ji rewilên çolê ( Aras, 2016, r. 52).

Xecê, her çiqas hewl dide jî nikare Siyabend ji wê rewşê xelas bike. Biryar dide ku ew jî xwe bikuje.

##### 4.9.2. Di Metna Mesnewiyê de

Şiklê mirinê di her du metnan de jî hevpar û heman e.

Paşê derexist kevan û tîr e

Pê ra jî emade kir wî şîr e

...

Heywanê reben dirêj bû erdê

Lazim nebû ew tîrek dî berdê

...

Rabû lê belê emma wekî bist

Hetta ku jê hat boçek li wî xist

...

Sîbendê reben li çiqilê wer bû

Emma serê çiqilî dil de der bû ( Cizîrî, 2013, r. 202).

Xecê, piştî ku Siyabend diçe û venagere, demeke dirêj li pey Siyabend digere dawî dengê nalîna wî dibihîse:

Nagah wê didît qefayê nêrî

Zanî ne îşaretek bi xêrî

Gava ku berê xwe da newalê

Hat ber guhê wê ku yek dinalê (Cizîrî, 2013 r. 204).

Diher du metnan de jî Siyabend, ji Xecê dixwaze ku ji nû ve bizewice lê Xecê ve daxwaza wî qebl nake û ew jî xwe dikuje. Di vir de xaleke balkêş ewe ku Siyabend sebebê mirina xwe di veqetandina du pezkûviyên evîndar de dibîne û dibêje ku min van her du pezkûviyên evîndar ji hev veqetand, gunehê wan bû sebebê mirina min.

#### Encam

Destan, çîrok, mesnewî, efsane ji bo paşxaneya edebiyatê xwediyê cihekî pir giring in. Bingehên dewlemendiyên çand û ziman bi rêya van cureyan tê avakirin. Lewma jî her neteweyekî bi saya destan,

efsane, çîrok û mesnewiyan bi kurtasî bi saya edebiyatê fîkr û ramanên xwe anîne ziman. Ji ber vêyekê ye ku paşxaneyê edebiyata gelekî çiqas kevnar û xurt be, çiqas dewlemend be çanda wî gelî jî bi heman awayî xurt û dewlemend dibe. Destana Siyabend û Xecê, him jî aliye naverokê ve him jî aliye motif û sembolan ve him jî jî aliye lehengiyê ve di edebiyata kurdî de xwediyê cihekî taybet e. Weke her destan û çîrokan destana Siyabend û Xecê jî gelek varyantên wêhene. Di navbera van varyanta de xalên hevbeş jî hene û guhertinên mezin jî çêbûne. Wek ku li jor jî hatiye analîzkirin metna ku jî aliye Dilbikûlê Cizîrî ve hatiye nivîsîn, tê de Qedê an jî bi navê xwe yê din Qeregêtranê Salê tune. Hesen Axayê Şîkî tune. Motîfa hespê wek ya destanê bi nav nehatîyekirin. Motîfa gustîlkê cî negirtiye. Navê birayên Xecê nînin. Lê ev cudahî jî kêmasiyê betir metnê dike nav regekî modern. Ji ber ku her çiqas metna Cizîrî, bişîklê mesnewiyê be jî di bin bandora romana Ramazan El-Butî de û di serdemekê modern de hatiye nivîsîn. Ev jî nîşan dide ku her deverê li gorî xwe di destanê de guhertin çêkiriye, lê xwedî derketiye û jî xwe re kiriye mal. Di berbelavbûna Siyabend û Xecê de rola dengbêj û çîrokbêjan gelek zêdeye. hin tiştên nû lê zêdebar bûne. Ev jî nîşan dide ku Siyabend û Xecê, li her derê Kurdistanê hatiye hezkirin û pêjirandin. Bi tenê li bajarekî an bi herêmekê sînordar nemaye û bûye malê gel.

Me di vê xebatê de hewl da ku em dewlemendiya mesnewî û destana Siyabend û Xecê diyar bikin. Mebesta me ev bû ku em li ser manendî û cudatîyên her du berheman bisekinin. Me bi vî awayî her du metna jî aliye bûyer, cî, nav, leheng, kesan, bawerî û motifan ve berawird kir. Di vê xebatê de em gihîştin vê ancâmê ku destana Siyabend û Xecê, jî aliye motifan ve gelek dewlemend e. Mirov dikare bêje ku di destana Siyabend û Xecê de evîn, bûyerên navbera civaka kurdan, mîrxasî, bawerî, baweriyên tewş hemû bi hev re cî digirin. Di her du berheman de jî ziman bi kurdî ye, jiyan bi her awayî jiyanekê kurdewarî ye. Ji aliye mekanan ve her çiqas ku cudahî hebe jî welat Kurdistan e. Xalên metnê yên bingehîn neguherîne, bûyer jî aliye bingehê ve heman e.

### Çavkanî

- Adak, A. (2019). *Teşeyê nezmê*. Nûbihar.
- Akman, D. M. (2020). *Karşılaştırmalı Türk ve Yunan mitolojisi*. (Teza Masterê ya Neçapbûyî) Sakarya Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Alsan, Ş. S. ve Akın, S. (2020). Türk kültür ve sanatında geyik sembolizmi. *Ulakbilge Sosyal Bilimler Dergisi*, 8(45), 215-226. DOI: 10.7816/ulakbilge-08-45-08
- Aras, A. (2016). *Destana Siyabend û Xecê*. Nûbihar.
- Aslan, R. (2015). Berawirdiya destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî. *International Journal of Kurdish Studies*, 1(2), 86-101.
- Attı, H. (2013). *Lêkolîneke folklorî li ser destana Mem û Zînê*. (Teza Masterê ya Neçapbûyî). Zanîngeha Mardin Artuklu. Enstitûya Zimanê Zindî.
- Aytaç, G. (2003). *Karşılaştırmalı edebiyat bilimi*. Say Yayınları.
- Aytaç, G. (1999). Türk kültür ve edebiyatında geyik motifi ve Haza Destan-ı Geyik. *Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Velî Araştırma Dergisi*, 3(12), 161-170.
- Burton, R. F. (1884). *The book of the sword*. Chatto ve Vindus, Piccadilly.
- Celil, C. & Celil O. (2013). *Folkloru kurmanci*. (cild I). Aram.
- Cihanî, P. (2013). *Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*. Nûbihar.
- Cizîrî, D. (2015). *Siyabend û Xecê*. Nûbihar.
- Demir, B. (2015). Motifên edebiyata kurdî ya gelêrî di destana Siyabend û Xecê de. Ramazan Pertev.(ed.). *Edebiyata kurdî ya gelêrî*. (139-169). Avesta.
- Filiz, M. (2014). *Xebatek li ser destana Dewrêşê Evdî*. (Teza Masterê ya Neçapbûyî). Zanîngeha Mardin Artuklu. Enstitûya Zimanê Zindî.
- Filiz, M. Ş. & Aykaç, Y. (2022). Analîza motifên destana Cembelî û Binevşa Narîn li gor kataloga Stith Thompson. *II. Uluslararası Zap Havzası Sempozyumu Kültürel Miras ve Sözlü Gelenek (21-23 Ekim 2022)*. (546-562). Hakkari Üniversitesi Yayınları.
- Güneş, E. (2013). *Motifên destana Siyabend û Xecê*. (Teza Masterê ya Neçapbûyî). Zanîngeha VanYüzüncü Yıl. Enstitûya Zimanê Zindî.
- Sevinç, B. (2013). Yiğit ve silahlı adam diyalektiğinde kılıç imgesi. *Turkish Studies*. 8(6), 619-639. <http://dx.doi.org/10.7827/TurkishStudies.4971>
- Subaşı, K. (2022). Kesayetên mîtolojîk û rengvedanên wan di edebîyata gelêrî ya kurdî da. Vali. S. (Ed.), *Mîtos û Edebiyat Mîtosên Kurdo –Îranî di Edebiyata Kurdî de*. (83-164). Nûbihar.
- Subaşı, K. (2023). Fesad û bêbext di trajedîya evînê da: weku nimûne destanên evînî yê mêjûyî. *Mukaddime*, 14(1), 148-176. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035>
- Subaşı K. (2024). Ji mîtolojîyê ber bi tarîxê û ji lehengîyê ber bi evînê destan weku çemkeke sîwan di vegêrana gelî da. *Şarkiyat*, 16(01), 105-116. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1425264>
- Tarduş, İ. (2016). Du lehengên li pey nemiriyê: Gilgamêş û Siyabend. Hasan Karacan (ed.) *Kürdoloji Akademik Çalışmaları 2*. (169-176). Yargı Yayınları.
- Temo, S. (2023). *112 hesp û xezelek*. Dara.
- Yıldırım, K., Pertev, R. & Aslan, M. (2013). *Ji destpêkê heta niha folkloru kurdî*. Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Zinar, Z. (2009). *Di çanda kurdî de 37 şaxên zanistiyê*. Pencînar.



# DANASÎNA NAVDARÊN KURDAN BI NAVBEYNKARIYA PIRTÛKÊN ZAROKAN

Ferhat ÇİFTÇİ

Introducing Kurdish Notables through Children's Books

Kürt Büyüklerinin Çocuk Kitapları Aracılığıyla Tanıtımı

**Ferhat ÇİFTÇİ**

ORCID: 0000-0003-4117-2477 | fe.ciftci@alparslan.edu.tr  
Dr., Childcare and Youth Services Department, Muş Alparslan  
University, Türkiye.

**Citation/Jêgir/Atıf:**

Çiftçi, F. (2025). Danasîna navdarên kurdan bi navbeynkariya  
pirtûkên zarokan. *Kurdiyat* (11), 19-33. DOI:  
10.55118/kurdiyat.1671930

**Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:**

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi  
Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 08.04.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 22.04.2025  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2026

**Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:**

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

**Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:**

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

**Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:**

It is declared that scientific and ethical principles have been  
followed while carrying out and writing this study and that all the  
sources used have been properly cited./ Hatiye beyankirin ku di  
pêkanî û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine  
şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu  
çalîşma yapîlirken ve yazîlirken bilimsel ve etik ilkelere uyulduđu ve  
kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduđu beyan  
edilir.

**Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:**

There is no conflict of interest between the author and any parties  
in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya  
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

**Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:**

The authors acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wemegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı  
desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul  
etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telîfê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
haklarını saklı tutarlar.

## **Kurte**

Edebiyata zarokan ji aliyê geşedana zarokan ve derfetên giring dihevine. Feydeyeke edebiyata zarokan ev e ku zarok bi navbeynkariya berhemana dibin xwediyê nîrxan û ji aliyê kesayetiyê ve rêya xwe dibînin. Ji bo vê yekê hin berhemên edebiyata zarokan li ser jiyana navdaran radiwestin. Bi vî awayî bi navbeynkariya jiyana navdaran zarok hem dibin xwedî nîrxên gerdûnî hem jî yên neteweyî. Di vê xebatê de danasîna navdarên kurdan bi navbeynkariya pirtûkên zarokan çawa ye û ew bi kîjan şiklî di van berhemana de çîh girtine hatiye armanckirin. Ji bo vê yekê digel hin prensîbên edebiyata zarokan hin pirtûkên mînak ên ku jiyana navdarên kurdan ji xwe re kirine mijar bi rêbaza analîza dokumanê hatiye nîrxandin. Di nîrxandina berhemana de jî rêbaza analîza naverokê hatiye bikaranîn. Di vê xebatê de pirtûkên mînak penc heb in û ji aliyê Yasemin Elban ve wekî rojnivîskên keçikeke piçûk a kurd hatine nivîsîn. Di pirtûkên mînak de navê serlehengê Xecê ye û ew di nav sêwirandinên çîhêreng de li pey navdarên kurd ên edebî û dirokî yên wekî Ehmedê Xanî, Dewrêşê Evdî, Celadet Bedirxan, Mestûre Xanima Erdelanî û Evdalê Zeynikê ye. Şeweyên danasînê yên navdarên kurdan ji bo zarokan di pirtûkên mînak de di bin van sernavan de hatine nîrxandin û şîrovekirin: Şeweya honakê; rêjeya honakê; hevgeriya rasteqînî û honakê; şeweya vegotinê; taybetiyên navdarên kurdan ku tîn mînakgirtin; bi navbeynkariya navdarên kurdan nasandina çand, jiyana û diroka kurdan; ji bo guherîna leheng û xwîneran rola navdarên kurdan; di navbera leheng, xwîner û navdarên kurdan de hesta wekîhevbûnê; bîdestketina karînen hestiyarî. Di dawiya xebatê de hat dîtin ku zarok, bi navbeynkariya van pirtûkan ji aliyê neteweyî ve van navdaran dê nas bikin, fêrî jiyana û taybetiyên wan û hwd. bibin, mînakên jî çand û dirokê xwe bibînin; ji aliyê gerdûnî ve jî xwedî hin tevgerên erênî bibin.

**Peyvên Sereke:** edebiyata zarokan, pirtûkên zarokan, bikaranîna biyografiye, navdarên kurdan, danasîna navdarên kurdan.

## **Abstract**

Children's literature offers important opportunities for child development. One of the benefits of children's literature is that children have values through the works and the works guide them in the acquisition of personality. In this respect, some works of children's literature are based on the lives of notable people. Therefore, through the lives of prominent people, children are exposed to both universal and local values. This study aims to investigate how Kurdish notables are represented through children's books and how they appear in these works. For this purpose, in line with some principles of children's literature, sample books on the lives of Kurdish notables were analyzed by document analysis method. Content analysis method was used to analyze the works. The sample consists of five books written by Yasemin Elban in the form of the diaries of a little Kurdish girl. The protagonist of these books, Xecê, pursues historical and literary Kurdish figures such as Ehmedê Xanî, Dewrêşê Evdî, Celadet Bedirxan, Mestûre Xanima Erdelanî and Evdalê Zeynikê in different fictions. The following headings were used to analyse and interpret the ways in which Kurdish notables are presented in the sample books: Fiction style; fiction ratio, reality and fiction harmony; narrative style; exemplary characteristics of Kurdish notables; promotion of Kurdish culture, life and history through Kurdish notables; the role of Kurdish notables in the change of the protagonist and readers; sense of identification between the protagonist, the reader and Kurdish notables; acquisition of affective skills. As a result of the study, it was observed that through these books, children can become familiar with these figures in a local context, learn about their lives and characteristics, see examples from their own history and culture, and develop positive behaviours in a universal sense.

**Keywords:** children's literature, children's books, use of life story, kurdish notables, representation of kurdish notables.

## **Özet**

Çocuk edebiyatı, çocuk gelişimi açısından önemli imkânlar barındırır. Çocuk edebiyatının faydalarından biri de çocuğun eserler aracılığıyla değer sahibi olması ve eserlerin şahsiyet ediniminde onlara yol göstermesidir. Bu açıdan bazı çocuk edebiyatı eserleri tanınmış insanların yaşamlarını konu edinir. Dolayısıyla çocuklar tanınmış insanların yaşamları aracılığıyla hem evrensel hem de yerel değerlere sahip olurlar. Bu çalışmada çocuk kitapları aracılığıyla Kürt büyüklerinin tanıtımının nasıl gerçekleştiği ve onların bu eserlerde ne şekilde yer ettiği amaçlanmıştır. Bunun için çocuk edebiyatının bazı ilkeleri doğrultusunda Kürt büyüklerinin yaşamlarını konu edinen örnek kitaplar doküman analizi yöntemiyle incelenmiştir. Eserlerin incelenmesinde ise içerik analizi yöntemine başvurulmuştur. Çalışmada örneklem, Yasemin Elban tarafından yazılan beş kitaptan oluşmaktadır ve bunlar küçük bir Kürt kızının günlükleri şeklinde kurgulanmıştır. Söz konusu kitapların Xecê adlı kahramanı farklı kurgular içinde Ehmedê Xanî, Dewrêşê Evdî, Celadet Bedirxan, Mestûre Xanima Erdelanî ve Evdalê Zeynikê gibi tarihi ve edebî Kürt şahsiyetlerinin peşindedir. Örnek kitaplarda çocuklar için Kürt büyüklerinin tanıtım biçimleri şu başlıklar altında incelenmiş ve yorumlanmıştır: Kurgu tarzı; kurgu oranı, gerçeklik ve kurgu uyumu; anlatım tarzı; Kürt büyüklerinin örnek alacak özellikleri; Kürt büyükleri aracılığıyla Kürt kültürü, yaşamı ve tarihinin tanıtımı; kahraman ve okurların değişiminde Kürt büyüklerinin rolü; kahraman, okur ve Kürt büyükleri arasında özdeşim duygusu; duyuşsal becerilerin kazanımı. Çalışmanın sonucunda çocukların bu kitaplar aracılığıyla yerel anlamda söz konusu şahsiyetleri tanıyacakları, onların yaşamları ve özellikleri gibi konularda bilgi edinecekleri, kendi tarihleri ve kültürlerinden örnekleri görecekları; evrensel anlamda ise olumlu davranışlara sahip olacakları anlaşılmıştır.

**Keywords:** çocuk edebiyatı, çocuk kitapları, yaşam öyküsünün kullanımı, kürt büyükleri, kürt büyüklerinin tanıtımı.

## Destpêk

Mijarên edebiyata zarokan cur bi cur in. Hewandina hêmanên wê yên edebî, estetik, pedagojîk û hwd. qadeke berfireh tîne pêşberî me. Rola kesayetî û civakî di nav van hêmanên sereke de bi hin armancên ve edebiyatê şikl digirin. Bi saya berhemên edebiyata zarokan, xwînerên taybet yên ve edebiyatê dikevin nava ragihandineke hunerî û edebî. Bi vî awayî çalakiya xwendinê ji bo zarokan hin qezenc û derfetan pêk tîne ku yek ji wan nasîna kesayetên navdar e.

Danasîna navdaran bi navbeynkariya edebiyata zarokan wekî mijarekê dikeve çarçoveya nîrxên gerdûnî yan jî yên çandî û neteweyî. Heke navdar biyanî be bi taybetiyên xwe ji bo zarokan jî aliyê nîrxên gerdûnî, nasîna dinê û jiyanê ve dibe derfetek. Heke ev kes ji gelê xwe be îcar derfeta berbehs jî aliyê nasîna nîrxên çandî û neteweyî ve berfireh dibe. Ev herdu mînak bi awayekî hevkar, ji bo zarokan di nav nîrxên gerdûnî, çandî û neteweyî de ji xwînerên zarok re hevgirtiyekê dibexşînin.

Bulut û Şimşek (2022), balê dikişînin ser vê mijarê ku zarok bi navbeynkariya pirtûkên ku dixwînin dîroka civaka xwe û mîrasa wê ya dewlemend nas dikin û dibin xwediyê hişmendiya parastina wan. Ji hêla din ve dikare bê gotin ku divê mîrasa gerdûnî jî bê xwedîkirin û parastin da ku hevgirtiya berbehs şikestekê nexwe. Bi vî çarçoveyê di edebiyata zarokan de bikaranîna jiyan û taybetiya navdaran jî aliyê gerdûnî, çandî, dîrokî, nîrxî û hwd. ve ji xwe re bingeh û meşruiyetekê dibînin. Ji ber vê yekê bi şerta taybetiya zarokan, giringiya wan û navendbûna dinya û menfeatên wan, hêmanên periferîk jî ji xwe re şûnekê digire. Tê zanîn ku ne meriv ne jî zarok bêtî hest û fikren kesayetî û civakî nabin. Loma jî berfirehbûna dinyaya zarokan digel hewandina hêmanên têkildar bi nêzikatiyên temambûnê û hevgiriyê ve dikeve nav komrewşekê.

Li gorî Tüfekçi Can (2014, r. 105), jiyan merivên ku di nav dîrokê de giring in ji xwîneran re serbendên sirên serkeftinê û rastiyên ku binyada serkeftinê ne nîşan dide. Zarok jî endamên mezin ên paşerojê ne ku ji wan re bi navbeynkariya deqan divê ev serkeftin û rê û rêbazên ku ji wan re digihîne bîr xuyakirin. Zarok jî dê bi saya wan derfetan jiyan, çand û civata xwe nas bikin û di hişên wan de têkiliyên jiyanê xurt bibin. Demiral Taher (2018, r. 45-46), di perwerdeya çand û nasnameya neteweyî de li ser rola kovarên zarokan radiweste. Lêkolîner dibêje kovarên zarokan kesayetên neteweyî didin nasîn ku di warê wêje, ziman, zanist, huner, politîka û hwd. de karên baş kirine, xizmeta çand û neteweya xwe kirine, bi vî awayî zarok dikarin van kesan ji bo xwe wekî mînak bibînin, ji kar û xebatên wan haydar bibin û ji wan sûd wergerin.

Bi gotina Nahrîn (2023, r. 137), di jiyan nivîskaran de hin rûdan hene ku li ser jiyan û hûnera wan xwedî bandorên mezin in û bi saya wan serpêhatiyên edebiyateke xurt derdikeve meydanê. Ji ber vê yekê zarok, bi saya wan berhem û nivîskarên wan gavê davêjin nava jiyanê û şert û mercên wê nas dikin. Ji vî yekê zêdetir bi mînakgirtina wan jî di rêya nivîskarî û hunernasîyê de dibe ku derfetekê ji xwe re peyda bikin. Bi navbeynkariya danasîna kesayetên navdar ên nivîskar, xwîner dikarin berhemên wan ên klasîk jî nas bikin. Ji vî aliyê ve berhemên klasîk, hem nivîskarê xwe hem jî gel û çanda kesên ku di nav de ne dide nasîn. Bi gotina Bîlkan (2005, r. 143), berhemeke klasîk bi taybetiya olana bedew û zerafeta ziman û çanda ku tê de ye, xwedî karakter û dewlemendiya hest û fikrên civakê ye. Zarokek bi saya wan berhemên ku li gorî wan hatine nivîsin gavê diavêje nava edebiyata kanonîk jî. Di dema nûciwanî û xortaniyê de dibe ku berhemên wisa ku ji bo zarokan hatine nivîsin, danasîna berhemên kanonîk hêsan bikin.

İsen Durmuş (2011), li ser berhemên klasîk disekine û dipirse gelo dê çawa dûrahiya navbera zarok û van berhemên nêzîkkirin û ji vî aliyê ve çi dikare bê kirin? Ji ber vê yekê hin mînakên çalakiyan dide nasîn ku di welatên cur bi cur de hatine kirin. Di nav çavkanî û koleksiyonên pêşkeşkirî de jiyan navdaran jî cih digire. Ev yek nîşan dide ku ji bo zarokên îroyîn nasandina navdar û berhemên wan wekî mijarên din ên wisa jî aliyekê ve proje û xebatên giştî dixwaze.

## 1. Rola Biyografiyê û Bikaranîna Wê di Edebiyata Zarokan de

Temasa edebiyata zarokan û hêmanên gerdûnî, çandî û neteweyî ji aliyekî ve li ser hin şeweyan dikare bê pêşkeşkirin. Jiyan navdaran û taybetiyên wan ji bo zarokan di vî warê de hin derfetan dihevin. Kesên navdar bi awayekî di nav roman, çîrok, bîranîn, rojnivîsk, helbest û hwd. de ji xwe re bikaranînekê dibîne. Li vir a giring ev e ku jiyan û taybetiyên wan ji bo zarokan li ser armancekê bîr veguhestin. Lêbelê danasîna navdaran bi piranî li ser cureya biyografiyê tê têgihiştin.

Li gorî Arıcı, Ungan û Şimşek (2016, r. 296-297) biyografi ev cure nivîs in ku mijarên xwe li jiyana navdaran digirin. Van lêkolîneran piştî qala biyografiyên klasîk, portre, monografi û otobiyografiyê dikin. Li gorî daxuyaniyên wan, biyografiyên klasîk ev nivîs in ku di nav ansîklopedî yan jî antolojiyan de cih werdigirin û jiyanê navdaran dinasînin. Portre jî ev biyografi ne ku kesayetên navdar bi jiyana kesayetiyê xwe, bi hest û fikrên xwe tê de cih digirin. Monolog, nivîsên jiyanê kesayetan bi hurgulî pêşkeş dikin. Otobiyografi jî nivîsek e ku nivîskar bi xwe li ser jiyana xwe dinivîse. Wekî pênasîyê tê famkirin ku di her qadê de kesayetên navdar dikarin di nav pirtûkan de bi jiyana xwe ji xwîneran re bîr pêşkeşkin.

Dedeoğlu, Ulusoy û Alıcı (2013), li ser analîza naveroka berhemên biyografîk ên ji bo zarokan rawestîne. Lêkolîneran tesbît kiriye ku berhemên berbehs ên ku li ser kesayetên xwecih û biyanî hatine nivîsin li gorî kesayetên siyasî û zanistî herî pir li ser nivîskar, helbestvan û hunermendan in. Tüfekçi Can (2014, r. 102-104), di edebiyata zarokan de cureya biyografiyê wekî senifandina berhemên biyografîk ên rasteqîn, berhemên biyografîk ên hatine sêwirandin û berhemên sêwirandî yê biyografîk pêşkeş dike. Ya sêyemîn jî wekî sêwirandinê hemû, qismî, berhevkerî û rêzdar dabeş dike. Ji ber vê yekê tê famkirin ku şewaya biyografiyê cur bi cur in û her şeweyê jî cureyê re rehendekê dibexşîne. Çiftçi (2013), cureya biyografiyê bi piranî ji bo zarokatiya dereng guncav dibîne. Lêbelê ev cure bi derfetên sêwirandinê ji bo zarokên piçûk jî dikare bi awayekî guncav bibe. Li gorî Lukens, Smith û Coffel (2018, r. 293) di biyografiya sêwirandî yan jî dagerandiya sêwirandî de nivîskar rastiyên ku hatine jiyîn dadigerîne çirokekê û ji bo zarokên mezin ku hîn biçûk tên hesibandin, rasteqîni jî sêwirandinê dikare bêtir be.

Di behsa biyografîniyê de rola nivîskaran jî ji aliyekî ve balê dikişîne. Tüfekçi Can (2014, r. 101), di edebiyata zarokan de nivîskarên cureyên biyografiyê li gorî nivîskarên din ji aliyê afirandina lehengan ve sînordar dibîne ku ev yek girêdayî zanîn û tevgerên bîmesnet e. Di behsa wê cureyê de Lukens, Smith û Coffel (2018, r. 285) jî dibêjin ku sê hêmanên bîngê hene; rastî, têgihînek û temayeke bi têkildariya van rastiyan û mijar û tevgerê ji xwîneran re tê kirin. Herçiqas jî bo zarokan kesayetên navdar bi navbeynkariya wê cureyê bîr danasî jî ji aliyê sêwirandinê ve wekî balkişandina lêkolîneran ji rasteqîniyê re mukayyedbûn heye. Heke nivîskar li gorî şert û mercên rasteqîniyê gavê neavêje îcar di vegotina xwe de objektîvbûnê wenda dike. Loma tê gotin ku di cureya biyografiyê de vegotin li ser rasteqîniyê xwe rast dike û piştî sêwirandinê kîncên meşrûiyetê li xwe dike.

Di edebiyata zarokan de leheng an jî kesên ku jiyanê wan tên vegotin divê bi şewazên vegotinê yê cur bi cur bîr veguhestin. Çimkî, heger hem kesayetên navdar hem jî karakterên berhemên zarokan di nav şewaza neqlkirinê de bîrîn, ji aliyê wêfî de dibe ku hîn qelsî bîr hîlê. Subaşı, Meral û Akhan (2022) di vî warî de diyar dikin ku lehengên yekalî, monoton û statîk jî hîla zarokan ve nayên hezîkirin. Karatay (2011, r. 103) jî di vê gavê de rêyên danasîna karakteran bi çar hîlan ve dabeş dike ku ev vegotinê ji monotoniyê xelas dikin. A yekem di nav diyalogan de, a duyem di nava çîroka şayesandina rasterast de, a sêyem fikrên karakteran bi monologan şayesandinê û a çarem jî karakteran di nav rûdanekê de pêşkeşkin. Kesayetên biyografiyê ligel ev çar şewazên vegotinê nêzî zarokan dibin.

## **2. Derfet û Feydeyên Jiyan û Taybetiyên Navdaran ji bo Zarokan**

Hin feydeyên biyografiyên navdaran ji bo zarokan wekî her tema û mijar hene. Dikare bîr gotin ku feyde û derfetên veguhestina jiyan û taybetiyên navdaran ji bo zarokan cur bi cur in. Aytekin (2016, r. 163), di behsa taybetiyên biyografiyan yê ji bo zarok û ciwanan de dibêje ku berî her tiştî “navdarbûn” jî bo zarokan balkêş e. Dîsa li ser vê yekê jî bo berhemên wê cureyê hîn hewcedariyan rêz dike. Di nav van de guncaviya salan, eleqaya zarok û ciwanan, veguhestin û vegotineke rasteqîn, objektîfbûn, cudahiya kesayetên navdar ku wan dike kesên giring, taybetiyên wan ên ku tên mînakgirtin, ked û hewldana wan balê dikişîne.

Jiyan û taybetiyên kesayetên xwecih û biyanî xwedî derfet û feydeyên cihêreng in. Dedeoğlu, Ulusoy û Alıcı (2013), diyar dikin ku ji bo danasîna çandên biyanî berhemên werger ên biyografîk xwedî rol in. Meriv dikare bi saya wê rolê ve bîr ku zarok dinyayê xerîb tîne nêzîkî xwe û li ser wê yekê hest û fikrên xwe û xeyalên xwe xurt dike. Bi mînakbûna kesayetên çandbiyanî, tecrubeya jiyanê bi dest dixê. Roleke din a biyografiyê jî ji hîla kesayetên xwecih ve ye ku danasîna çand û jiyanê gelê xwe li ser temsîla wan dibîne. Mert, Albayrak û Serin (2013) dibêjin ku perwerdebûna zimanî ne tenê pêkhatineke jî hêlekê ye. Lêkolîner di vê gavê de dibêjin ku hevbandoriya hêmanên çanda xweyî û yê cihêreng û gerdûnî giring in û ji bo berhemên edebî divê serî lê bê dayîn. Bi vî awayî dikare bîr gotin ku ji bo zarokan jiyanê navdaran hem bandorên navxweyî hem jî yê derveyî dihewîne.

Kesayetên navdar û dîrokî yê neteweyî bi jîyan, taybetî û giringiyên xwe ji bo zarokan ji aliyê rolmodelgirtinê ve guncav in. Karataş (2014), dibêje ku zarok di navbera salên 03-06ê de tevgerên xwe bêtir ji kesayetên hawirdora xwe yê nêzik û dûr ve yan jî ji lehengên film, animasyon û pirtûkan, li ser mînakgirtinê pêk tîne. Bi vî awayî zarok bi navbeynkariya berhemên biyografîk kesayetên xwe yê neteweyî û dîrokî nas dike, bi vî rengî jî çanda xwe re rêyeke nêzîkbûnê dibîne. Bi saya wan biyografiyan kesayetên ku tên pêşberî wan bi wan re dikevin nav hesta wekîheviyê. Loma dikare bê gotin ku jiyana navdaran di nav edebiyata zarokan de hem ji aliyê veguhestina nîrx û çandê ve hem jî li ser hesta wekîhevbûnê roleke giring bi kar tîne. Di vî warî de ev vegotin hem ji bo civatê hem jî ji bo takekesiyê hin wateyan vedişêre. Çimkî heke giringiya zarokan neyê daxistin dikare bê gotin ku ku zarok ji bo civatê wekî kesên paşerojê ne û berdewamiya jîyanê bi saya wan pêk tê. Ji aliyê din ve zarok, di nav mezinan de bi xwezaiya xwe dikevin têkiliya rolmodelgirtinê.

### 3. Hin Minakên Edebiyata Zarokan ên Kurdî ji aliyê Danasîna Navdarên Kurdan ve

Jîyan û şopên navdarên kurd di berhemên zarokan ên kurdî de wekî pirtûk, kovar û berhemên televîzyonê û hwd. dikarin bînin dîtin. Herçiqas di hin mînakên de navdarên kurd bi jîyanên xwe yê temam derbas nebin jî wekî bibîrxistin û telmîhê tên bikaranîn. Çiftçi (2024, r. 171), di berhemên kurdî yê edebiyata zarokan de veguhestina nîrxên çandî nîşan daye ku çend mînak li ser kesayetên navdar ên wekî Ehmedê Xanî, Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Siyahpoş in. Navdarên rêzkirî bi nîşandana lêkolîner di nav helbesteke zarokan a bi navê “Pêşgotin”ê de (Yılmaz, 2015, r. 7) derbas dibin.

Em dikarin pirtûka Berfîn Ayşe Ögüt ya bi navê *Şînmorîka Zînê* (Ögüt, 2016) wekî mînakeke din bidin. Ev pirtûk, li ser serpehatiya Zînê ye û rêya wê di nav çîrokê de rastî Feqiyê Teyran tê û di navbera wan da suhbetek diqewime. Bi gotina Suvağci (2020) di vê pirtûkê de serleheng Zînê ji bo çareserîya rewşên xwe pirsan ji mezinên xwe dike û ji wan alîkariyê dixwaze û yek ji wan jî Feqiyê Teyran e.

Ji aliyê din ve di kovarên zarokan de kesayetên navdar û jîyan, giringî, taybetî û şopên wan di demên mixtelîf de hatine berpêşkirin. Subaşı (2018, r. 68), di xebata xwe ya bi navê *Girr û Gallî Mindallanî Kurd* de qala îthaf û diyariyên ku di vê kovarê de hatine kirin dike, ev yek nîşan dide ku kesayetên navdar ên kurd bi taybetî û şehadatiyên xwe ji bo zarokan hatine bibîrxistin. Ev kovar, ji bo zarokên kurd kovara yekemîn e ku ji aliyê derbasbûna nav û bîranîna kesayetên navdar ve balê dikişîne.

Kovarên ku piştî derketine ji dîsa ji aliyê danasîna kurdan ve hin naverokan dihewînin. Demiral Taher (2018, r. 174-180), li ser kovarên zarokan ên kurmançî-latînî agahiyên hûrgilî û balkêş dide. Bi gotin û nîşandana wê, di navbera sala 1980 û 2015ê de di 15 kovarên zarokan ên kurmançî-latînî de 94 caran nasandina navdarên kurdan cih girtine.<sup>1</sup> Navdarên kurdan yê di van kovarên berbehs de hem yê kevneşopî hem jî yê iroyîn in. Ji aliyê xebat, pişe û hwd. ve jî navdarên kurdan li vir tê dîtin ku wekî helbestvan, nivîskar, siyasethêder, hunermend û hwd. cur bi cur in. Di heman demê de Tosun (2018) jî van agahiyan piştrast dike. Wekî mînak diyar dike ku ji bo zarokan kurtejiyana kesên navdar yê wekî Yaşar Kemal, Osman Sebrî, Yılmaz Güney, Qedrî Can, Meryamxan, Ehmed Arif (*Şemamok*); Celadet Bedirxan (*Agirê Tûtê*); Zerîfe Xanim, Dildar, Meryemxan, Aram Tigran, Ehmedê Xanî (*Zarokên Rojê*); Cegerxwîn, Osman Sebrî (*Perperok*); Meryemxan û Şakiro (*Buka Baranê*) di hin kovarên zarokan de hatine pêşkeşkirin.

Tosun (2025), di xebateke xwe ya din de dîsa di derbarê vê mijarê de hin agahiyan qeyd dike û şopa kovara *Nûbiharê* li ser edebiyata zarokan di kovargeriya kurdî de tîne pêşberî me. Lêkolîner nîşan dide ku di çend hejmarên kovara *Nûbiharê* de, ji bo zarokan li ser rawestina gotinên navdarên kurd ên wekî Cegerxwîn, Seidê Kurdî, Evdîmelîk Fîrat, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî hatine pêşkeşkirin.

Navdarên kurdan di berhemên televîzyonê de jî ji bo zarokan bi hin mînakên xwe nîşan didin. Wekî mînak di Zarok TVyê (2025) de bernameya *De Bêjeyê* bi awayekî zarokatiyê nêzîkî çanda dengbêjiyê dibe û çend dengbêjên navdar di videoyên xwe de bikar tîne. Şeweya kêf û henek, beşdarbûna zarok û mêvantiya wan, diyalogên xweşik û hin derfet û efektên animasyonê di wan berheman de balê dikişînin. Di malperê de ev bername bi hevokên wisa tên danasîn û pêşkeşkirin: “Ayşe Şan, Şeroyê Biro, Şakiro û gelek

<sup>1</sup> Ji bo agahiyên berfireh wekî navên kovaran û hejmarên wan ku navdarên kurdan tê de cih girtine binêrin: Demiral Taher, Î. (2018). *Perwerdeya Nîrxên Çandî û Civakî di Kovargeriya Zarokan a Kurmançî-Latînî de (1980-2015)*. (Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyî). Zanîngeha Mardin Artukluyê.

dengbêjên me, di dilê me de dijîn. Em destan û çîrokan bi saya kilamên wan dizanin. ‘Dê bêje’ jî dê kolan bi kolan li dengbêjên nû bigere.”

#### 4. Rêbaza Xebatê

Di vê xebatê de danasîna navdarên kurdan bi navbeynkariya pirtûkên zarokan, bi penc pirtûkên mînak hatine nirxandin. Ji ber vê yekê jî rêbazên lêkolîna wesfî analîza dokumanê hatiye bikaranîn. Analîza dokumanê, rêbazeke jî bo nirxandina belge, wêne, video û hwd. bikêrhatî ye (Yıldırım & Şimşek, 2011, r. 189). Bi vî awayî jî bo zarokan berhemên mînak ên ku tê de navdarên kurdan tên danasîn hatine bijartin. Piştî kesayetên berbehs di nav sêwirandina van pirtûkan de çawa hatine pêşkeşkirin û jî bo zarokan ev yek bi kîjan derfet û şeweyê ve pêk tên di bin hin sernavan de li gorî analîza naverokê hatine tesbîtkirin. Ji pirtûkan hin veguheştinên rasterast jî wekî mînak hatine pêşkeşkirin û şirovekirin.

#### 5. Danasîna Navdarên Kurdan bi navbeynkariya Pirtûkên Zarokan

Pirtûkên ku hatine nirxandin ji aliyê Yasemin Elban ve jî bo zarokan hatine nivîsandin. Nivîskar çend navdarên kurd ên dîrokî û edebî<sup>2</sup> di nav sêwirandinan de pêşkeş kirine. Berhema mînak wekî seteke bi penc pirtûkan û di hemen demê de wekî pirtûkên bideng hatine amadekirin. Cureya pirtûkên mînak biyografi nîne lêbelê armanc li vir nasandina navdarên kurdan e û şopên jiyana wan di nav sêwirandinê de hewiyane. Serleheng keçikeke kurd e, navê vê keçika biçûk Xecê ye û di van pirtûkan de serpêhatiyên wê wekî rojnivîskê digel çend navdarên kurdan tên vegotin.

Li gorî rêjeya metn, şeweya hevok û vegotinan, pirtûkên mînak dikare ji bo zarokên temenê wan 9 salî û berjortir bê bicihkirin.<sup>3</sup> Di berhemê de serleheng Xecê wekî 13 salî hatiye nasîn. Nivîskar, hin caran di destpêk yan jî navbera pirtûkê de rojnivîska Xecê wekî kesayetekê dide peyvin. Bi daxuyaniyên xweşik xwînerên xwe jî xwendinê re amade dike û bi vî awayî di navbera pirtûk û xwîneran de têkildariyeke germ pêk tê.

Pirtûkên mînak ev in: Rojnivîska Xecê-1/Xecê Li Dû Ehmedê Xanî ye (Elban, 2020a), Rojnivîska Xecê-2/Xecê Li Dû Dewrêşê Evdî ye (Elban, 2020b), Rojnivîska Xecê-3/Xecê Li Dû Celadet Bedirxan e (Elban, 2020c), Rojnivîska Xecê-4/Xecê Li Dû Mestûre Xanima Erdelanî ye (Elban, 2020d) û Rojnivîska Xecê-5/Xecê Li Dû Evdalê Zeynikê ye (Elban, 2020e). Di vê xebatê de pirtûkên mînak li gorî danasîna navdarên kurdan di bin sernavên rasterast û têkildar de wisa hatine nirxandin:

##### 5.1. Şeweya Honakê

Pirtûkên mînak wekî rojnivîskê bi şewaya çîrokê hatine nivîsin. Herçiqas em jî wan re nebêjin cureya biyografiyê jî li gorî senifandina cureya biyografiyê ya Tüfekçi Can (2014, r. 102-104) bi berhemên sewirandî yên biyografîk re têkildar in. Çimkî navdarên kurdan di van pirtûkan de tenê bi jiyana xwe ya sêwirandî yan jî nesêwirandî nehatine nivîsin. Di nav serpêhatiya lehengekê de cih girtine. Nivîskar, ew di nav sewirandina rojnivîska Xecê de wekî beşdarên pêşkeş kirine. Di pirtûkên mînak de jiyana û malbata Xecê, lehengên din, rûdanên ku ji aliyê wan û hemberî wan ve tên jiyîn û hwd. dikevin nav sêwirandinê. Piştî navdarên kurdan ji vegotinê re tên lehiqandin. Dîsa li gorî lêkolînera berbehs pirtûkên mînak dikevin beşa sêwirandina rêzdar. Çimkî berhem wekî setekê ye û di her pirtûkekê de navderekî kurd e dîrokî û edebî tê nasandin.

Pirtûka yekem a bi navê *Rojnivîska Xecê-1/Xecê Li Dû Ehmedê Xanî ye* bi kurtasî li ser gerîna gora Ehmedê Xanî ya ku li Bazîdê ye hatiye sêwirandin. Bi navendbûna wê serpêhatiyê nasîna Ehmedê Xanî digel çend rûdan û bikaranîna hêmanên sêwirandinê tê veguhestin. Rojnivîska Xecê, pisîka wê, dê û bavê wê wekî karakterên sêwirandî ne di vê pirtûkê de:

“Rojnivîska min a xoşevîst,

Ev çendeke tevgera pisîka min a Mircanê guherî bû, van rojan pir teral bûbû. Min dikir nedikir ew ji cihê xwe ranedibû. ... Min gilok girt û cardin avêtê, lê vê carê giloka min bê hemdî çû li portreyê ku

<sup>2</sup> Di nav van navdaran de tenê Dewrêşê Evdî, wekî kesayetek nîne, serlehengê e. Lê di sernav û naverokê de li gorî yên din wekî “navdar” hatiye hesabandin.

<sup>3</sup> Ji aliyê wêne, punto û ebadê ve pirtûkên mînak jî bo temenê 9 salî û berjortir bêtir dişibin pirtûkên ji bo zarokên piçûktir. Herçiqas ev yek nekeve nirxandina vê xebatê jî balê dikişîne.

bi diwêr ve daleqandî bû ket. ... Min bi çavên şermî li dê û bavê xwe nihêrî û weke ku bejîm na, min serê xwe li ba kir.” (Elban, 2020a, r. 4-5).

“- Xecê tu xwediyê wêneyê nas dikî?

Min got:

- Na bavo, ev kî ye?

Çavên bavê min teyisîn û bi serfirazî got:

- Ew feylesofekî kurdan e. Navê wî Ehmedê Xanî ye. ...” (Elban, 2020a, r. 8).

Pirtûka duyem a bi navê Rojnivîska Xecê-2/Xecê Li Dû Dewrêşê Evdî ye bi kurtasî li ser rêwîtiya Xecê ya ku li Wêranşarê ye hatiye sêwirandin. Di vê rêwîtiyê de Xecê pirtûkeke bi navê “Dewrêşê Evdî” dixwîne û merivê jê re rêhevaltiyê dike. Bi hevpeyvîn û sêrpêhatiya wan Xecê, Dewrêşê Evdî û çîroka wî bêtir nas dike:

“Keçika delal, tu yê bi kû ve biçî?

Min got:

- Xalo, ez ê biçim Wêranşarê mala xalê xwe. ...

Xalo got:

- Xecê ew çi pirtûk e di destên te de, tu dixwîni?

Min got:

- Xalo ev destana Dewrêşê Evdî ye.

Xalo got:

- Wey sed aferîn ji te re, ku tu li çanda xwe xwedî derdikevî” (Elban, 2020b, r. 8).

Pirtûka sêyem a bi navê Rojnivîska Xecê-3/Xecê Li Dû Celadet Bedirxan e bi kurtasî li ser sêrpêhatiya Xecê ya di pîrozbahiya cejna zimanê kurdî de radiweste. Xecê, digel malbat û hevalên xwe diçe seyrangahê û li vê derê li pey şopên xeyalên xwe bi Celadet Bedirxanî re têkildar dibe. Di navbera wan de li ser zimanê kurdî, şert û mercên wê çaxê û vê çaxê tê axaftin:

“Ji bilî wê, ez îro pir bi kelecana im. Ji ber ku sibe 15ê Gulanê ye û roja cejna zimanê kurdî ye. Sibe zû em ê bi tevî malbat, mamoste û bi hevalên xwe ve biçin seyrangahê” (Elban, 2020c, r. 5).

Pirtûka çarem a bi navê Rojnivîska Xecê-4/Xecê Li Dû Mestûre Xanima Erdelanî ye, ev pirtûk bi rêwîtiya Xecê û malbata wê dest pê dike. Ew diçin mêvaniya hevalê bavê Xecê yê ku li Tetwanê dijî. Di gava mêvaniyê de behsa Mestûre Xanima Erdelanî tê kirin û Xecê di bandora wê de dimîne. Li vê derê Xecê di hundirê trênekê de dîsa bi ketina xeyalan derbasî dema berî û bajarê Silêmaniyê dibe û bi Mestûre Xanima Erdelanîyê re peywendiyê dike. Di navbera wan de sêrpêhatiyek pêk tê:

“Dawiya vê heftêyê hevalê bavê min, mamê Bawer, me vexwende mala xwe. Mala van li Tatwanê ye. Dê û bavê min, piştî ku li hew şewirînu biryara çûyina wir dan. ...

Mamê Bawer devken bû û got:

- Nexwe, Xecê rêça Mestûre Xanim Erdelanî dişopîne!” (Elban, 2020d, r. 3-7).

Pirtûka pencem a bi navê Rojnivîska Xecê-5/Xecê Li Dû Evdalê Zeynikê ye, bi kurtasî behsa çûyina gundê meta Xecê û sêrpêhatiyên li wê derê dike. Xecê û kurê meta wê Siyabend bi hev re li der û dora gund digerin û hin rûdan pêk tên û Xecê navê Evdalê Zeynikê bi saya berxvanekî dibihîze. Piştî Xecê dîsa bi rewşeke xeyalî têkildarî Evdalê Zeynikê dibe:

“Berxvan got:

...

- Gava, ku min quling dît, Evdalê Zeynikê ket bîra min. We qet navê Evdalê Zeynikê bihîstiye?

Me sere xwe weke na li ba kir û em man li benda gotinên wî. Wî bi dengêkî nizm got:

- De werin rûnin, ez ê hikayeta Evdalê Zeynikê ji we re bejim” (Elban, 2020e, r. 11-13).

## **5.2. Rêjeya Honakê**

Di pirtûkên mînak de ji aliyê rêjeya honakê ve ji agahiyên biyografîk bêtir sêwirandin berpêş e. Di derheqê navdar ên kurdan de agahî cih bi cih tîn vegotin û kesayetên navdar bi bikaranîna diyalog û hêmana xewn û xeyalê ve carna dikevin nav sêwirandinê. Ji aliyê din ve ji yana navdarên kurd û agahiyên di derheqê wan de di nav vegotinên rojnivîskî de hatine dagerîn û lehiqandin. Li gorî daxuyaniya Lukens, Smith û Coffel (2018, r. 293), di cureya biyografiyê de ji bo zarokên mezin ku hîn biçûk tîn hesibandin, sêwirandin ji agahiyên rasteqîn zêdetir in. Loma dikare bê gotin ku ji vê hêlê ve pirtûkên mînak hem guncav in hem jî ji bo zarokan balkêş in.

Di pirtûkên mînak de honak bi çend rûdanên rêzkirî hatine avakirin. Dikare bê gotin ku rojnivîskên Xecê wan bi rêk û pêk dike û li ser navenda serpêhatiya xwe û danasîna navdarên kurdan kom dike. Agahiyên derheqê navdarên kurdan di nav sêwirandinan de cih bi cih xuya dikin û bi piranî navdarên kurdan di dawîya pirtûkan de dixuyên û tevî Xecê têkildar dibin. Ji ber vê yekê rêjeya sêwirandinê zêde ye û li gorî ji yana navdaran serdest e.

## **5.3. Hevgiriya Rasteqînî û Honakê**

Taybetiyên pirtûkên mînak ev in ku li ser şeweya honakê pêk hatine. Loma rastiyan ku derheqê navdarên kurdan de tîn pêşkeşkirin girêdayî wê xisûsê ne. Ji ber ku ev yek dikare wekî meşruiyeta sêwirandinê bê famkirin. Bi vî awayî di pirtûkên mînak de serleheng Xecê rastî hin navdarên kurdan tê û bi wan re dikeve serboriyekê. Bêguman ev wekî derfetekê ye û ancax di nav sêwirandinê de ji xwe re rastiyeke bibîne.

Ji hêla din ve mecbur e ku li ser navdarên ku di pirtûkên mînak de cih digirin agahiyên rastî bînin bikaranîn. Bi vî awayî pirtûkên mînak di navbera rasteqînî û honakê de hevgir in. Veguhestinên mînak nîşan didin ku agahiyên di derheqê navdarên kurdan de tîn vegotin li gorî biyografiyên wan rast in. Ji ber vê yekê di xebatê de li gorî ji yana wan em rastî şasiyan nehatine û bi vî awayî dikare bê gotin ku objektîvbûn nehatiye îhlalkirin. Ev yek di berhemên wisa de hewcedariyeke giring e da ku nakokî çênebin.

Di pirtûka yekem a di derheqê Ehmedê Xanî de wekî mînak ev tîn gotin ku di literatûrê de ev agahî qeydkirî ne:

“- Bavo ew di di navbera kîjan salan de jiya ye?

Bavê min got:

- Ew di serdema 17mîn de jiya ye. ...

Mîna got:

- Bavo, gelo qet berhemên wî hene?

Bavê min got:

- Erê çawa! Berhema wî ya bi navê Mem û Zînê di dinyayê de bi nav û deng e. ...

Ji bilî wê, wî ferhengokek bi zimanê Kurdî û Erebi amade kiriye. Navê wê daniye ‘Nûbihara Biçûkan’ û gotiye: ‘Ev ji bo biçûkên kurmanca ye’ (Elban, 2020a, r. 9).

Di pirtûka duyem a derheqê Dewrêşê Evdî de wekî mînak ev tîn gotin ku li gorî çîroka wî ne:

“- Xeca delal, ji vir sêsed sal berî, li herema Rihayê, axayekî bi navê Temir Axa hebûye û hevalekî wî pir dilovan ye bi navê Evdî hebûye. Keça Temir Axa ya bi navê Edûle û kurê Evdî yê bi navê Dewrêş ji hev hez kirine. ...” (Elban, 2020b, r. 9).

Di pirtûka sêyem a derheqê Celadet Bedirxan de wekî mînak ev derbas dibin ku agahiyên bêguman in:

“Di sala 1932an de, roja 15ê Gulanê, Celadet Bedirxan û hevalên wî pir tahb û ked dane, kovareke bi navê ‘Hawar’ê, bi tîpên latînî û seranser bi kurdî weşandine. Ji ber vê yekê her sal 15ê Gulanê weke cejna zimanê kurdî tê pîrozkirin” (Elban, 2020c, r. 5).

Di pirtûka çarem a derheqê Mestûre Xanima Erdelanî de wekî mînak hin agahî wisa derbas dibin ku li gor jiyana wê ne:

“... Mestûre Xanima Erdelanî, an jî bi navekî din, Mah Şeref Xanim Kurdistanî, di serdema 18mîn de li bajarê Sinê hatiye dinê. ... Wê nêzikî bîst hezar helbest nivîsiye...” (Elban, 2020d, r. 8).

Di pirtûka pencem a di derheqê Evdalê Zeynikê de ev agahî derbas dibin ku ji bo Evdalê Zeynikê tîr zanîn:

“Nêzî sêsed sal berî hozanekî bi navê Evdalê Zeynikê hebûye. Ew hozanekî pir mezin û bi nav û deng bûye. Evdal hê zarok bûye, bavê wî mirî ye, dayika wî ya Zeynê ew mezin kiriye ji ber vê yekê navê dayika xwe hildaye û navê wî bûye Evdalê Zeynikê” (Elban, 2020e, r. 13).

“Siyabend got:

- Nû hate bîra min carekê bavê min gotibû, ew şahê dengbêjan û Homerosê kurdan e” (Elban, 2020e, r. 14).

Di avakirina metnên honakî de li hemberî rasteqîniyê bi awayekî îznê nivîskar heye. Di nav çîrokan de agahiyên ku tîr dayîn mimkin e ku ji guherînan re meşruiyetekê bibexşîne. Wekî mînak Xecê di nav xewn û xeyalê xwe de rastî Ehmedê Xanî tê û ew bi çavên Xecê tê resmkirin. Ev yek ji aliyê rasteqîniyê ve nehewce ye ku bê teyîdkirin. Bi destê nivîskar û bi çavên zarokê hatiye teswîrkirin û li gorî mentîqa sêwirandinê guncav e:

“Sûreta wî, wek portreya mala me bû. Şaşıkeke mezin, bi renge sorgewez, li ser serê wî bû. Rih û simbêlê wî pir li hev hatibûn. ...” (Elban, 2020a, r. 20).

Wekî mînakeke din di pirtûka sêyem de bi çavderiya Xecê di navbera Celadet Bedirxan û hevalên wî de yên ku tîr jiyîn rast e yan nerast e nediyar e. Loma dikare bê gotin ku ev mînak ji xwe re di nav şeweya honakê de cihekî dibîne:

“... Ez hêdika çûm li ber pencereya vekirî sekinim, dengê kesên hundir xweş dihat min. Yek ji wan digot:

- Li gorî min ê kesek vê kovarê naxwîne! Hema qet xwe pê re aciz neke.

Yekî din got:

- Ji xwe kes nizane bi tîpên latînî bixwîne.

Ji wan yekî digot:

- Celadet kurê min, hema dest ji vê xebatê berde, dê serê te pê bikeve belayê” (Elban, 2020c, r. 17).

Ji aliyê din ve di pirtûkên zarokan de divê tecrubeya zarokan neyê îhlalkirin. Bi gotina Süphandağı (2017, r. 53), divê vegotina pirtûkê û tecrubeya zarokan li hev bên. Di pirtûka yekem de hin daxuyaniyên Xecê bewerdêriyê hinek sist dike. Wekî mezinan tevdiqere. Awer dixuyê ku bi hêsanî hatine holê û wekî ezber in û tesîra mezinan xwe dide ber çavan. Heke di vegotinê de zanayîya zarokan ji hînbûneke xwezayî û li gora xwebûnê zêdetir be dibe ku ji tecrubeya zarokan derkeve. Loma zarok divê bi awayekî ji rola mezinan dûr bikevin. Ev yek di zarokan de li şûna tecrubeyê hînbûna hêsanîyê dihêle. Wekî mînak di pirtûka yekem de tenê li mala Xecê û malbata wê behsa portreya Ehmedê Xanî derbas dibe lê di dawiyê de Xecê ji Ehmedê Xanî re weha dibêje:

“- Belê, ez dikarim bêjim, di her maleke kurdan de portreyeke we bi diwarê wan ve daleqandî ye” (Elban, 2020a, r. 23).

Mînakeke din jî ev e ku hin îfade wekî gotinên ezber in û ev îfade derveyî tecrubeya zarokan in:

“Ehmedê Xanî got:

- Tu çawa ewqasî tiştan dizanî

Min got:

- Ne tenê ez, gelê kurd tev we baş nas dikin û bi navê we pir serbilind û serfiraz in” (Elban, 2020a, r. 23).

Di dawîya vî sernavî de bi gelemperî dikare bê gotin ku ev hemû agahî û hêmanên nasandina navdarên kurdan bi awayekî dikeve qada karînen zanayîyê.

#### 5.4. Şeweya Vegotinê

Pirtûkên mînak ji vegotinên cur bi cur pêk tên. Vebêj û bergehên guherîn, diyalog, teswîrkirin, çûyina demên berê û cihên cihêreng û hwd. di pirtûkan de hatine bikaranîn. Tenê jiyan û agahiyên navdaran di nav pirtûkan de cih negirtine; hin rûdanên rojane û pêwendîdar, rewşên malbat û jiyanê, serpêhatiyên sereke û yên nesereke di pirtûkan de vegotinê ji monotoniyê difilitînin. Wekî mînak di pirtûka yekem de ji bo dîtina gora Ehmedê Xanî, Xecê û malbata wê bi rê dikevin û li ser rê li çend cihên taybetî jî digerin:

“Bavê Xecê, were em di ser rêya Erdîşê re biçin, bila Xecê Sûlava Mûrادیê jî bibîne” (Elban, 2020a, r.15).

Di pirtûkên mînak de carna rojnivîska Xecê jî beşdarî vegotinê dibe û bergeh diguhêre:

“Rojnivîsk:

Xecê rûpelên min da hev, ez danîm ser maseyê û çû. Di demeke kurt de çentikek anî, devê çentikê vekir...” (Elban, 2020b, r.4).

Honak bi rûdanên pêwendîdar xurt dibe û hesta meraqê bi xwîneran re çêdike ku ev yek ji bo şeweyeke erênî giring e. Wekî mînak di pirtûka sêyem de Xecê rastî çivîkekê tê û ew hevûdu dişopînin. Piştê jî aliyê pîrozbahîya cejna zimanê kurdî ve agahiyên derheqê Celadet Bedirxan û serboriya Xecê ji rojnivîskê re tê vegotin. Li pey wan rûdanên pêwendîdar sewirandin bi vî awayî didome û di dawiyê de Xecê û Celadet Bedirxan hevûdu dibînin.

Diyalogên cur bi cur ji vegotinê re zindîtiyê dibexşînin û carna jî danasîna navdarên kurdan dike:

“Ew jineke şareza, dirokzan û hunermend bûye. Mestûre Xanim helbestkara herî mezin a serdema xwe bûye. ...

- Gelo, qet pirtûkên li ser Mestûre Xanim hatine nivîsîn hene? Ez dixwazim di derbarê wê de bêhtir agahî bigirim.” (Elban, 2020d, r. 8).

Têkildariya Xecê û navdarên kurdan bi navbeynkariya xewn û xeyalên Xecê xurt dibe. Bandora vegotinê wekî hevdişîneke rasterast xwe dide hîskirin. Wekî mînak di pirtûka pencem de Xecê bi navbeynkariya xeyalên xwe wekî ku rasterast be Evdalê Zeynikê nas dike:

“Rojnivîska min a xoşevîst,

Çawa mine ew dîtî, min pê zanî ku ew Evdalê Zeynikê ye û yê cem wî jî Temo ye. Va ye dîsa bi awayekî efsunî ez çûbûm, ser dewra Evdalê Zeynikê. Temo hat li ber min sekinî. Gava Temo sekinî, Evdal strana xwe qut kir û ew jî sekinî. Hêj wan ji min nepirsî min got:

- Oxira we ser xêrê be, hûn ji kû tên û bi kû ve diçin?” (Elban, 2020e, r. 18).

#### 5.5. Taybetiyên Navdarên Kurdan ku Tê Mînakgirtin

Rolmodeltî ji bo zarokan tiştekî diyarde ye. Dêûbav, mamoste, mezinên nas, lehengên pirtûkan an jî yên wênefilm û hwd. wekî rêber tên dîtî. Di pirtûkên mînak de hin biryar, tevger û hwd. ku ji aliyê navdarên kurdan ve hatine kirin ji bo zarokan dikarin bîna mînakgirtin. Di pirtûka yekem de agahiyên ku derheqê Xanî de tên veguheştin dikare bala zarok û nûciwanan bikişînin:

“Wî bi rêya Mem û Zîn hem çanda kurdan derxistîye pêş, hem jî pîrsgirêkên gelê Kurd li ber çavan raxistîye. Ew hezkiriyê çand û folklorê kurdî bû, ji kurdan re digot qedr û qîmetê bidin zimanê xwe” (Elban, 2020a, r. 9).

Çiroka Dewrêşê Evdî di pirtûka duyem de ji aliyê qehremaniyê ve ji bo zarokan wekî mînak e:

“Edûle sê roj li ser hev tepsîya qehweyê digêrîne lê kesek fîncanê hilnayne. Temir Axa lê dinêre ku mîrxasek ji eşîra wî dernekave, ew jî radibe nameyek ji Dewrêşê Evdî re dinivîse, hal û hewalê xwe jê re dibêje. Gava name digihîje ber destên Dewrêş, Dewrêş çend hevalên xwe yên mîrxas li hev kom dike û diçe konê Temir Axa. Fîncana qehweyê ji ser tepsîya Edûlê hildide û bi carekê de vedixwe” (Elban, 2020b, r. 10-11).

“Em hêvî ji we dikin hûn neçin, dijminê we bêbext in, hûnê tîk biçin! Neçin, neçin!

Dewrêş li Edûle vegebiya got:

“Edûle, min kirasê qehremaniyê kiriye stûyê xwe, em ê herin û em nahêlin ew bên ser axa me rûnin. ...” (Elban, 2020b, r. 22).

Di pirtûka sêyem de derbas dibe ku Xecê peyvekê Celadet Bedirxan qet ji bîr nake û ev gotin ji wê re ji aliyê zimannasiyê ve dibe wekî nîşan:

“Rojnivîska min a xoşevîst:

Roja min weha derbas bû lê hê ji dengê Celadet Bedirxan di guhên min de ye ku got:

“Xecê zarokên serdema ku tu jê hatî bi zimanê kurdî dipeyivin?” (Elban, 2020c, r. 24).

Di derheqê Mestûre Xanim û bavê wê de di pirtûka çarem de gotinên ku tên kirin ji bo her malbatê wekî şîret in:

“... Di pirtûkê de tê gotin ku bavê Mestûre Xanim hê di zarokatiya wê de pir qedr û qîmet dayê. Her gav bi hev re siwarê hespên xwe bûne, li gelek deverên Kurdistanê geriyanê û bavê wê, jê re qala jiyana mîr û begên Kurdistanê kiriye” (Elban, 2020d, r. 9).

Taybetiyên Mestûre Xanim ên ku di pirtûka çarem de derbas dibin ji bo xwîneran rolmodeltiyê dikin:

“- Hebe tune be, ancax keybanûya me ya Mestûre Xanim bikare vê yekê pêk bîne. Loma ew jineke xwenda û pir bi aqil e” (Elban, 2020d, r. 17).

“- Min dizanibû ku tu yê jî vê nivîsê fêhm bikî, ji ber ku mamê Bawer gotibû: ‘Mestûre Xanim pênc, şeş zimanan dizane’ (Elban, 2020d, r. 21).

Taybetiyeke Evdalê Zeynikê ku dikare bê mînakgirtin ev e:

“- Evdal, rojekê li ser rêya xwe, rastê dergûşa zarokekî kur tê. Navê wî datîne Temo. Temo dibe mala xwe û wî wekî kurê xwe, mezin dike. ... Rojekê Evdal û Temo rastî qulingeke baskşikestî tên. Ji wê rojê pê ve, qulinga birîndar jî bi xwe re digerin” (Elban, 2020e, r. 14).

## 5.6. Nasandina Çand, Jiyan û Dîroka Kurdan bi Navbeynkariya Navdarên Kurdan

Navdarên kurdan yên dîrokî û edebî ji xwe di nav çanda kurdan de cih digirin. Bi vî awayî di jiyana kurdan de bi tevger û şîkl û şemalên xwe ve jî dikevin çarçoveya nasandina çand, jiyan û dîroka kurdan. Ji ber vê yekê agahiyên ku di vê qadê de tên veguhestin dikevin kategoriya karînen zanayî. Di pirtûkên mînak de hin bikaranîn ji bo vê yekê gelekî şênber in. Wekî mînak ji bo Ehmedê Xanî di pirtûka yekem de hin taybetî derbas dibin ku ji bo çand, jiyan û dîroka kurdan giring in:

“Keça min di dîroka kurdan de cihekî wî yê pir taybet û girîng heye. Pêwîst e ku hemu kes wî binasin. Ji ber ku wî di warê çand, huner, weje û ziman de xebatên pir mezin kirine. ...” (Elban, 2020a, r. 8).

Di derheqê çîroka Dewrêşê Evdî de di pirtûka duyem de agahiyek heye ku çand û sosyolojiya kurdan dide nasîn:

“Min got:

- Xalo, Temir Axa çima keça xwe nedaye Dewrêşê Evdî?

Kalo got:

- Ji ber ku Dewrêş Êzidî bû ye.

Min got:

- Xalo Êzidî kî ne?

Kalo got:

- Êzidî ji qewmek ji Kurdan in. Lê hinek baweriyên wan cuda ne” (Elban, 2020b, r. 11).

Agahiyên Kovara Hawarê di pirtûka sêyem de wisa derbas dibin ku ji bo zarok û nûciwanan ji aliyê destpêka edebiyata kurd a modern gelekî giring in:

“Di sala 1932an de, roja 15ê Gulanê, Celadet Bedirxan û hevalên wî pir taheb û ked dane, kovareke bi navê ‘Hawar’ê, bi tîpên latînî û seranser bi kurdî weşandine. Ji ber vê yekê her sal 15ê Gulanê weke cejna zimanê kurdî tê pîrozkirin” (Elban, 2020c, r. 5).

Taybetiya Mestûre Xanim di pirtûka çarem de weha derbas dibe ku ji bo nasîna edebiyata kurdan balkêş e:

“Mestûre Xanim, jina yekem e ku bi helbestkî dîroka kurdan nivîsîye” (Elban, 2020d, r. 8).

Di derheqê Evdalê Zeynikê de agahiyên ku derbas dibin di pirtûka pêncem de ji bo çand û dîroka dengbêjiyê biqîmet in:

“Evdal bi sedan stran li ser Temo û li ser qulinga birîndar diafirîne. Ne tenê li ser wan li ser xizanî, kalbûn û korbûna xwe jî gelek stran diafirîne. Ew stran bi saya serê dengbêjan heya roja me hatine” (Elban, 2020e, r. 14).

### **5.7. Rola Navdarên Kurdan ji bo Guherîna Leheng û Xwîneran**

Guherîna lehengan di pirtûkên zarokan de ji bo xwîneran derfeteke giring pêk tîne ku xwîner bi saya wan tevger û biryarên nû hewl bide ku ew jî kêmasî û şaşiyên xwe çareser bike yan jî ji bo wan rêyekê bibîne. Di pirtûkên mînak de hin caran li ser Xecê hin caran jî li ser navdarên kurdan ev derfet peyda dibe. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku kesayetên navdar ji leheng û xwîneran re ji bo çareserîya kêmasî û şaşiyên fonksiyonel in. Wekî mînak di pirtûka yekem de Xecê ji bavê xwe hînî armanca lêkirina navê xwe dibe û ji ber vê yekê zanebûnek jî wê re çêdibe. Wexta dîtî û hevnasîna Ehmedê Xanî de vê yekê tîne zimên. Ev mînak di guherîna Xecê de rola bandora Ehmedê Xanî nîşan dide:

“- Navê te çi ye?

Min got:

- Navê min Xecê ye. Ji ber ku ev nav kurdewar e, li ser şîretên we, bavê min ev nav li min kiriye” (Elban, 2020a, r. 21).

Di pirtûka sêyem de wekî veguhestineke sêwirandî Xecê çavdêriyê dike ku Celadet Badîrxan bi bandora hin hevalên xwe jî derxistina Kovara Hawarê hinek bêhêvî dibe û biryara devjêberdanê digire. Piştî bi nasîn û gotinên Xecê dibîne ku di demên paşerojê de ev kovar jî bo kurdan rola pêşengiyê pêkaniye. Ji ber vê yekê dîsa tê li ser biryar û kiriyara xwe. Herçiqas ev guherîn wekî sêwirandî were holê jî ji aliyê xîretê ve ji leheng û xwîneran re piştgiriya dike.

### **5.8. Hesta Wekîhevbûnê di Navbera Leheng-Xwîner û Navdarên Kurdan de**

Herî pêşiyê dikare bê gotin ku xwînerên van pirtûkan bi Xecê re dikevin hesta wekîhevbûnê. Yanî li vir wekîhevbûn di navbera serleheng û xwîner de ye. Xecê û malabata wê ku çi jiyane û çi kirine, çi hatine sere wan di dem û rewşa xwendinê de tîne pêşberî xwîneran û ew jî wan bi vî awayî xeyal dîkin. Loma dikare bê gotin ku xwîner dikevin şûna serlehengê û serpêhatî wisa tê şopandin. Ev tesbît ji aliyê xwendinê ve tiştekî sirûştî ye û bi temsîla karakterên guncav, şeweya vegotinê, vegotineke baş û dilovan û hwd. pêk tê. Dikare bê gotin ku pirtûkên mînak, ji van hêlan ve bi bikaranîna serlehengeke xweşik, rûdanên rojane yên ku tîne jiyîn û bi vegotineke dilovan û hwd. ve rêya wekîhevbûnê vedike.

Hevparên wekîhevbûnê di pirtûkên mînak de dikarin li ser kesayetên navdar jî bîne dîtî. Îcar kesayetên navdar jî dikevin navbera serleheng û xwîner. Wekî mînak wekîhevbûneke rasterast di pirtûka çarem de derbas dibe. Serleheng Xecê bi peywendîya rojnivîska xwe di derheqê Mestûre Xanimê de wisa dibêje:

“Rojnivîska min a delalok,

Wê gavê, min jî xwe wek Mestûre Xanim hesiband. Loma ez û bavê xwe jî bi hev re pir digeriyan, dê û bavê min di derbarê gelek tiştan de agahî didan min.” (Elban, 2020d, r. 9)

“Min pirtûk danî li ber sere xwe ku ez razê, bes hişê min li ser Mestûre Xanim bû. Min pir heves dikir ku ez jî bibim yeka wek wê bi nav û deng. Ez tevî van xeyalan di xew re çûm” (Elban, 2020d, r. 11).

Hespê Xecê yê bi navê Hedban di pirtûka duyem de, di heman deme de navê hespê Dewrêşê Evdî ye. Xecê di bin bandora pirtûka Dewrêşê Evdî de dimîne û ev navdarê kurd jî dikeve binhişê wê:

“Kekê Dewrêş navê hespê te Hedban e ne wisa?

Wî got:

- Wey! Keçê tu navê hespê min ji kû ve dizanî?

Ez kenîyam û min got:

- Navê hespa min jî Hedban e” (Elban, 2020b, r. 18).

Xecê û kurê meta wê di dema gerîna der û dorên gund de rastî qulingeke baskîkestî tîn û wê bi alîkariya berxvanî xweş dîkin. Piştî Xecê di nav xeyalên xwe de wexta rastî Evdal û Temoyî tê haya wê jê çêdibe ku qulinga wan jî baskîkestî ye. Xweşkirina wê qulingê jî wekî ya berê dibe ku di navbeynkariya van her du rûdanan de meriv dikare hesta wekîhevîbûnê bigere:

“- Kekê! Me jî qulingeke baskîkestî dîtîbû û bi vê melhemê baskên wê qenc bûn. Eger tu bixwazî em hinek li baskên wê qulingê jî bidin, dibe ku ev jî qenc bibe” (Elban, 2020e, r. 19).

### 5.9. Bidestketina Karînên Hestiyarî

Bi navbeynkariya pirtûkên berbehs zarok girêdayî kesayetên navdar dibin. Qîmetê didin wan û jî wan hez dîkin. Herçiqas bi karînên zanayî di derheqê wan de xwedî agahiyan bibin jî karînên hestiyarî li pey wan tîn. Mînakên ku hezkirina navdarên kurdan dike û têkildariya serleheng û navdarên kurdan zexm dike dikare bi awayekî di nav karînên hestiyariyê de bîn nîrxandin:

“... min ji Ehmedê Xanî daxwaz kir ku tiştêkî xerab bi Mîrcanê neyê ...” (Elban, 2020a, r. 18).

“Min jî ji xwe re wêneyêkî Ehmedê Xanî, ku li ser kevîrekî neqîşandî bû û morîyeke heşin jî ji Mîrcanê re kirî” (Elban, 2020a, r. 18).

Xecê pir caran di bin bandora navdarên kurdan dimîne û bi vî awayî dikeve nava xewn û xeyalên wan. Piştî di nava xewn û xeyalan de rastî navdarên kurdan tê û bi wan re dikeve hevpeyvîneke delal. Bi navbeynkariya xewn û xeyalan be jî hevdişînek çêdibe di navbera serleheng û navdarên kurdan de. Ev derfeteke erênî ye û hestiyariya lehengê bi navdarên kurdan re zêde dike. Loma dikare bê gotin ku karînên hestiyarî jî vî aliyî ve jî xwe re rêyekê dibîne. Wekî mînak di pirtûka yekem de weha derbas dibe:

“- Xecê keçê min, de ji xewê rabe va ye em gihîştin mala xwe. ...

Gava ez ketim hundir, min dîna xwe daye ku va ye Ehmedê Xanî li pêş min e!

Sûretê wî, wek portreya mala me bû. ... Gava ku Ehmedê Xanî serê xwe jî pirtûkê rakir, çavên wî bi min ket, rabû ser xwe, ber bi min ve hat û got:

- Tu kî yî û tu li vir çî digêrî?” (Elban, 2020a, r. 20).

### Encam

Edebiyata zarokan ji bo zarokan derfetên pîralî pêk tîne. Feydeyên ku ji kar û çalakîyên edebiyatê ve tînin bidestxistin ji bo zarokan deriyên cur bi cur vedikin. Wekî mînak ji aliyê qadên geşedana zarokan ve pêşveçûn, xwenasîn, civaknasîn, xwedîbûna nîrxên gerdûnî û yên neteweyîbûn û hwd. dikarin jî vî hêlê ve bîn rêzkirin. Ji wan hin derfet û karînan hene ku zarok bi navbeynkariya wan, ji aliyê kesayetî û nîrxên xwe yên çandî û neteweyî ve dewlemend dibe. Ji ber vî yekê dikare bê gotin ku danasîna navdaran ji bo zarokan bi taybetî û giringiyên xwe ji aliyê rolmodelgirtinê ve balkêş e. Ji bo zarokan kesên navdar ji biryar, xebat û taybetiyên xwe yên erênî ve dibin mînak û rêberîyeke giring pêşkeş dîkin. Di heman demê de bi tevger û xebatên wan nîrxên gerdûnî û yên çandî di nav hevgirtiyekê de tînin dîtin. Bi vî awayî ji bo zarokan di rêya başbûnê de şopandina wan derfetan peyda dîkin.

Destketiyên ku ji aliyê analîza naverokê ve hatine gihîştin, nîşan didin ku ji bo zarokan danasîna navdarên kurdan bi şeweyên cur bi cur hatine pêkanîn. Berî her tiştî di pirtûkên mînak de serleheng keçiyeke biçûk e û danasîna navdarên kurdan li ser rojnivîska wê hatine sêwirandin. Navê wê Xecê ye û ew bi hemanên sêwirandinê serpêhatiyên xwe yên cihêreng dijî û bi navdarên kurdan ên wekî Ehmedê Xanî, Dewrêşê Evdî, Celadet Bedîrxan, Mestûre Xanima Erdelanî û Evdalê Zeynîkê re têkildar dibe. Bi serpêhatiyên wan ên hevpar xwînerên zarok navdarên kurdan berbehs nas dîkin û hîni taybetî û giringiyên wan dibin. Ji aliyekî din ve hatiye dîtin ku xwîner, navdarên kurdan tenê bi cûreya biyografîyê nas nakin. Cûreyên din jî ji vî aliyî ve dikare bîn bikaranîn. Pirtûkên mînak wekî rojnivîskê ji bo vî armancê hatine

bikaranîn. Wekî encam hat dîtîn ku zarok, bi navbeynkariya van pirtûkan fêrî agahiyên derheqê jiyan û taybetiyên wan dibin, dem û cihên ku ew jiyane nas dikin, çand û dîroka gelê xwe dibinin, ji wan rolmodel digirin, tevger û xebatên wan dişopînin, ji xeynî karînen zanayî bi hez kirina wan xwedî karînen hestiyarî û hwd. dibin.

Di vê xebatê de hat dîtîn ku jiyanên navdarên kurdan digel nirxandina metnên mînak bi hin hêman û şeweyê ve şênber dibin. Wekî mînak şeweya honakê bi lehiqandina jiyanên navdarên kurdan pêk tê. Pirtûkên mînak bi gelemperî ji serpêhatiyên Xecê û rewşên wê û malbata wê ve dest pê dike. Piştî navdarên kurd daxilî serpêhatiyên dibin. Rêjeya honakê jî bi vî awayî li hemberî serpêhatiyên Xecê herçiqas di navendê de be jî kêr dimîne. Ev wekî kêmasiyekê nîne. Çimkî ji bo zarokan vegotîneke balkêş pêk tîne û peyamên xwe li ser wan vedişêre. Hevgeriya rasteqînî û honakê jî bi vî awayî bi agahiyên rasteqîn û hêmanên sewirandinê pêk tînin. Hevgerî di navbera wan herdu têgehan de heye û çend bikaranînen sist hevsengiya wan nikare xerab bike. Şeweya vegotinê balkêş e û vebêj, diyalog, şeweya vegotinê û hwd. di pirtûkên mînak de her tim diguherin. Taybetiyên navdarên kurdan ku tên mînakgirtin ji aliyê nivîskariyê, helbestvaniyê, xizmetên ku ji bo gel hatine kirin û hwd. ve wekî şîretan xuya dikin. Ji ber vê yekê pirtûkên mînak bi navbeynkariya navdarên kurdan nasandina çand, jiyan û dîroka kurdan dide ber çavan. Ji bo guherîna leheng û xwîneran rola navdarên kurdan di pirtûkên mînak de derbas dibin. Serleheng û xwîner dikarin derfetên guherîna ji tevger û biryarên wan bibînin. Di navbera leheng, xwîner û navdarên kurdan de hesta wekîhevîyê jî di hin cihan de şênber dibe û ev di heman demê de bidestketina karînen hestiyarî jî xurt dikin.

## Çavkanî

- Arıcı, A. F., Urgan, S. & Şimşek, T. (2016). Çocuk edebiyatı türleri ve çocuk eğitime katkıları. T. Şimşek (Ed.), *Kuramdan uygulamaya çocuk edebiyatı el kitabı* (Çapa 4). (217-328). Grafiker Yayınları.
- Aytekin, H. (2016). *Çocuk ve gençlik edebiyatı*. Anı Yayıncılık.
- Bilkan, A. F. (2005). Klâsiklerden okunacaklar yapmak. *Hece/Çocuk edebiyatı özel sayısı*, 104-105, 142-149.
- Bulut, F. & Şimşek, Ş. (2022). Çocuk edebiyatı eserlerinde tarih sevgisi ve kültürel mirasın korunması: Bilgin Adalı'nın "Kariye Hazinesi" örneği, *Journal of History School*, 59, 2518-2540.
- Çiftçi, F. (2013). Çocuk edebiyatında yaş gruplarına göre kitaplar ve özellikleri. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 1(1), 125-137.
- Çiftçi, F. (2024). Veguestina nîrxên çandî di pîrtûkên zarokan de. Z. Ergün (Ed.), *Gotarên vekolînên çanda kurdî* (r. 159-175). Nûbihar.
- Dedeoğlu, H., Ulusoy, M. & Alıcı, M. (2013). Çocuklar için hazırlanmış biyografik eserler üzerine bir içerik analizi. *Hacettepe Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 28(2), 116-131.
- Demiral Taher, İ. (2018). Perwerdeya nîrxên çandî û civakî di kovargerîya zarokan a kurmançî-latînî de (1980-2015). (Teza Lisans a Bilind a Neçapbûyî). Zanîngeha Mardin Artukluyê. Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tîrkiyeyê.
- Elban, Y. (2020a). *Rojnivîska Xecê-1/Xecê Li Dû Ehmedê Xanî ye* (Siyabend, Xêzkar). Dara.
- Elban, Y. (2020b). *Rojnivîska Xecê-2/Xecê Li Dû Dewrêşê Evdî ye* (Siyabend, Xêzkar). Dara.
- Elban, Y. (2020c). *Rojnivîska Xecê-3/Xecê Li Dû Celadet Bedîrxan e* (Siyabend, Xêzkar). Dara.
- Elban, Y. (2020d). *Rojnivîska Xecê-4/Xecê Li Dû Mestûre Xanima Erdelanî ye* (Siyabend, Xêzkar). Dara.
- Elban, Y. (2020e). *Rojnivîska Xecê-5/Xecê Li Dû Evdalê Zeynîkê ye* (Siyabend, Xêzkar). Dara.
- İsen Durmuş, T. I. (2011). Klasik eserlere çocuklar nasıl yönlendirilmeli ve buna ilişkin batıdaki uygulamalardan örnekler. *Turkish Studies*, 6(3), 929-937.
- Karataş, E. (2014). Çocuk edebiyatında "karakter kavramı". *Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 33, 60-79.
- Karatay H. (2016). Çocuk edebiyatı metinlerinde bulunması gereken özellikler. T. Şimşek (Ed), *Kuramdan uygulamaya çocuk edebiyatı el kitabı* (Çapa 4). (80-129). Grafiker Yayınları.
- Lukens, R. J., Smith, J. J., & Coffel, C. M. (2018). *Çocuk edebiyatına eleştirel bir bakış*. C. Pamay (Wergêr). Erdem Yayınları.
- Mert, O., Albayrak, F. & Serin N. (2013). Çeviri çocuk kitaplarının kültür aktarımı açısından incelenmesi. *Ana Dili Eğitimi Dergisi*, 1(3), 58-73.
- Nahrîn, M. (2023). Perwerdeya zarokan bi çîrokên-kitêbeke rêber bo mezinan. Nûbihar.
- Öğüt, B. A. (2016). *Şînmorîka Zîne* (M. Yapıcı, Xêzkar). Hîva.
- Subaşı, K. (2018). *Gîr û Gallî Mindallanî Kurd-Dîrokçeya çapamenî û medyaya zarokan a kurdî*. Nûbihar.
- Subaşı, K., Meral, A. & Akhan, B. (2022). Elaedîn Seccadî û nîrxandîna çîrokên wî yê ji bo zarok û nûciwanan li gor pîvanên edebîyata zarokan, *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7 (2), 220-242. Doi: 10.35859/jms.2022.1156114
- Suvağci, İ. (2020). Di edebîyata zarokan ya kurdî da nûnerek ji nîfşê nû: Berfîn Ayşe Öğüt. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 8(UMS'20), 71-79. Doi: <https://doi.org/10.18506/anemon.832150>
- Süphandağı, İ. (2017). *Gelenek ve zihniyet tenkidine dayalı çocuk edebiyatı kuramı*. Maarif Mektepleri.
- Tosun, T. (2018). Edebiyata zarokan a kurdî li bakur, *Journal of University of Zakho*, 6(1), 147-154. Doi: <https://doi.org/10.26436/hjuoz.2018.6.1.294>
- Tosun, T. (2025). Şopa kovara Nûbiharê ya li ser edebiyata zarokan di kovargerîya kurdî de. *Artuklu Kurdology* (18). 36-64. Doi: 10.35859/artuklukurdology.1575218
- Tüfekçi Can, D. (2014). *Çocuk edebiyatı-Giriş*. Eğitim Yayınevi.
- Yıldırım, A. & Şimşek, H. (2011). *Sosyal bilimlerde nitel araştırma yöntemleri* (Çapa 8an). Seçkin Yayıncılık.
- Yılmaz, R. (Gernas Koçer) (2015). *Kulîlk (Dîwana zarok û ciwanan)*. Nûbihar.
- Zarok TV (2025). *De Bêje*. <https://zaroktv.com.tr/de-beje/> (Têketin: 26.03.2025).



# HAFİZEYA KOLEKTÎF Û REWŞA MEKANÊN HAFİZEYÊ DI ROMANÊN OMER DILSOZÎ DA

Leyla POLAT

The Status of Collective Memory and Memory Spaces in Ömer Dilsoz's Novels

Ömer Dilsoz'un Romanlarında Kolektif Hafıza ve Hafıza Mekanlarının Durumu

**Leyla POLAT**

ORCID: 0009-0005-5201-6463 | zelalzeref@yahoo.com  
Dr., PhD Graduate, Kurdish Language and Culture, Bingöl  
University, Türkiye.

**Citation/Jêgir/Atîf:**

Polat, L. (2025). Hafizeya kolektîf û rewşa mekanên hafizeyê di  
romanên Omer Dilsozî da. *Kurdiyat* (11), 34-45. DOI:  
10.55118/kurdiyat.1690617

**Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:**

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi  
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 03.05.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 23.06.2025  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

**Peer-Review/Hekemtî/Hakemlik:**

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

**Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:**

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

**Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:**

It is declared that scientific and ethical principles have been  
followed while carrying out and writing this study and that all the  
sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di  
pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine  
şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu  
çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve  
kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan  
edilir.

**Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:**

There is no conflict of interest between the author and any parties  
in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya  
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

**Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:**

The authors acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı  
desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul  
etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
haklarını saklı tutarlar.

## Kurte

Omer Dilsoz romannûsekî Edebiyata Kurdî yê îroj e û bi taybetî di romanên xwe da motîfên çand, nerî û folklorê herêma Hekarîyê temsîl dike. Di heman demê da bi bikaranîna devoka herêma Hekarîyê ra hafîzeyê zimanî jî temsîl dike. Ji bo vê xebatê romanên nivîskarî *Neynika Dîlî* (2009) û *Gûzereş* (2014) hatin hilbijartin. Hekarî di herdu romanên Dilsozî da ne bi tenê wek mekanekî fîksiyonî; lê belê wek mekanekî dîrokî, sosyo-ekonomîk, polîtîk û çandî hatiye temsîlkirin û ev temsîl jî bo hafîzeyê kolektîf roleke muhîm hilgirtiye. Armanca vê xebatê ew e ku di du romanên Dilsozî da temsîla hafîzeyê kolektîf, aîdiyet, vederkirin û pê ra jî rola bibîranîn û jîbîrkirinê vekole. Ev xebat nîşan dide ku ew awênêya ku Dilsozî li herêma Hekarîyê gerandiye û motîfên heremî yên ku bi saya wê awênêyê di romanên xwe yên navhatî da bicîkirine, dibe sebeb ku hafîzeyê kolektîf ya herêma Hekarîyê di qada edebîyata modern da jî bê temsîlkirin.

**Peyvên Sereke:** hafîzeyê kolektîf, mekan, Omer Dilsoz, Hekarî, Gûzereş, Neynika Dîlî.

## Abstract

Omer Dilsoz is one of the contemporary Kurdish literature novelists and highlight motifs belonging to the culture, tradition and folklore of the Hakkari region in his novels. Additionally, the author highlights the dialectal characteristics of the Hakkari region in his texts, thereby also representing the linguistic memory of the region. The author's novels *Neynika Dîlî* (2009) and *Gûzereş* (2014) were selected for this study. Hakkari has played an important role in the representation of collective memory not only as a fictional setting in Dilsoz's novels, but also as a historical, socio-economic, political and cultural setting. The present study explores representations of collective memory, belonging, othering and the processes of remembering and forgetting as depicted in Dilsoz's two novels. This study shows that the mirror Dilsoz carried around the Hakkari region and the local motifs he incorporated into his novels, which are the subject of this study, have enabled the collective memory of the Hakkari region to be represented in the field of modern literature.

**Keywords:** collective memory, place, Ömer Dilsoz, Hakkari, Gûzereş, Neynika Dîlî.

## Öz

Ömer Dilsoz günümüz Kürt Edebiyatı roman yazarlarından biridir ve romanlarında özellikle Hakkâri yöresinin kültür, gelenek ve folkloruna ait motifleri sunmaktadır. Aynı zamanda metinlerinde Hakkari bölgesinin ağız özelliklerini ön plana çıkararak, yörenin dilsel hafızasını da temsil etmektedir. Bu çalışma için yazarın *Neynika Dîlî* (2009) ve *Gûzereş* (2014) adlı romanları seçildi. Hakkari, Dilsoz'un söz konusu romanlarında sadece bir kurgu mekanı olarak değil; aynı zamanda tarihi, sosyo-ekonomik, politik ve kültürel bir mekan olma özelliğiyle de, kolektif hafızanın temsili adına önemli bir rol üstlenmiştir. Bu çalışma Dilsoz'un söz konusu iki romanında kolektif hafıza, aidiyet, ötekileştirilme ve yanı sıra hatırlama ve unutmaya dair temsilleri incelemektir. Bu çalışma gösteriyor ki Dilsoz'un Hakkari yöresinde gezdirdiği ayna ve bu ayna sayesinde çalışmaya konu olan romanlarına yedirdiği yerel motifler, Hakkari yöresine ait kolektif hafızanın modern edebiyat alanında da temsil edilmesine olanak sağlamıştır.

**Anahtar Kelimeler:** kolektif hafıza, mekan, Ömer Dilsoz, Hakkari, Gûzereş, Neynika Dîlî.

## Destpêk

Ji serdema kevin a Rojhilatê heta piştî Şerê Cihanî yê Duyem ramanewer û feylesofan mijara hafizeyê bi taybetî di çarçoveya hafizeya şexsî da nixandîye. Di serdema kevin da Platon û Aristoteles, di serdema navîn da Augustinus, di serdema Romayîyan da Cicero têgeha “hafize”yê di konteksta hafizeya şexsî da hilsengandine. Piştî ku Bergson di warê felsefeyê da, Freud di warê pîsikoanalîtîkê da û Proust jî di warê edebîyatê da li ser meseleya travmayê serê xwe êşandiye, mijara hafizeyê her ku çûye bi awayekî berfireh hatiye gengeşekirin. Rola hafizeyê, hafizeya şexsî û kolektîf, hafizeya çandî, nerît di berhemên edebî da jî her ku çûye bûye mijarên hin xebatan. Piştî ku Şerê Cihanî yê Duyem kuta dibe û dû ra encamên şer ên travmatîk di xebatên edebî, psikolojîk, dîrokî, sosyolojîk û hwd. da xwe didin der, ramanewer bi awayekî mecbûrî berê xwe didin hafizeya kolektîf. Ew însanên ku bi awayekî jî şer filitîne şahidiya serdemeke travmatîk kirine û ev yek jî bûye sebeb ku li ser rola hafizeyê gelek gengeşe pêk bên. Hafize di çarçoveya çand û nerîtê da jî hatiye hilsengandin. Paul Connerton sebeba vê yekê bi travmaya Şerê Cihanî yê Duyem ra têkildar dike. Bi taybetî di serdema modern da jibîrkirin –çi bizanetî, çi bi darê zorê, çi jî bêhemdî- û pê ra jî bibîranîn bûne poblema muhîm yê mirovahiyê. Bi van nêrînan ra mijarên wek dermanê jibîrkirinê, parastina çand û nerîtan, bibîranîna dîrokên şexsî û kolektîf, şahidî û sînorên şahidiyê, nivîsîna dîrokê, dîroka resmî û neresmî, dewletên neteweyî û gelên vederkirî, modernîteya ku bi zanetî dide jibîrkirin, koçberî û penaberî, dercibûna ji warê bav û kalan, têkçûn û windabûna nasnameyan di konteksta hafizeyê da hatine hilsengandin.

Mijara hafizeyê bi vî awayî bi taybetî van salên dawî di warê edebîyatê da jî bûye mijareke sereke û hem di çarçoveya neteweyî da hem di çarçoveya psikolojiyê da hem jî di çarçoveya temsilkirina nasnameyê da roleke muhîm hilgirtiye. Çendî ku beriya Şerê Cihanî yê Duyem jî bi hezaran mirov dercî bûne, bi hezaran mirov hatine kuştin, bi taybetî bi polîtîkayên kolonyalist ra serdestan qira hin gelan anîbe jî mijara hafizeyê têra xwe di konteksta hafizeya kolektîf da nehatiye hilsengandin. Lê belê piştî ku hin kes jî qampên Holokoustê sax filitîne, ew qamp ên ku bi awayekî rêkûpêk mirin hilberandine, giringîya şahidiyê û nivîsîna dîroka alternatîf pêşve çûye. Şahidî û bibîranîn bûne bingeha hafizeyê ku ev yek jî bûye sebeb ku hafize ji sînorên şexsî derkeve û di çarçoveyê kolektîf da bê hilsengandin. Mîmkun e bê gotin ku mijara hafizeyê bandor li gelek dîsîplînan kiriye û îro hema bêje di hemû qad û dîsîplînan da xwedî roleke muhîm e; ji ber van yekan di vê xebatê da hat armanckirin ku di bin sîwana van agahiyan da du romanên Omer Dilsozî yê ku şahidî û temsilkirina hafizeya Hekarîyê dihevin, bên hilsengandin û bi xebateke hûrbîn ra şopên hafizeya şexsî, kolektîf, çandî di van berhemên navhati da bên diyaribikin. Hekarî di herdu romanên navhati yê Dilsozî da ne bi tenê wek şûnwar, di heman demê da temsilkirina aidiyeteke qedîm jî pêk tîne ku ew aidiyet piştî salên nodî derbeke mezîn dixwe û herdu romanên navhati jî têkçûna wê aidiyetê û hafizeyê temsîl dikin û bi awayekî travmatîk di şexsê du xortan da têkçûna refek mirovan derdibirrin.

### 1. Hafize û Cureyên Hafizeyê

Hafize, bi bibîranîn û şahidiyê ra têkildar e; ku bibîranîn pêk neyê ne mîmkun e ku ezmûn û hînbûyînen bedenî û hişî pêk bên. Roja îro amnezî wek êşekê, belayekê mixeserî mirovahiyê bûye. Çi ziman, çi tevgerên laşî bi saya teqlîdê tîne qeydkirin û her yek jî di hafizeyê da tomar dibin, loma jî mijara hafizeyê di heman demê da mijara tip û norolojiyê ye jî. Dibe ku ji ber vê sebeb be, di destpêkê da ramanewer, di navbera hafize û takekes da têkilî danîne û hemû pênaseyên hafizeyê di ser van esasan ra pêşve birine.

Hafize di navbera îro û raborîyê da pêk tê, ji ber vê yekê ye ku ramanewerên wek Paul Ricoeur, Maurice Halbwachs, Paul Connerton, raborî bi takekes û civakê ra têkildar kirine û mijara hafizeyê jî bi van her pêwendiyên wê ve hilsengandine. Paul Ricoeur, gotina Aristoteles a “mijara hafizeyê raborî ye” bibîrdixwe û lê zêde dike, bibîranîn bi saya veguherîna bîranînan a bi îmajan ra pêk tê (Ricoeur, 2017, r. 24-25). Du fonksiyonên hafizeyê hene ew jî bi têgehên *mneme* û *anamnesis* ta têkildar in ku ew jî ji peyva *Mnemosyne*<sup>1</sup> yê hatine darastin. Di *mnemeyê* da bibîranîneke ji nişkava û bêhemdî çêdibe; lê belê di *anamnesisê* da biker bi zanetî dide dû hin bîranînan û bibîranîneke bihemdî çêdibe. Piştî Aristoteles, Augustinus jî dibêje “hafize aîdê raborîyê ye û ew raborî, raborîya çavdêriya ne; loma jî raborî ya min e”

<sup>1</sup> Mnemosyne: Xwedewenda hafizeyê ya Titan, keça Gaia û Uranus e. Piştî neh şevên ku digel Zeus derbas dike neh keçên wan ên periyên îlamê çêdibin. *Calliope*: Helbesta epîk, *Clio*: Dîrok, *Erato*: Helbesta eşqê, *Euterpe*: Muzîk, *Melpomene*: Tragedya, *Polyhymnia*: Qeside, *Trepikhore*: Dans, *Thalia*: Komedi, *Urania*: Astronomî (Hesiodos, 1977: r. 120-135).

(Ricoeur, 2017, r. 115). Dîyar dibe ku herdu ramaneweran jî hafizeyê bi raborîyê ra têkildar dîkin û di heman demê da jî bi takekes ra. Hafize pêşkeke şexsî ye, ji ber ku bîranîn yên kesan in. Li gor van nêrînan hafize û raborî, di raborîyê da mane; lê belê Bergson wisa nafikire. Li gor wî raborî tu caran di raborîyê da namîne, di nav dema niha da her tim dijî û diherike, “wekî ku bendek li gilokekî diale, badaneke domdar e, ji ber ku raborî me dişopîne, ew dema niha ya ku li ser rêya wê ye, bêsekn bi wê ra mezin dibe û hiş jî tê manaya hafizeyê” (Bergson, 2013: r. 46). Bergson, hem demê hem jî hafizeyê bi navxweyîkirina biker ra têkildar dike û hafizeyê bi ezmûna biker ra sînordar dike. Mîmkun e bê gotin ku Bergson jî wek Aristoteles û Augustinus hafizeyê bi takekes ra têkildar dike û wek *hafizeya şexsî* pênase dike.

Bi xebatên Maurice Holbwacsi ra têgeha “hafizeya kolektîf” li qadê zêde dibe, li gor wî dem, mekan û nasnameya endamên komekê ew qad in ku kesê ku hilgîrê hafizeyê ye bi wan ra di têkilîyêke bivênevê da ye. Bîranîn di çarçoveya nîrxên kolektîf da tînen tomarkirin û hem mekanîzmaya bîbiranînê hem jî ya jîbîrkirinê li gor mekanîzmayên civakê dîyar dibin. Dîbêje: “Hafizeya kolektîf hafizeyên şexsî dorpêç dike lê belê bi wan ra tevlihev nabe” (Halbwachs, 2018, r. 46). Civakîbûna şexsan û hafizeyê di heman demê da hafizeya kolektîf jî pêk tîne ku ev yek bi saya parvekirina bîranînan û xwedîderkatina bîranîn û ezmûnên hevpar pêk tê. Daxwaz ew e ku hafize bê parastin, bi saya parvekirin û neqlîkirinê bê xwedîkirin. Bajar, gund, tax, kolan, malbat, welhasil hemû têkilîyên civakî, dîni û qewmî li ser danûstaneke ava dibin û ev ezmûn dibin sebeb ku hafize di ser wan hevparîyan ra saz bibe. Jan Assman dîbêje ku: “Hafize zindî ye û her tim di nav ragihandinekê da hebûna xwe dikudîne, ku ev danûstandin derbê bixwe yan ew konteksta rasteqînîyê biguhire yan jî winda bibe, jîbîrkirin derdikeve hole (Assman, 2018, r. 45). Bîbiranîn û jîbîrkirin du alîyên hafizeyê ne ku bi van tespîtan ra dîyar dibe ku wek bîbiranînê, jîbîrkirin jî li dar e û mîmkun e ku tu caran her tişt bi temamî neyê bîbiranîn. Paul Ricoeur dîbêje: “Jîbîrkirin, berîya her tiştî û bi giştî, wek êrîşekê ye. Êrîşek, qelsîyek, kêmasîyek e. Ji ber vê yekê hafize, qe nebe di qonaxa ewil da, xwe wek keftûlefa li hember jîbîrkirinê pênase dike (Ricoeur, 2017, r. 457).

Takekesên ku civakê pêk tînin, hewl didin ku agahîyên xwe yên derbarê raborîyê da, bîranînên xwe û ezmûnên xwe bikudînin û bi vî awayî bi siberojê ra têkilîyêke ava bikin. Raborî bi hin rîtuêlan tê veguhastin û di hafizeyê da hin nexşe pêk tînen. Paul Connerton di vî warî da xebatên bikitekit pêk anîne û erka rîtuêlan a ku li ser bîbiranînan derxistiye pêş. Li gorî Connerton, ji bo ku mirov bikaribe giringîya hafizeyê fam bike, divê mirov pêşî ew fonksiyona hafizeyê ya ku civakan dişewîne, wê fam bike û tevgerên veguhastinê yên ku bi hev ra bîbiranînê mîmkun dîkin, wan vekole. Loma jî bi taybetî li ser rîtuêlên bîranînê û pratîkên laşî bi awayekî berfireh xebitiye. Connerton dîbêje: “Heke tişteki ku bi navê hafizeya kolektîf hebe, em dikarin wê di rîtuêlên bîranînê da bibînin” (Connerton, 2019, r. 122). Connerton di heman demê da digel hafizeya kolektîf, hafizeya şexsî, hafizeya kognîtîv û hafizeya hînbûyînan jî bi awayekî berfireh pênase dike, ji ber ku wekî bîbiranînê, jîbîrkirin jî xwedî giringîyê ye û li gorî wî ji bo ku em karibin, bersiva pîrsa ‘ya ku hatiye jîbîrkirin çi ye?’ bidin divê kategoriyên bîbiranînê yên cihê, bi taybetî hafizeya kognîtîv, hafizeya şexsî û hafizeya hînbûyînan bîr cudakirin (Connerton, 2018, r. 132). Manaya peyvekî, risteyên helbestekî; bîranîna şîklê bajarekî di hafizeya kognîtîv da tînen tomarkirin. Bîranînên şexsî, hest û fikrên şexsî bi giştî di hafizeya şexsî da tînen tomarkirin. Hînbûnîyên ku piştî hin kiryarên performatîv ên ku bi awayekî têra xwe pêk tînen û bi dubareyan zexm dibin, di hafizeya hînbûyînan da tînen tomarkirin.

Hafize wek civaknasî, bi nasname, çand, mekan û demê ra di nav têkilîyê da ye. Ezmûnên hafizeyê di dem û mekanê da pêk tînen û çand jî wê xwedî dike. Bîbiranîn rasterast bi mekanê ra têkildar e, ji ber ku şahidî û ezmûn di mekanê da pêk tînen. Pierre Nora gava dîbêje hewcetîya hafizeyê bi mekanê heye, dîyar dike ku bîyê ku mekanek hebe ne mîmkun e ku hafizeyek li dar be. Loma jî bi taybetî li ser mekanên hafizeyê serê xwe êşandiye, li gorî wî mekanên hafizeyê di heman demê da têkilîyên aloz ên hafizeyê jî dîyar dîkin (Nora, 2006, r. 9). Îmajên bîranînê û ezmûnên ku di hiş da ci digrin bi mekanê ra tînen bîbiranîn. Mekan, bi saya bîbiranînê hin qewimîn an ezmûnan di hiş da bi ci dike. Hestên aidîyetê bi mekanê ra çêdibin, çunkî mekan sembolên raborî, ezmûn û bîranînan nin; ku takekes ji wan mekanan dûr bikeve bi saya bîranînan wan mekanan bi bîr tîne; lê belê ku ew mekan tîk biçin, hêzek wan ji navê bibe, hafize jî derbeke mezin dixwe. Ji ber vê yekê ye ku her gel, netewe, civat bi goristanên xwe; mizgeft, dêr, perestgehên xwe; zozan, newal, şikeft, çîya yan robarên xwe; bi mal û xanûmanên xwe xwedî nasnameyekê ne. Jiholêrabûna mekanan derbxwarina nasnameyê ye ku bi wê ra ‘xwebûn’ jî tîk diçe. Rein Raud û Zygmunt Bauman xwebûnê wek berhemekê dinirxînin, xwebûn ew berhem e ku bi têkilîyên hevkarîger ra ava dibe û di heman demê da bixwe jî diyarker e. Alîyê herî mahrem ya însanan e; lê belê di heman demê da xwe dispîre kodên kolektîf yên însanan (Bauman, Raud, 2018, r. 88). Ku mekan ji holê rabe, bi awayekî

ew kokên ku xwebûn xwe digihîne, ew kok û hafize jî derb dixwin. Paul Ricoeur jî li ser fonksiyona mekanê hûr bûye û dipirse: “Bi kurtasî mekanên hafizeyê hem di manaya xwe ya mekan da hem di manaya xwe ya war/qad da, heke ji navê biçûna bê ka dikaribûn bibin nêrevanên hafizeya şexsî û hafizeya kolektîf” (Ricoeur, 2017, r. 62). Ji ber vê yekê ye ku gava însan bi taybetî jî, gava bi zorê, ew mekanên ku hebûna xwe, nasnameya xwe lê ava kirine, ji van mekanan bêpar bimînin, bi awayekî bi mekanên nû ra jî li hev nakin, bêkok û bênasname dimînin. Julia Kristeva mekanên wereng wek mekanên sosret û yên felaketan pêname dike (Kristeva, 2018, r. 20).

Têkilîyeke din a muhîm a hafizeyê jî bi demê ra heye. Dem jî du alîyan ve xwedî giringîye ye; pêşî rewşek, qewîmînek, bûyerek pêk tê û biker wê dijî, qey dike; paşê roj tê biker bi awayekî bihemdî yan jî bêhemdî wê rewş an qewimîne bibîrtîne; loma jî pêwendîya dem û hafizeyê bi giştî wek rêwîtiyekê hatiye hilsengandin ku ew rêwîti jî îroyê ber bi raborîyê ye. Lê belê Bergson wisa nafikire, li gor Bergson, “Hafize tu car jî îroyê ber bi raborîyê, paşve naçe; berevajî jî raborîyê ber bi îroyê va, pêşve tê” (Bergson, 2007, r. 175). Pêwendîya hafizeyê ya bi raborîyê ra bandora xwe li îroyê û di heman demê da li siberojê jî dike. Îro di bin dara hafizeyê da, di bin dara bîranîn û raborîyê da hin caran bêhn vedide hin caran difetise, ew sî îroyê jî dişewîne.

Em dibînin ku mijara hafizeyê bi giştî di bin banê du xalan da hatiye gengeşekirin. Hafizeya şexsî û hafizeya kolektîf xalên esasî ne, digel wan jî wek binkategorî, hafizeya kognîtîv û hînbûnînan jî ji aliyê Connerton ve li qadê hatine zêdekirin. Jan Assmann hafizeyê bi bibîranîn, nasname, berdewamîya çand û nerîtê ra pêwendîdar dike û têkilîyên van xalan jî wek hîma girêdar binav dike. (Assmann, 2018, r. 23). Prensîba esas a hîma girêdar dubarebûn e ku bi saya wan dubareyan çand di hafizeya tekekesan da bi cî dibe. Li gor Assmann hafizeyeke ku aidê civakan e tune ye lê belê civak hafizeya endamên xwe diyar dikan; bibîranîn di heman demê da dilsozî ye; bi dem û mekanê ra, bi grûbê ra û bi jinûvesazkirina dîrokê ra têkildar e (h.b. 23). Assmann hafizeyê di bin çar beşan da disenifîne û wek *hafizeya mîmetîk*, *hafizeya tiştêyan*, *hafizeya ragihandinî* (*communicative*) û *hafizeya çandî* bi nav dike. Di jîyana rojane da gelek helwest û hînbûnî bi saya teqlîd û xwezîpêanînan tînin hînbûyî. Ev awa hînbûyî hafizeya mîmetîk pêk tînin. Tiştêyan ku di jîyana rojane da li der dora mirovan in, ji nerîteke qedîm heta îro hatine û ew tişte bi awayekî awêneya mirovan in, ew tişte bav û kalan û raborîyî bibîrdixin, bi vî awayî hafizeya tiştêyan pêk tê. Behreya hînbûna zimên û behreya lihevkerina mirovan ne tevgerên navxweyî ya jiberxwe in; beravajî bi saya danûstan û ragihandinan pêk tên. Ev awa hînbûyî jî hafizeya ragihandinî pêk tînin. Hemû nerîtên kom, civak û gelan jî hafizeya çandî pêk tînin (h.b. 27).

Wekî ku di destpêkê da jî hatibû diyarkirin xebatên di warê hafizeyê da bi taybetî piştî Şerê Cîhanî yê Duyem bêtir geşe girtine. Sebeba vê yekê ya esasî hin şahidiyên piştî şer in. Hin kesên ku ji Holokoustê filitîne piştî demekê dest pê kirine behsa wan rojan kirine, bi saya şahidiya wan, mijara şahidiyê rehendeke nû bi dest xistiye. Primo Levi ku ji Auschwitzê rizgar bibû û şahidê komkujîya Nazîyan bû, dibêje: “Her kesê ku komkujîyên jin û zarokan vedibêjin, bi destê kê, li kîjan welatî dibe bila bibe, li ser navê kîjan îdeolojîyê dibe bila bibe birayê me ye û em ê pê ra bin” (Levi, 2015, r. 70). Piştî ku di destpêka sala 1933yan da Hitler tê iktîdarê bêtir ku haya mirovahîyê jê çêbe qampan dide avakirin. Bi milyonan însan di wan qampan da bi awayekî rêkûpêk tînin kuştin ku Giorgio Agamben jî bo wan mirinan dibêje ku: “Li Auschwitzê mirov nemirîn, cendek hatin hilberandin” (Agamben, 2017, r. 75). Ew qampên ku wek Volkloser Raum (deverên ku ji gel hatine paqijkirin) hatine pênamekirin, di wan qampan da di heman demê da suceke kolektîf jî hatiye hilberandin, loma jî şahidî beravajî agahiyên berdest ên wan rojan dibe diyardeyeke giringtir. Agamben, rola şahidan bi vê hevokê derdibirre. “Karê kesa/ê ku nemirîye (filitîye) bibîranîn e, nikare bibîrneyîne” (h.b. 28).

Beatriz Şarlo bi taybetî behsa salên derbeya leşkerî ya Arjantînê dike, li gorî wê li hember şideta dewletê û êşkerekirina wê şidetê, yekane rê şahidî ye, vegêran e, ev yek jî rola hafizeyê muhîmtir dike. Şarlo dibêje: “Di navbera Şerê Cîhanî yê Duyem û îro da hafize statûyek bi dest xist ku ne mimkun e bê înkarkirin” (Şarlo, 2012, r. 38). Hemin ku statûyeke hafizeyê heye, divê cudatîya hafizeyê û nivîsîna dîrokê jî ji hev bîr cihêkirin. Ramanewerên vê qadê bi taybetî her du qadê jî hev cihê kirine û para rasteqînîyê dane ser milê hafizeyê. Li gor nêrîna ramanewerên qadê nivîsîna dîrokê jî objektîfîyê dîr e; çûnkî dîrok jî aliyê serdestan ve tê nivîsîn û nivîsîna dîrokê jî şahidiyê wêdetir sêwirandineke çêkirî ye. Polîtîkayên ku erkeke muhîm didin dîrokê piştî xwe dispêrin têkilîyên serdestiyê û di nivîsîna dîrokê da bibîranîn pirî caran tînin organîzekirin an sêwirandin. Loma jî mimkun e ku ji rasteqînîyê dîr bin û ji bo hin armancên serdestiyê hatibine organîzekirin. Bi taybetî piştî avakirina dewletên neteweyî ev polîtîka bizanetî, bi

awayekî birêkûpêk hatiye plankirin û di nivîsîna dîrokê da, yan hin tişt bizanetî hatine jibîrkirin, yan hatine deformekirin yan jî bi temamî hatine beravajîkirin. Pirre Nora ‘hafizeya neteweyî’ dide ber pirsan, li gorî wî bi taybetî netewedewletan xwestin ku zorê li hafizeyan bikin, dîrokê jî nû ve binivîsin, li ser dîrokê vesazkirinekê pêk bînin, ji ber ku armanca wan jî tomarkirina hafizeyê zêdetir, sazkirina hafizeyeke çêkirî û alîgir bû. Nora dibêje: “Hafize û dîrok, ne heman tişt in, heta gelek tişt hene ku wan jî hevdu cihê dikin. Hafize her tim jîyan bixwe ye, li hember her awa destwerdanan hesas e. Lê dîrok, çêkirina tiştan a jinûve ye ku ev tişt êdî tune ne, loma ev her tim biarîşe û kêma in (Nora, 2006, r. 19).

Têkilîya hafize û travmayê jî mijareke din a hafizeyê ye ku bi taybetî piştî Şerê Cîhanî yê Düyem bi şahidiya hin mirovan ra werçerxeke nû dest pê kir, em dikarin bêjin ku, ev yek bû sebeb ku bi taybetî gelên ku hatine kolonîzekirin behsa travmayên xwe bikin. Lêkolîn û xebatên derbarê travmayê da û yên hafizeyê bi demê ra bûne şirikên hevdu. Travmaya ku derbê li hafizeyê dixê, di heman demê da dike ku însan jî bo demekî lal bibin û bédengî pêk bibe. Her du mijar gelek têkelî hev bûne, çunkî trauma derbê li hafizeyê dixê, vegêrana travmayê her çî qas zehmet be jî di heman demê da li hember bédengî û têkçûnê serîrakin e. Paul Ricoeur, dibêje: “Heweseke, îdîayeke hafizeyê heye, ew jî dilsoziya hafizeyê ya bi raborîyê ra ye” (Ricoeur, 2017, r. 40). Vegêran di heman demê da pakbûnê dibexşîne însanan.

## 2. Hafizeya Kolektîf û Rewşa Mekanên Hafizeyê di Romanên Omer Dilsozî da

Mekana esasî ya Neynika Dilî gundê Xana Sêgundan e û bi navê xwe yê fermî Sütluce ye û çendîn ku li gor hin saloxan du sed sal bêrê gund bûye jî îroj wek zozan tê zanîn. Gûzereş ku navê romana Omer Dilsozî ye navê gundekî Hekarîyê ye. Navê wî yê fermî Cevizliköyü ye û girêdayî navçeya Çelêyê (Çukurca) ye. Fiksiyona her du romanên jî li ser hin travmayan û hafizeya wan travmayan ava bûye. Di destpêkê da her tişt di cîyê xwe da, wek xwe, bi rol û formên xwe yên qedîm derdikevin pêşperî xwîner. Rojên xweş û bextewar, jîyaneke bi rêkûpêk, nerîtên qedîm, têkilî û peywendiyên edetî, hînbûnîyên rojane yên ku jîyanê organîze dikin hene û xwîner bi wan ra hem karakteran hem jî mekanan dinase. Di her du romanên da jî ew rojên xweş û bextewar jî ber hin sebebên polîtîk derbê dixwin û ew tabloyên xweş têk diçin. Di vê têkçûnê da bi saya şahidiya du xortan xwîner hay ji du serdeman dibe; ew rojên berî travmayê û ew rojên piştî travmayê derfetê dideku xwîner jî şahidiya serdemekê bike. Trauma wek xala werçerxanê her du romanên jî hem jî alîyê demê ve hem jî alîyê mekanê ve hem jî jî alîyê jîyana lehengan ve dike du ker. Berî travmayê her tişt wek xwe ye, normal û rûtîn e, însan li gorî şert û mercên xwe têra xwe bextewar in; lê belê piştî travmayan têkçûyînek pêk tê ku kevir li ser kevir namîne.

### 2.1. Neynika Dilî

Neynika Dilî saet di 00.13yan da dest pê dike û di destpêka her bêsê da dem deqeyek paşve diçe û piştî çardeh beşan roman di saet 00.00ê da diqede. Kronolojîyeke berepaşkî ku xwîner ji îroyê hildide û dibe destpêka çîrokê û di dawiyê da çîrok cardin digihîje îroyê. Vegêr û serlehangê deqê Mistefa, ji gundê Mizgeftê ye. Ev gund, gundê Axayî û gundê Keşkanê, Xana Sêgundan pêk tînin.

Mistefa kurê Mela Ebdurrehman e. Mela Ebdurrehman kesekî dinyadîtî, oldar û aqilmend e û digel van taybetîyên xwe melayê gund e ku wek mideris temsîla demên medreseyan jî pêk tîne. Du kekên Mistefa yên bi navê Tajdîn û Ehmed û du xwişkên jî wî piçûktir ên bi navê Ronahî û Bînahî (cêwî ne) hene. Mala wan maleke berçavan e û têra xwe dewlemend e. Dayîka Mistefa jîneke jêhatî, xwezan e û xwedî otorîteyeke veşartî ye. Tajdîn zewiciye, xwedî du zarokên keçîn e. Ehmed li bajêrekî evraz (dayîka wan bo bajarekî rojavayê Tirkîyeyê wisa dibêje) xwendekar e, Ronahî û Bînahî keçikên xama ne. Jîyana adetî ya gundan, rolên wan, hatinçûna wan, her tişt normal e. Mistefa rojekî xewnekê dibîne, di xewna wî da gund bûye kavi. Gava bavê xwe ra behsa xewna xwe dike, bavê wî bi tenê jî wir radibe û diçe. Dîyar e ku ew xewn mizgîniya xêrê nîn e û nivîskar bi vê xewnê ra xwîneran jî bo rojên reş amade dike. Ji destpêka romanê heta dawîya romanê li cem Mistefa defterek û Qurana pîroz a bavê wî heye. Ew defter a ku demên berê ya Ehmed bûye û lê piştî ku Ehmed emanetî Mistefa kiriye, hem bîranînên Ehmed hem jî yên Mistefa dihewîne. Ew defter bi demê ra dibe sindoqa qeder, serpêhatî, hezkirin, şikestin, ezmûn, têkçûyîn û hafizeya Ehmed, Mistefa û Xana Sêgundan. Defter alegorîya hafizeyê ye ku roman hê di rûpela ewil da vê yekê eşkere dike.

Min ê li wê deftera kekê xwe nivîsandiba gil û gazina xwe ya bi awênayê re. Wî, defterek ji min re hiştibû da ku ez jî qewl û peyva xwe lê bikim...Da ku gotinên me hemûyan lê bipengin.. da ku qewlên me hemûyan tê de bibin ro û robar û bi pêl bikevin. çî zanim, da ku em hemû wan êşên xwe yên wan rojên agirîn tê da bisojin

û bingor biken, da ku em hemû bibin şahidên wan qewmîn û rûdanên diltezîn û rastiyeke jê ji xwe re çêkin û rêyekê pê bidin ber xwe. (Dilsoz, 2006, r. 49)

Defter hem yadîgarek e hem jî sindoqa hafizeya demekê ye; helbet her nivîskar xwedî endîşeyeke edebî ye û wan endîşeyên xwe li qelemê dixê; lê belê ji destpêka romanê jî diyar dibe ku endîşeyên nivîskar ên kolektîf û dîrokî hene, loma jî hê di destpêkê da xwîner hay jê dibe ku ev dmetnên şahidiya demeke xirab û hafizeya wê demê bike. Ranajit Guha helwesta Rojhilatê ya kolonyalist dide ber pirsan û rexneyan, gotina Hegel bibîrdixe. Li gorî Hegel ew gelên bêdewlet, ji ber ku bêdewlet in, tiştekî wan ê ku hêjayê nivîsê be tune ye (Guha, 2006, r. 22). Lê belê Guha, Ian Watt û Mihail Bahtin referans nîşan dide û dibêje ku “roman vegêrana herî xwerû ya ezmûnan e” (h.b. 77). Neynika Dîlî ji serî heta dawî roj bi roj, gav bi gav, kêlî bi kêlî bi şahidî û ezmûnên Mistefa ra pêşve diçe û dibe sindoqa hafizeya civakê. Mistefa çî gav li defterê tiştek binivîse bi taybetî bin peyvekî yan hevokekî xêz dike. Ev peyv û hevok di dawîya romanê da, di bin banê beşeke serbixwe da digîjin hevdu.

Mistefa şahid e, her tişt li ber çavên wî diqewimin, şeveke zivistanê kesên nediyar mala wan didin ber guleyan, Mela Ebdurrehman ê ku Quran daye ser rehlîyê û dixwîne, bi dengê guleyan ra ji cîyê xwe dipeke û radibe ser çokan. Li derve berf bêsêkin dibare û ew şev mala wan bi xwîna bavê wan ra dibe mekanekî din, dibe mekanê tecrûbeyeke din. Berî vê bûyerê di nav gundiyan da jixwe lihevnekirinek destpêkiriye, hin xortan berê xwe dane çiyê, lê di heman demê da li gund qereqolek çêbûye û hin kesan jî çeken beqçîtîyê hilgirtine. Berî vê bûyerê Ehmed jî bi awayekî alîyê xwe diyar kiriye û ew û çend xortên din rik kutane ew kesên ku çek hildane û bûne beqçî. Ev lihevnekirin dibe sebeba têkçûna çand û nerîta bi hezaran salan, ji ber ku heta wê rojê xêncî xirecîrên rojane di navbera gundiyan da dijmintîyeke ku bibe sebeba kuştinan tunebûye. Gundî êdî ne gundiyan berê ne, ew ên ku demên berê qedr û qîmetên hev girtine, niha ketine pêsîra hevdu; hafizeyeke çandî û nerîtên qedîm dewsa xwe dihêle neyartî û zikreşîyê ra. Ehmedê ku zanîngeh dixwîne havînê tê gund, dibihîze ku bavê wan bi vî awayî hatiye kuştin, girî û rîka xwe dijîdine. Çendî ku demek şûnda dê bi Dilşayê ra bizewice jî rojek tê ew jî bi çend hevalên xwe ra berê xwe dide çiyayan. Travmayên malbata Mistefa didin dû hev. Şevê dîsa mala wan didin ber guleyan û wê carê zarokê Tajdîn yê çil rojî di dergûşê da dimire. Ebdurrehmanê çil rojî jî wek kalkê xwe bi guleyên nepen tê kuştin. Di şerekê da Ehmed jî tê kuştin û leşker laşe wî berî ku li rastê gund raxin didin ber kêran, guh û pozê wî dibirrin. Piştra qereqol biryarê dide ku gund vala bike û mala wan didin ber êgir.

Judith Herman dibêje, ji bo însanan ji şingirêdanê baştir tedawî tune ye, ji bo ku bikaribin hurmetê nîşanî windayên xwe bikin (Herman, 2016, r. 238). Ne bi tenê ji şingirêdanekê bêpar dimînin, di heman demê da hemû bawerî û nîrxên wan jî tên bînpêkirin, heta wê rojê şahidiya bêhûrmetîyeke wereng nekirine ku laşê kesekî piştî mirina wê/wî bi vî awayî bê tarûmarkirin. Giorgio Agamben dibêje: “Ew fikra ku dibêje, cendek hejaye hûrmetekê ye, heysiyeta mirinê heye, di rastîya xwe da nakeve qada moral/etîkê. Kokên wê bêhtir xwe dispîre tebeqeyên herî arkaîk ên hiqûqê” (Agamben, 2017, r. 83). Malbat berê xwe dide bajarê Hekarîyê. Malbateke ku ji kokên xwe hatiye dûrxistin, bi awayekî berbayêketî di vîrdawêda belawela dibe. Tajdîn tevî komeka oldar a radîkal dibe û travmayên xwe bi wî awayî dinixumîne. Dayika wan piştî ev qas trajediyan ji mala xwe û warê xwe jî tê dûrxistin, êdî di bédengîyê da xwe aş dike, Ronahî û Bînahî ji hemû nîrxên malbatê averê dibin. Mistefa hewl dide ku bi saya xulamî û paletîyê debara malbatê bike. Dilşa hin caran heye hin caran tune ye, kes nîzane halê wê çî ye. Defter her tim şahidiyê dike. Li gorî Pierre Norayî; abîde, muzexane, goristan, arşîv, merasîmên bîranînê, diyardek, arşîvên neteweyî, defterên nîşeyan, albûmên malbatî, kitêbên dîrokê, ferheng, koleksiyon, peymanname, zabitname, salveger, dosyayên belgeyan yê noteran, gotinên pesindayînê, komele, cejn, cîyên pîroz, kitêbên dersan yê mekteban, cîyên hecê, sirûdên neteweyî, ala, ... mekanên hafizayê ne. (2006, r. 9, 14, 23, 33, 37, 223). Deftera Mistefa bixwe jî mekanek e, ku hafîze hem li wir qeyd dibe hem jî mekanek e ku Mistefa her carî xwe dispîre wir, li wir diheve.

Mistefa û deftera ku ji Ehmed yadîgar maye dibin hafizeya hemû travmayên malbatê. Valakirina gund di jîyana wê malbatê da mîlad e, xala werçerxanê ye; ji ber ku çî hafizeya şexsî, çî hafizeya kolektîf, çî hafizeya çandî çî jî ya mîmetîk, hemû derbeke mezin dixwin. Sirgûn dibe sebeb ku ji kokê xwe û zimanê xwe, ji çand û nerîtên xwe dûr bikevin.

Sevan Nişanyan di ferhanga xwe ya etîmolîjîyê da sirgûnê wek, ‘*ji sebebên sîyasî îşandina kesekê/i ya li cîyekî din, nefy*’ pênase dike (Nişanyan, 2012, r. 448). Çaxê ku merivek ji warê bav û kalên xwe tê sirgûnkirin bi tenê cezayek lê nayê birin di heman demê da ji çand, nerît, ziman, ji nîrxên civaka xwe jî dûr dikeve, ku wê civakê ayîdîyet û nasnameya wê/wî şêwandiye. Loma jî derçîkirin cezayeke polîtîk e. Çûnkî

ji wê rojê şûnde nasname û xwebûna wê/wî jî derbeke mezin dixwe. Nasname û xwebûna ku ji kokên xwe hatiye dûrxistin her ku diçe diçilmise; ya ku tê serê Mistefa û malbata wî ev yek e. Edward Said, sirgûnîyê wek diyardeyeke dirokî hildisengîne ku ji alîyê mirovan ve ji bo mirovan hatîye hilberandin (Said, 2016, r. 35). Trauma û trajedîyên Mistefa ne bi tenê ev in, dayika wan pir nexweş dikeve, edî felc e jî; ji ber ku perê Mistefa tune ye, ji kekê xwe Tajdîn alîkarî dixwaze, lê Tajdîn guh nade wî. Bi otobosê dayika xwe dibe nexweşxaneyê. “Bi qasî saetekê em li dorê man, piştê bi delîvekê ez ketim hundir û min rica ji dixtorî kir ku li dayika min binêre, lê ji ber ku ne sîgorta ne jî ‘yeşil kart’a) me hebû, bijîşkî em ji nexweşxaneyê derxistin” (Dilsoz, 2006. r. 74). Ji ber ku pere pê ra nîne dayika xwe dide ser piştê xwe û hewl dide ku wê bigihîne malê.

Ez û dayika xwe jî di bin banê bajarekî ewqas biçûk de, li nav heyîna bêheyî, di nav eşîr û xizmên boş û neyî da, bi ser û sebebeka belkî tenê piçekî xemsarî lê di rastiya xwe de bê xwedanî, dibûn rondik û mîza pîrejîneka jikasketî û ji kîs û hîsên xwe diketin. Belkî bo kurîkekî ji vê dîmenê girantir ser darê dinyayê çî tiştêkî din nebe. Were dayika te, bo xemsariyeka biçûk, delîveyên fireh hemû lê teng bibin û keça axayekî kurd, bi xwe de bimîze û bê bizav û bêgav li xwe biheyirî û neşêbî çî tiştêkî jê re bikî. (h.b.74-75)

Dayika wî li ser piştê xwe ber rehma Xwedê. Mistefa wê keliyê bi van hevokan vedigêre. “Kewsera keça Emer axayê Xanî, li Culemêrgê, li ser piştê min, bi mirîneke dilsoj, bêyî ku tiştêkî bibêje, bi felcbûyî koça xwe ya dawîn kir û stûna mala me ya dawîn jî ji binî de qirîya” (h.b. 76).

Mirîna dayikê ya bi vî rengî derbeke din li hafîzeyê wan a kolektîf dixe, çûnkî dayika wan temsîlkara dawî ya rojên berê bû. Ew mirin, ew sehne di heman demê da meseleyeke polîtîk û sosyolojîk jî dinimîne. Mîz abject e, alegoriya tîkçûyîna nasnameyekê ye. Julia Kristeva, abjectionê bi vî şêklî pênase dike: “Ew taybetîyên laşî yên ku mirov bi saya xwedan, mîz, avik, jiberçûna zarokan û hwd. ji xwe dûr dixin, abjection wan dinimîne, ji ber ku însan xwe û hebûna xwe bi vî awayî ji pîsiyan diparêze (Kristeva, 1982, 54). Kristeva di heman demê da têgeha, abjectionê wek bertekeke psîkolojîk rave dike; ji ber ku kom û biker dixwaze tiştên ku sînoren wî tehdît dikin, ji xwe dûr bixin. I.M. Jung jî dibêje: “Nîjad, zayend û zayenda serdest, pêşî yên ku ne serdest in wan ji nava xwe diavêjin, piştê jî wê/ wî wek heyîneke pîs û pelas didin nasîn” (Veguhêzer: Mutluer, 2013. r. 15). Em dikarin bêjin ku ew jîyana li bajêr, Mistefa û malbata Mistefa xistiye rewşa abjectionê, loma mirîna xanîmeke xwedî eslûesayê ya bi vî awayî nîşan dide ku ew ên tu caran aidê wir nebin û pê ra jî ew nasnameya wan ya berê dê tu caran necebire.

Mistefa her ku hewl dide jîyanê bi awayekî birêkûpêk bike bi trajedîyê nû ra cardin cardin tîk diçe. Herî dawî berê xwe dide gund ku li wir mala bawo jinûve çêke û li malûmilkê xwe xwedî derkeve, lê piştî lêdana ku ji leşker û serbazan dixwe, dev ji vê xeyalê berdide. Di vê navê da hîn dibe ku, Bişeng a ku bi salan e jê hez dike, lê ji ber şert û mercên jîyanê nekariye ku nêzê wê be, di bin aşûtê da maye û miriye. Ji rojên xweş û bextewar tu tişt namînin. Mistefa ew deftera ku ji Ehmed mirat maye û ew Qurana ku xwîna bawo lê hesikiye, wan her du yadîgaran dide bin biçenga xwe, diçe ku tu bibînî. Ehmed berî ku deftera xwe bide Mistefa ev gotin gotibûn: “Ev defter, ne tenê paşxana vî dilê min ê reben e, hinekî jî deftera te ye jî. Tu jî gotina xwe lêke. Bila gotinên me bigihêjin hev û bibin çîrokeke boş” (Dilsoz, 2006, r. 82). Hem ew defter, hem ew Quran hem jî Neynika Dîlî şahidiya travmayê kolektîf û pê ra jî travmaya şexsî ya Mistefa dikin û hafîzeyê kolektîf ya serdemekê bi vê vegêranê ra di qada edebîyata Kurdî ya modern da tê temsîlkirin. Ew gundê wêranbûyî, mekanekê muhîm ya hafîzeyê bi sedan salan bû; bi tîkçûna wî mekanî ra ew nîrxên ku malbatê li hev digirin li ber bayê dikevin û wek çûyîna Mistefa ya bêveger diçin ku diçin.

## 2.2. Gûzereş

Romana Gûzereş jî wek Neynika Dîlî di destpêkê da endîşeya nivîskar dide der. Di rûpela ewil ya romanê da ev gotin hene.

Erê erê, ew qesir qesra Keşe ye. Li pişt Taxa Bergovagewro, herî dawî kadîn bû, a niha jî kavi e. Hejar bi vê “aniha”yê hinekî giro bû, -gelo kîjan dem ji mirovan re dema tê de ye; dema xeyalê an a nivîs û nivîştare. (Dilsoz, 2014, r. 4)

Ji vê gotinê jî diyar dibe ku romanê di navbera raborî û îroyê da here û were û fiksiyona romanê dê li ser bîranînan ra biherike. Di destpêkê da nimûneyên muhîm ên pirçandîtî û pirzimanîyê yên herema Hekarî xwe didin der. “Li ser darê navdêra qesrê, bi zimanê Aramî nivîsek heye. Çav lê dike lê nizane bixwîne. Hingê dengê nepen di hişê wî de dibêje, “Krohamlox!” (h.b. 4). Di vê romanê da jî di destpêkê da xewnek heye û dîsa serlengê romanê xewnekê dibîne. Roman bi xewneke Hejar dest pê dike, di xewna

wî da Danyêl ê nestûrî û xaçperest û Ebdîrehman ê kurd û misilman dipeyivin û endîşeyên xwe didin der, ew ên derbarê siberojê da. Wek xewna Mistefa ev xewn jî mizginîya xêrê nîn e. Danyêl jî Ebdîrehman ra dibêje: “Baxwê min, heke rojekê fetl û bayê felekê li me û li hewe xayîn geriya, min divêt tu qewlekî gel min bikî, ku hindî dinya ava bit, nehêlin ev rismê pêkvejiyanê li ser vî warî biçilmise”(h.b.5). Nivîskar hê di destpêkê da bi pevxistineke wereng bi xwîner dide hîskirin ku ev romanê bibe qeyda hafizeya kesekî û digel wê jî hafizeya civakekê. Piştî ku Hejar şîyar dibe, bi van gotinên hanê ra endîşeya xwe û ya romanê dide der: “Wewww, çi xewneke ecêb bû! Ji duhî ve ye ez ketime telaşê. Îlem, sîya raboriyê wekî zulfikarê Îmam Elî ser patika stûyê mirovan e. Raborî, war e, milk e belkî jî nivîstar e” (h.b.6). Raborî war e, milk e û nivîstar e; her yek diyardeyeke hafizeyê ye ku em dikarin bêjin ku diyar e Hejarê benê hafizeyê bide destê xwe û giloka ku di îro destê wî da ye, dê bi saya hin bîranînan bade.

Beatriz Şarlo ew epîstemolojîyên ku piştî xwe spartine dirokên fermî, li hember wan epîstemolojîyan radibe û ji bo eşkerekirina hin heqîqetan roleke muhîm dide şahidiyê. Şarlo vê yekê bi têgehên wek “*vegera li ziman, vegera li biker û hişê biker*” derdibirre û dibêje ku: “Bi kurtasî dîroka devkî û şahidî, bi saya ew kesê ku behsa jîyana xwe dike, derfetê dide ku ji bo parastina bîranînan yan jî ji bo veherandina nasnameyeke ku hatiye hincirandin, jinûva heqê vegêranê bi dest bixe” (Şarlo, 2012, 17). Hejar kêman caran behsa îrorojê dike, hema bêje her kêlî bi awayekî berê xwe dide demên borî; zaroktîya xwe, qul û qulçikên Gûzereşê, şîretên Babê Bangîn û bûyerên ku jîyana wî û ya gundiyan wî serobino kirine. Di îroya Hejar da tenê çend hûrgilî hene, li Amedê dijî û bi jinekê ra têkilîyeke wî ya nebinavkirî heye. Sinem parlementer e û her tim bi rêya peyaman ji Hejar daxwaza nivîsekê dike, nivîs ji bo çi ye, yê derheqê çi yan kê da be ew jî nediyar e. Roman bi rêwîtiyeke Hejar a ber bi girtîgeha Amedê dikude, Hejar dê nasekî bibîne. Piştî barek zor û zehmetiyên qontrolên girtîgehê ew û serdanên din xwe digihînin hûndir. Hejar li wir rastî zarokekî bi navê Bozo tê. Bozo pênc an pêncûnîv salî ye û hatiye dîtina bavê xwe. Bozo yê ku wek agir û şetele ye, kêlîyek be ji di cîyê xwe da nasekine, ev yek bala Hejar dikişîne; ji ber ku Hejar hest pê dike ku Bozo ne ji nehsbûna xwe; lê belê ji ber êşa xwe wisa tev digere. Ew yek dibe sebeb ku Hejar ber bi zaroktîya xwe ve dest bi rêwîtiyekî bike û ji wê zaroktîyê heta îroyê qala çîroka xwe bike.

Gava Hejar çav bi çavên Bozoyê biçûk ket, veciniqî. Bozo, di temenê pênc, heye ku pêncûnîv an şeş salî de bît, ew, stûxwar û havî bû lê tîna çavên wî wekî stêrkekê geş bû. Tîjka çavên Bozo wek tîrekê li mîlaka Hejar aliqî û tê re derbas bû. Hejar, bi çavpêketinê re di nava xwe de hejiya, tirtilî û êşeke giran ku hingê sebeba wê nezanî, di binê pişka xwe de seh kir.

Demildest pêleke giran bi bîra wî ket û ew Hejarê sêwî, ewê pênc-şeş salî bû nalîneke kûr û li nava kezeba wî rawestiya. Ew dem û dewranên berze, bi carekê de wek xewnekê jê ve xuya kirin û tu dibê qey anîha ligel mijek efsûnî bi hespê demê siwar bûye û çûye, li wî gundê dûredest, dûreçav peya bûye. Wî gundê ku ew dê di tevahiya jiyana xwe de, tenê û tenê ji xwe re war û mala rastîn bibîne. Wî gundê ku ew ê di nivîstara xwe de tekane şikesta xwe bihesibîne, weha jî hest pê bike û her û her wisa di giyanê xwe yê zîz de bihewîne. War û mirov, wek goşt û neynûkê ne. (Dilsoz, 2014, r. 8-9)

Bozo dibe sebeb ku Hejar bi bîr bîne û hafizeya dem û dewraneke wînda xwe bide der. Tiştî ku Hejar bi bîr tîne û haya xwîner jî jê çêdibe ev e. Zemanekî Hejar zarokekî pênc an şeş salî ye, ji Gûzereşê ye, dê û bavê xwe qet neditiye û bi kalkê xwe ra dijî. Gundî li wan xwedî derdikevin û hema bêje her şev ji wan ra şîvê tînin. Kalkê wî Bangîn mirovekî dinyadîtî ye, aqilmend e; loma jî gundî li hember wî hûrmetkar in. Gund xweş, jîyan wek xwe ye, lîstikên bi havalan ra dilê wî geş dîkin, sohbetên Bangîn ên bi hevalên xwe ra mêjiyê wî dide zorê ku ji wan fam bike. Carcaran di sohbetên wan da şahidiya hin gotinên metirsîyê dike. Gûzereşî û gundên der dorê bi biharê ra berê xwe didin zozanan; lê dewletê ji ber rewşa siyâsî ya wan rojan, derketina li zozanan qedexe kiriye. Ev yek bûye sebeba hin metirsîyan, ji ber ku derketina zozanan nerîteke qedîm e û ku dernekevin zozanan heywanên wan dê telef bibin, ku ev yek jî pêk bê dê nikaribin debara xwe bikin. Loma jî gundî demildest radibin û heywanê xwe bi awayekî kelepûrî ji dest derdixin. Zozan ne bi tenê ji bo heywanên wan, ji bo wan jî xwedî giringîyeke mezin e; çûnkî nerît e, bîr e, hilberandin e, azadî ye. Di sohbetekê da Bangîn pêşbîniyekî tîne ziman, dibêje ku:

Gelî pismaman, te guh lê ye; baş guhê xwe bidine van gotinên min, paşê nebêjin hizra xwe bo me negot. Ev mehrûmkirina zozanan, rûdaneke sivik û hema heçkoheya nîn e. Ev destpêka dem û dewraneke nû ye. Heke hûn ji min bipirsîn, ez ê bêjime we, ji niha ve berhevîyên xwe bikin. (h.b. 52).

Xala werçerxanê ya ewil ji bo Gûzereşîyan û wê herêmê qedexekirina zozanan e. Piştî jîyan her ku diçe ji bo wan zehmettir dibe, hin gundî çek hildidin û dibin qoriçî, hin gundî jî ji gund bar dîkin û berê xwe didin bajar an bajarokan. Rewş û dewran roj bi roj diguhire.

Dilsozî, bi vegêrana Hejar ra şayesa gundê Gûzereşê dike. Ew mekanê ku mala wan e, warê wan e, dê demên bê ji navê biçe. Paul Ricoeur dibêje ku: “Ew mekanên ku bûne şûnwar, hêjayî yadkirinê ne. Bîranîn ew qas dilsozê wan meknan in ku, hafizeya vegêr ji bibîranîn û qalkirina wan hez dike” (Ricoeur, 2017, r. 61). Gûzereş ne bi tenê mekan e, xwedî kesayet e, leheng e jî, ihtîmal e tecrûbeyên Dilsozî bixwe kana vê vegêranê ye. Li gor agahiyên ku me ji Omer Dilsozî vergirt, Gûzereş (Cevizliköyü) di tarîxa 10.06.1995 an da tê valakirin û şewitandin.

Ew roja ku fermana valakirina Gûzereşê digihîje gundîyan di jîyana hemûyan da xala werçerxanê ya duyem pêk tê û çûyîneke bêveger destpê dike ku ew çûyîn wan belawela dike.

Pergal belav bû. Jiyan bin guhê hev ket. Bi hezaran mirovên bêçare, bi terş û tewalê xwe, bi erz û eyalê xwe, bi îrf û pêzanên xwe, wekî lêmistekê bi ser bajaran de qulipîn. Bi carekê de her tişt şêlo bû. Her tişt aloz bû; ne bajaran xwe bo wergirtina koçeke weha amade kiribû, ne jî koçber dilxwazê koçeke weha demildest bûn. Xwîn li xwîna hev nekeliya. Çawa ku zome li Serrezan çenedibû, her weha li Kanîkewka Colemanê jî çî Gûzereş, Bilêcan, Şivîşk, Marûfan çî zanim bi dehan gund şîn nedibûn. Nedibû, ev kiras li vê bejnê nedifelîsî. Bi carê de, bi dehan col û celebên pez û dewaran bi ser kulîfekên bajaran de qulipîn û bêhna wê çikand. Niha êdî tenê alozî serdest bû. Bi sedan zar û zêcên bi ser malên mirovên xwe de hêwişî, bi hezaran mirovên bê war û bê nan... (Dilsoz, 2014, r. 139)

Vegêran li ser du esasan ava dibe, berî travmayê û piştî travmayê; berî travmayê war gul û gulistan e, piştî travmayê war êdî nîne û niştêcîhên wî perperîşan dikevin li ser rêyan. Ew bûyerên ku bûne sebeba travmaya şexsî û ya kolektîf bi awayekî jî dibin sebeba vegêranê; jî ber ku qurban naxwazin raborîya xwe ji bîr bikin, dixwazin çîroka wan jî li darê dinyayê bê bîhistin û her kes bizanibe bê ka çî hatiye serê wan. Dercîkirin, koçberîya bi darê zorê, belawelabûna malbatên mezin, jîbîrkirina zimên û nerîtên qedîm bandorê li hafizeya şexsî û kolektîf dike ku ya ku tê serê Hejar jî ew e. Loma her tim bibîrtîne ku bikaribe xwedîti wê hafizeya hevpar bike. Hasan Sun, gava behsa roman û romannûsiya Kurdî ya ji 2000ê şûnda dike, dibêje ku: “Van nivîskarên di ronahîya ezmûnên xwe da; civak, takekes, serdestî û dîrok wek keresteya dahênanê bi kar anîne û bi saya edebîyatê hewl dane ku dîroka alternatîf binivîsin (Sun, 2014, r. 10).

Çîroka Hejar jî dibe du ker, çîroka berî travmayê ya rojên xweş e û çîroka piştî travmayê ya trajedî û şikestînan e. Roja ku gund tê valakirin Bangîn bi awayekî derasayî wînda dibe, kes nizane çî tê serî wî. Loma jî hin kes dibêjin Bangîn giyanê Gûzereşê bixwe bûye. Gava Hejar bi malbata Mihemed Salih ra bi rê dikeve, Mihemed Salih ku hevalê Bangîn e, kêlîyekê dizivire û dibîne ku Gûzereş dişewite. Berî ku jî gund derkevin Bangîn jî Hejar ra dibêje: “Bêxê min, tu gel malbata Mihemed Salih here, hêj pêdiviya vê kinêti bi te heye. Here û binivîse; çu tiştêkî di neke ha, karê te ev e. Binivîse bêxê min, binivîse... (Dilsoz, 2014, r. 146). Ev mîsyon ne bi tenê ya Hejar e, di heman demê da ya Dilsozî ye. Hejar çîroka Gûzereşê ya qedîm, efsaneyên wî, zimanê wî, gelî û newalên wî, aqilmendên wî; çîroka gelên Nastûrî, xaçperest, misilman ên ku zemanekî niştêcîhên wan herêman bûne, çîroka zaroktiya xwe û jîyana belawela ya piştî valakirina Gûzereşê û çîroka dayîk û bavê xwe dinivîse.

Mihemed Salih ku bavê heşt kuran e, li bajêr çî qas bêjî ew qas têk diçe û dike nake nikare zarên xwe li cem xwe bigire, her ku mezin dibin her yek ber bi alîyekî din ve diçin û Mihemed Salihê ku bavê heşt kuran e, roj tê mihtacê nanekî tîsi dibe. Dilsoz, bi saya çîroka Mihemed Salih, çîroka wan însanan vedigêre ku dikin nakin, nikarin xwe li bajaran bigirin. Rojin Canan Akın û Funda Danışman di kitêba xwe ya bi navê Bildiğin Gibi Değil da nozdeh hevpeyvîn –ên bi zarokên salên nodî ra- cemandine. Di destpêkê da Yıldırım Türker dibêje ku: “Ağır, hêlîna te dîroka te jî holê radike; bi hêvîya ku rojekî bikaribî vegere li ber hejarîyê, birçîtiye ber xwe didî” (Akın, Danışman, 2105, r. 11). Kes nikare vegere Gûzereşê kavilbûyî; dîrokek, çandek, nerîtek û helbet hafizeya civakê ya piştî xwe spartibû hînbûnîyên qedîm, li bajar û bajarokan li ber bayê dikeve, belawela dibe. Hejar hewl dide ku wê hafizeya qedîm li hev bicemîne, bide hev, birînen wê bikewîne û bicebirîne û bi saya nivîsê tomar bike. Dawîya romanê da wek demên zaroktiyê diçe li ser gora dê û bavê xwe di xew ra diçe. Veger mimkun nebe jî ew hafîze hê jî li wir e. Li Gûzereşê ye. Gûzereş û Neynîka Dilî li herêma Hekarîyê dide dû vegêrana hafîzeyekê, mekanên wan hafîzeyan. Mekanên hafîzeyê jî ber sedemên siyasî jî navê diçin, ev tehrîbat derbê li nasnameya însanan dixwe, ew însanên ku jî kokên xwe dîr dikevin, li ber bayê dikevin û her yek ber bi alîyekî ve axmetaxme dibin.

### **Encam**

Bîranînên Mistefa û Hejar bîranînên serdemekê ne, yên bi hezaran însanên dercîbûyî ne. Di romana Neynika Dilî û Gûzereş yên Omer Dilsozî da hafizeya salên nodî, bandora şer, gundên ku hatine valakirin, malbatên belawbûyî, nasnameya têkçûyî di şexsê Mistefa û Hêjar da hatine temsîlkirin. Şahidiya wan endîşeya nivîskar dinimîne, travmayên ku jiyane bi hemû sotînerîya xwe li dar in, divê neyên jibîrkirin, ew mekanên ku zaroktiya wan lê derbas bûne, ku zemanekî mekanên çand û nerîtekê bûne, divê neyên jibîrkirin. Halê wan mekanan îro dilê meriv biperîtîne jî, divê ew mekanên hafizeyê bîn bîranîn. Van endîşeyên Dilsozî kiriye ku her du metnên navhatî hafizeyeke kolektîfê di şexsê du karakteran da bê temsîlkirin. Çunkî tiştê ku hatiye serê wan hem di hafizeya kolektîf da hem jî di hafizeya şexsî da hê dûr neketiye, nêz e. Ji ber van yekan di fîksiyona romanê da mêtî, raborîya dîrneketî bi awayekî ketober tevî îroya wan nabe, bizanetî bi bîr tînin, bi îsrar bi bîr tînin. Mîmkun e bê gotin ku ev îsrar di heman demê da îsra Dilsozî ye. Dilsozî bixwe bi Mistefa û Hejar ra hemnîfî e. Di her du metnan da jî mekanê hafizeyê diyarker e, dem bi rasteqînîyê ve têkildar e. Hekarî, gundên Hekarîyê, Gûzereş, Xana Sêgundan, Çelê, Wan, Amed ne wek mekanên sêwirandî ne, bi rasteqînîya xwe ve hatine temsîlkirin. Mistefa û Hejar şahidên dîrokeke nêz in û vegêrana wê dîrokê bûye para wan. Mistefa û Hejar bes ne vegêrên çîrokên xwe ne; dîroka wan a şexsî û hafizeya wan a şexsî temsîla bi hezaran çîrokan dinimîne.

Hafize di heman demê da barekî giran e, takekes bi wî barî ra dikeve têkoşînekê; heta barê xwe li cîyekî daneyîne nikare jî wê giranîyê xelas be, nivîs jî yek jî wan çareserîyan e ku dibe sebeb ku hilgîrê hafizeya kolektîf bi rêya nivîsê jî giranîya barê xwe xelas bibe. Omer Dilsozî di her du romanên navhatî da, berê xwîner daye salên nodî, Hekarîya salên nodî, di şexsê Mistefa û Hejar da, travmaya wan salan li qelemê xistiye. Raborî, şînen negirtî, nasnameyên parçeweslebûyî, hesret, tenêti, xizantî, travmayên domdar, hestên sirgûnîbûnê, hemû bi hev ra pêwendîdar in, loma jî di vegêrana romanê da di zikê hev da nin û hev temam dikin. Bi taybetî bikaranîna devoka herêma Hekarîyê ra, ev pêwendî zexmtir dibe, bikaranîna devokê di heman demê da bi mekanê ra û hafizeya wî mekanî ra li hev dike. Dilsozî bi bikaranîna biwêj, gotinên pêşîyan, peyvên heremî yên devoka Hekarîyê ra, hafizeya zimên jî temsîl dike. Ji ber ku endîşeyeke dîtir a wan deqan jî ziman e, karakter piştî ku jî gundên xwe dûr dikevin jî çand, nerî û zimên jî dûr dikevin, romanên navhatî li hember vê dîrketinê radibin. Em dikarin bêjin ku vê endîşeyê kiriye ku Dilsozî, bi zanetî bide dû peyvên herêmê û wan peyvên û qalibgotinan, bi formên xwe yên resen di metnên navhatî da bi kar bîne. Sirgûn di heman demê da derbeke mezin li zimên jî dixê, ev peyvên ku bikaranînan wan bi mekaneke lokal ra têkildar in, li mekaneke din hikmê xwe wînda dikin, bi demê ra tîn jibîrkirin. Sirgûn û dercîbûn piştî hafizeya şexsan, kolektîfan, çand û nerîtan dişkîne; hafize dikeve sekeratê. Omer Dilsozî di her du romanên navhatî da li hember wê sekeratê radibe, bi saya hafizeya kolektîf li wê gencîneyê xwedî derdikeve û wan mekanên hafizeya civakî bi hemû taybetiyên xwe ve dişayesîne û xwîneran jî dike şîrikê wê hafizeyê.

### Çavkanî

- Agamben, G. (2017). *Tanık ve arşiv Auschwitz'den artakalanlar*. Ali İhsan Başgöl (Çev.). Dipnot.
- Akın, R. Danışman, F. (2015). *Bildiğin gibi değil*. Metis Yayınları.
- Assman, J. (2018). *Kültürel bellek eski yüksek kültürlerde yazı. hatırlama ve politik kimlik*. Ayşe Tekin (Çev.). Ayrıntı Yayınları.
- Bergson, H. (2007). *Madde ve bellek*. Işık Ergüden (Çev.). Dost Kitabevi.
- Bergson, H. (2013). *Metafizikçe giriş*. Atakan Altınörs (Çev.). Paradigma.
- Connerton, P. (2018). *Modernite nasıl unutturur*. Kübra Kelebekoğlu. (Çev.). Sel.
- Connerton, P. (2019). *Toplumlar nasıl hatırlar*. Aladdin Şenel. (Çev.). Ayrıntı.
- Dilsoz O. (2009). *Neynika dili*. Aram.
- Dilsoz, O. (2014). *Hêvîyên birîndar gûzereş*. J&J.
- Guha, R. (2006). *Dünya-tarihinin sınırında tarih*. Erkal Ünal (Çev.). Metis.
- Halbwachs, M. (2018). *Kolektif hafıza*. Banu Barış (Çev.). Heretik.
- Herman, J. (2016). *Travma ve iyileşme*. Tamer Tosun (Çev.). Literatür.
- Hesiodos (1977). *Hesiodos eseri ve kaynakları*. Azra Erhat ve Sabahattin Eyüboğlu. (Çev.). Türk Tarih Kurumu Basımevi.
- Kristeva J. (1982). Powers and horror. An essay on abjection. Trans: Roudiez L. S. (Çev.). Columbia University Press.
- Kristeva, J. (2018). *Korkunun güçleri*. Nilgün Tatal. (Çev.). Ayrıntı.
- Levi, P. (2015). *Così fu Auschwitz: testimonianze 1945-1986*. Einaudi.
- Levi, P. (2013). *Bunlar da mı insan*. Zeyyat Selimoğlu (Çev.). Can.
- Mutluer, N. (2013). *Cinsiyet halleri*. Varlık.
- Nişanyan S, (2012). *Sözlerin soyağacı: çağdaş türkçenin etimolojik sözlüğü*. Everest.
- Nora P. (2006). *Hafıza mekanları*. Mehmet Emin Özcan. (Çev.). Dost Kitabevi.
- Ricoeur, P. (2017). *Hafıza, tarih, unutuş*. M. Emin Özcan (Çev.). Metis.
- Said, E. (2020). *Kış ruhu*. Tuncay Birkan (Çev.). Metis.
- Sun, H. (2014) *Kürt romanında travma ve psiko-politik çevrelenmişlik 2000'den sonra yazılı kürt romanı*. (Teza masterê ya çapnebûyî). İstanbul Bilgi Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Şarlo, B. (2012). *Geçmiş zaman*. Peral Bayaz Charum (Çev.). Metis.
- Zygmunt, B. & Raud R. (2018). *Benlik pratikleri*. Mehmet Ekinci. (Çev.). Ayrıntı.



# ئەحمەد موفتیزادە و بزاڤین ئەوی یێن نەتەوهیی و نایینی ل ڕۆژەهلەلاتی کوردستانی (1932-1993) خواندنه‌کا میژوویی

Karwan Salih WAISY

Ahmed Muftizade and His National and Religious Role in Eastern Kurdistan  
(1932-1993) A Historical Study

Ahmed Muftizade ve Doğu Kürdistan'daki Ulusal ve Dini Rolü (1932-1993)  
Tarihsel bir İnceleme

**Karwan Salih WAISY**

ORCID: 0000-0001-9116-1843 | salih.waisy@uoz.edu.krd  
Dr., Asst. Prof., Department of History, Zakho University, KRG-Iraq.

**Citation/Jêgir/Atîf:**

Waisy, K.S. (2024). Ehmed Muftizade û bizavên ewî yên neteweyî  
û ayînî li Rojhelatê Kurdistanê (1932-1993) xwandineka mêjûyî.  
*Kurdiyat* (11), 46- 66. DOI: 10.55118/kurdiyat.1679705

**Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:**

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi  
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 19.04.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 24.06.2025  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2025

**Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:**

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

**Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:**

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

**Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:**

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatiye beyankirin ku di pêkanî û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin./ Bu çalîşma yapîlirken ve yazîlirken bilimsel ve etik ilkelere uyulduđu ve kulllanilan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduđu beyan edilir.

**Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:**

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

**Grant Support/Alikariya Darayî/Maddî Destek:**

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî jî bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## پۆخته

ئەحمەد موفتیزادە ئیک ژ زانا و کەسایەتیی گرنکین پۆژەلاتی کوردستانی بوو، پۆلەکی گرنک دیبائی پۆژنامەفانی، ئایینی، نەتەوایی و سیاسی هەبوو، ئەوی هەولدا بریکا پەياما ئایینی کوردان هشیار بکەت و حکومەتا ئیرانی پالەت دانپیدانی ب هەبوونا کوردان ل ئیرانی بکەت و مافین کوردان یین نەتەوایی دچوارچووئی ئایینیدا ب ئەوان بەت، دیسان هەولدان کورد ب شێوەیەکی ئیکگرتی داخوایین خۆ یین نەتەوایی پیشکیشی حکومەتا ئیرانی یا پشتی روخاندنا پۆژما شاھی بکەتن ژبەر هندی چەند کۆمبوون دگەل بەرپرس و سیاسیی کوردان گری دابوون. ئارمانجا سەرەکی ژ ئەقی فەکولینی دیارکنا کەسایەتیا ئەحمەد موفتیزادە، دیسان دیارکنا پۆلی ئەوی یی ئایینی، نەتەوایی، جفاکی و سیاسییە دناق پۆژەلاتی کوردستانی، ژبەرکو ئەوی دقوناغین ژيانا خۆدا کاریگەرییەکا باش ل سەر دەقەری هەبوو. ئەف فەکولینە دگەل نقیسینا خۆدا هەول دەت بەرسقا هەندەک پرسیاران مینا ئایا ئەحمەد موفتیزادە چ پۆلەکی ئایینی، پۆژنامەفانی و جفاکی ل پۆژەلاتی کوردستانی هەبوو؟ پەیوەندیین ئەوی دگەل دەورووبەران چاوا بوون؟ ئەوی چاوا بریکا گوتارین خۆ یین ئایینی و پۆژنامەیی شیا کاریگەری ل سەر خەلکی دەقەری بکەت؟ ئایە ئەوی پەیوەندی دگەل سەرکردە و سیاسەتمەدارین کوردین پۆژەلات هەبوون؟ پەیوەندیین ئەوی دگەل حکومەتا ئیرانی چەوابوون؟ بەت.

پەیفین سەرەکی: ئیران، پۆژەلاتی کوردستانی، ئایین، مکتەب قورئان، ئەحمەد موفتیزادە.

## Abstract

Ahmed Muftizade was one of the significant scholars and figures in Eastern Kurdistan. he played a key role through the press, religion, nationality, and politics. Additionally, he attempted through religious speeches to caution Kurds and pushed the Iranian government to recognize Kurds in Iran, likewise to give Kurds their national rights through spiritual means. He greatly attempted to unite Kurds and then gave their national demands to the Iranian government after the collapse of the Shah's regime. As a result, he had a meeting with Kurdish officials and politicians. The main objectives of this article are to show Ahmed Muftizade's personality and explore his religious, national, societal, and political role in Eastern Kurdistan, as in his life stages, he had a significant effect on the area. Within its writing, this research attempts to answer some related questions, such as what religion, journalist, and societal role Ahmed Muftizade had in Eastern Kurdistan? How were his relations with others? How did he affect people through his newspaper reports and religious speeches? Did he have relations with the Eastern Kurdistan leaders and politicians? How were his relations with the Iranian government?

**Keywords:** Iran, Eastern Kurdistan, religious, maktab Quran, Ahmed Muftizade.

## Özet

Ahmed Muftizade, Doğu Kürdistan'daki önemli alimlerden ve şahsiyetlerden biriydi. Basın, din, milliyet ve siyaset aracılığıyla önemli bir rol oynadı. Ayrıca, dini konuşmalarla Kürtleri uyarmaya çalıştı ve İran hükümetini İran'daki Kürtleri tanımaya ve aynı şekilde Kürtlere manevi yollarla ulusal haklarını vermeye zorladı. Şah rejiminin çöküşünden sonra Kürtleri birleştirmeye büyük çaba gösterdi ve ardından ulusal taleplerini İran hükümetine iletti. Sonuç olarak, Kürt yetkililer ve politikacılarla bir toplantı yaptı. Bu makalenin temel amaçları Ahmed Muftizade'nin kişiliğini göstermek ve Doğu Kürdistan'daki dini, ulusal, toplumsal ve politik rolünü araştırmaktır, çünkü yaşam evrelerinde bölge üzerinde önemli bir etkisi olmuştur. Bu araştırma, yazısında Ahmed Muftizade'nin Doğu Kürdistan'da hangi din, gazetecilik ve toplumsal rolü olduğu gibi bazı ilgili soruları yanıtlamaya çalışmaktadır. Başkalarıyla ilişkileri nasıldı? Gazete haberleri ve dini konuşmalarıyla insanları nasıl etkiledi? Doğu Kürdistan liderleri ve politikacılarıyla ilişkileri var mıydı? İran hükümetiyle ilişkileri nasıldı?

**Anahtar Sözcükler:** İran, Doğu Kürdistan, din, Kur'an mektebi, Ahmed Müftizade.

## پێشهکی

ئەحمەد موفتیزادە کەسایەتییەکی دەگمەن و ھێمایەکی ئایینی و نەتەوویی کورد بوو ل پۆژھەلاتا کوردستانی، کۆ دشیین بیژین بەشەکی زیدە یان ژێ ھەمی ژیا نا خۆ تەرخانکربوو، بۆ رزگاری و سەربلندیا گەل و نەتەو و مەزھەبی سوننە و خەمخوری ھەژاران و نەھیلانا سیستەمی چینیایەتی ل پۆژھەلاتا کوردستانی، ئەم دشیین بیژین باشتەری کەس بوویە کۆ ب شیوایی دادپەرورە سەرەدەری کری ژبەرکو ژلای تیوری و پراکتیکی ھەولین زیدە د بوارێ دادپەروری دا یین داین ژ وان ژێ دادپەروریا کومەلایەتی، ئابووری، سیاسی، فەرھەنگی، ئایینی، مەزھەبی و یا ژ ھەمیان گرنکتر دادپەروریا مروقیایەتی یە.

گرنگیا بابەتی د ئەوێ چەندیدایە ئەحمەد موفتیزادە ئیک ژ ئەوان کەسین دیار و بەرچاڤ بوویە ل پۆژھەلاتا کوردستانی و پۆلەکی دیار ھەبوویە د بزاقین ئایینی و کەمەلایەتی و سیاسی ل ئیرانی ب گشتی و ل پۆژھەلاتا کوردستانی ب تایبەتی، ئەحمەد موفتیزادە دامەزرێنەرێ مەکتەب قورئانا کۆ ب ئیک ژ بزاقین ئایینی و سیاسی ل پۆژھەلاتا کوردستانی دەیتە دانان، ھەرەسا ئەحمەد موفتیزادە ب ئیک ژ کەسایەتیین سیاسی دەیتە دانان، ژبەرکو پۆل ھەبوویە دبزاقین ئیسلاما سیاسی ل پۆژھەلاتا کوردستانی.

ئارمانج ژ دروستکرنا ئەقڵی فەکولینی و ھەلبژارتنا ئەقڵی بابەتی ئەو کۆ بشتین د ھندەک لاپەرەیاندا باسی ژیا نا ئەحمەد موفتیزادە و رولێ وی یی نەتەوویی و ئایینی ل رۆژھەلاتا کوردستانی، دیسان ئارمانجا سەرەکی یا ئەقڵی فەکولینی ئەو بڕیکەکا زانستی ھەولبەدە رولێ ئەحمەد موفتیزادە یی نەتەوویی و ئایینی ل رۆژھەلاتا کوردستانی خۆیا بکەت، چونکی گەلەک جارن ھاتیە دیارکرن ئەوی دچوارچۆوقەییەکی ئایینی دا بەریخۆدایە پرسی نەتەوویی کورد ل ئیرانی.

ئەڤ فەکولینە ل سەر دوو پشکان ھاتیە دابەشکرن و ھەر پشکەک ژ ئەوان ژێ ل سەر ھندەک تەوہرین دی ھاتیە دابەشکرن، پشکا ئیکی بو کورتییەکا میژووی لدۆر بنەمال و ژیاننامەیا ئەحمەد موفتیزادە ۱۹۳۳ – ۱۹۹۲ ھاتیە تەرخانکرن کۆ ئەڤ پشکە ل سەر سی تەوہران ھاتیە دابەشکرن، تەوہری ئیکی ئاماژێ ددەتە کورتییەکا میژووی لدۆر بنەمال و ژیاننامەیا ئەحمەد موفتیزادە، تەوہری دووی ئاماژێ ددەتە ھەولین ئەوی یین خواندنا مەدەنی و شەری، تەوہری سیی ئاماژێ ددەتە چالاکیین ئەوی یین رەوشەنبیری و رۆژنامەقانی. پشکا دووی بو رولێ ئەحمەد موفتیزادە یی ئایینی و نەتەوویی ل رۆژھەلاتا کوردستانی ھاتیە تەرخانکرن کۆ ئەڤ پشکە ژێ ل سەر سی تەوہران ھاتیە دابەشکرن. تەوہری ئیکی ئاماژێ ددەتە پۆلێ ئەحمەد موفتیزادە یی رەوشەنبیری و ئایینی دنابەر ۱۹۶۳ – ۱۹۷۷، تەوہری دووی ئاماژێ ددەتە پۆلێ ئەحمەد موفتیزادە د خویشاندانین سالا ۱۹۷۸ ل پۆژھەلاتا کوردستانی، تەوہری سیی ھاتیە تەرخانکرن بو پۆلێ ئەحمەد موفتیزادە ل ئەنجامدانا کونگرین شورایی شمس یین کوردستانی دا.

بیگۆمان ئەڤ فەکولینە یا بی کیماسی نەبوو ھەتا کۆ ب داوی ھاتی ب تایبەت نەبوونا پەرتووکیین پیدڤی و توژینین زانستی، کۆ تایبەت مەندبن ب شۆرەشا فەرەنساقە ب گشتی، و

بدهستنهكهفتن و پهیدانهبوونا پهرتووکین گرنگین تاییهت مه‌ندین ئەقی بابەتی دا ببه ئەگه‌ری ببها ئیخستنا بابەتی.

د ئەقی قەکولینی دا گەلەک ژێدەر ب زامنین جودا جودا هاتینه بکارهینان ژ پەرتوک و قەکولین و گوڤار و روژنامه و مالپەرین ئەنترنیتی ژبۆ مەرهما زەنگینکرا بابەتی ژ گرنگترین ئەقان ژێدەران مینا پەرتوکین (ئەحمەد موفتیزادە) ب ناڤونیشانین (دیوانی شیعی (دیاری بو یاران) و دەربارە ی کوردستانی باسی بەشەک ژ ژیان و رولی ئەحمەد موفتیزادە دکهت، هەر دیسان پەرتوکین (عومەر عەبدولعەزیزی) ب ناڤونیشانین (دەریایەک لە خوشەوێستی پوخته‌یه‌ک لە ژیاننامە ی کاک ئەحمەدی موفتیزادە و بیرەوهرییه‌کانم لە خزمەتیدا و خەباتی کورد و رەهەندی ئیسلامی کاریگەری ئیسلام لەسەر شورش و راپەرین و ریکخراوه سیاسیه کوردیه‌یه‌کان ۱۸۵۰ - ۱۹۵۰) باس ل ژیان ئەحمەد موفتیزادە و دامەزراندنا مەکتەب قورئان دکهن، هەر دیسان پەرتوکین (سەرۆت عەبدوللا) ب ناڤونیشانین (خەرمانیکی لە وتە زیرینه‌کانی کاک ئەحمەدی موفتیزادە، کاک ئەحمەدی موفتیزادە دەروازەیه‌ک بو ناساندنی کەسایەتی و خەباتی نەناسینراو، بونیادنانی خیزان و پەرۆدەکردنی تاک لە دیدی بیراری کورد ئەحمەد موفتیزادە و ئەحمەدی موفتیزادە - سەرکردەیه‌کی کاریزما و قوتابخانەیه‌کی کرداری)، باس ل ژیان و پۆلی ئەوی یی کومه‌لایەتی دکهن، هەرۆه‌سا گەلەک ژێدەرین دژی هاتینه بکارهینان کو بابەت ب تیر و تەسەلی ده‌یتە رونکردن و دیارکردن .

پێبازا دنفیسینا ئەقی قەکولینیدا هاتیه بکارهینان (پێبازا چەندایەتیا میژوویی) یه، لدویف ئەقی پێبازی دئ شین پۆلی ئەحمەد موفتیزادە یی نەتەوه‌یی و ئایینی ل پۆژهلەلات کوردستانی دیاربکەن و ئەق پێبازە ب شیوه‌یه‌کی زانستی هەلسەنگاندنا لایەن و مژارین گریدایی ئەقی بابەتیفە یین دژێدەراندنا هاتیه شروقه‌کرن و هزروبیرین زانایان لدۆر بوویه‌رین ئەوی ب شیوه‌یه‌کی بی لایەن هینه پروونکردن.

## 1. کورتیه‌یه‌کا میژووی لدۆر بنه‌مال و ژیاننامە یا ئەحمەد موفتیزادە ۱۹۳۳ - ۱۹۹۲

### 1.1. کورتیه‌یه‌کا میژووی لدۆر بنه‌مال و ژیاننامە یا ئەحمەد موفتیزادە

کاک ئەحمەد موفتیزادە، کورێ مەلا مەحمود موفتی، کورێ عەللامە مەلا عەبدوللا یی مەلا مەحمود دشه‌یه‌یه. کانونا دوویی ۱۹۳۳ زاینی ل باژیری سنه یی ژدایک بوی (Abdul Ezîz, 2017, r. 12).

بابی کاک ئەحمەد موفتیزادە (مەلا مەحمود) ئیک بو ژ کەسایەتیین ناقدار و بەرنیاسین باژیری (سنه) و ماوه‌یه‌کی درێژ حاکم شەرع و موفتیی ئەوی ده‌قەرئ بوو (Hakim, 2016, r. 6). مەلا محمود ل پشت ئیمانداریی و ئازایەتیدا کەسەکی خودان بریار و شیان بوو، ل ئەوی دەمیدا ل بلندترین ئاستی هەژاری و نەداری دا دژیت والیی سنه دیاریه‌کا تاییهت بو دهنیریت بەلی گومانی دکهت دبیت والی ل بەرامبەر ئەقی دیاری چاقرئ هندی بکهت بابی کاک ئەحمەد موفتیزادە بریاره‌کا نە شەرعی د بەرژوه‌ندیا ئەویدا، ژبەرهندي دیاری وەرناگرین و قەدگەرینیتەقە (Emînî, b.m, r. 19).

ماموستا مەلا عەبدوللا و اتا باپیری کاک ئەحمەد موفتیزادە خەلکی گوندی (دشه‌یه‌یه کو دکه‌قیتە نیزیکی (پاوه) ل ئەویری کوچ یا کری و یی هاتیه باژیری سنه و یی ئاکنجی بووی، ئەوی زەلامی سالتین خو یین فەقییاتیی ل پۆژهلەلات و باشووری کوردستانی یین برینه‌ سەر (Brawenson, 2017, r. 2).

، پاشی دبیته ئیک ژ زانایین نافدار و مهزن یین سهردهمی خو، هند زانایهکی ژ ههژی بوو بناقی (زانا دشهیی) نافودهنگ دبیت، و پشتی هینگی کاک ئهحمده ب هه مان شیوه نافودهنگ دبیت و ژلای عهلامی دبیته وانهبیژ ل مزگهفتا (جامعهی دارالاحسانی سنه) و موفتی کوردستانی- (Alama, 1387, r. 16-19).

باپیری کاک ئهحمدهی شهش کور هه بوو، هه می زانا و کهسایهتیین دیار و بناقودهنگین سهردهمی وهلاتی خو بوون، د هه می زانیاریین ئاییدا دهستهکی بلند و شارهزایهکا باش هه بوو ب تایبهتی د (فقه و ئوصل فقه و فلسفه)یدا، هیشتا زانا عهبدولای بابی ئهوی دژیانیدا بو، ببوو موفتی و حاکم شهرعی کوردستانی، و ههروهسا ئیک بو ژ ماموستاییین (فقهی شافعی) ل زانکویا (تههرانی) (Mufti Zade, 1386, r. 66).

کاک ئهحمده موفتیزاده دوو برا و خویشکهک هه بوو، هه ر چهنده براییین ئهوی زانایین ئایینی بهلی، مروفتین تیگههشتی و خودان ئیمان بوون، خودی ژ هه ر دوو براییین ئهوی رازیبیت (کاک عهبدولا و کاک هادی) ههردووکان پشتی کاک ئهحمدهی وهفات کر، خویشکا ئهوان (سعیده خانی موفتیزاده)یه، ههقژینی ئهوی (بابا مردوخ پۆحانی) بوو، (بابا مردوخ) ئیکه ژ کهسین خودان شیان د بواری شیعر و ئهدهبی ب ههرسی زمانین (کوردی، فارسی و عهرهبی) (Abdullah, 2014, r. 26).

کاک ئهحمده موفتیزاده هه ر د تههنی زاروکیینی دا، روژهکی مالا ئهوان داخوای ژ دکهن بچیه بازاری پیدقیین ئهوان بکریت، ده می دچیه ل دهرفه دبینیت (سهیهک) ژ برساندا یی کهفتی، د ئهوی ده میدا قهدهگهریتهقه مال و نانی بو دبهت و تیردکهت، پاشی دچیت بو کرینا تشتان، ل ئهوان سالیین دهستیپکا تههنی خودا پۆژانه دچیت بو هاریکاریا ئهو ژن و زهلامین پیر یین دخانی بهرامبهری مالا ئهواندا ل (سنه) و هاریکاری و کاروباریین ئهوان بریقه دبهت بیکو کهسهک بزانی، ئیک ژ تایبهتهندیین دی یین سهردهمی زاروکیینیا (کاک ئهحمده)ی ئهوه ژبلی هندئ ئهوی بخو خهونین تایبهت ددیتن، کهسین دوویر و نیزیکین ئهوی ژ ب هه مان شیوه خهون پیقه ددیتن و ههردهم (کاک ئهحمده)ی د خهواندا مهقام و پلهیهکا تایبهت هه بوو (Ezzatyar, 2016, r.45).

کهسایهتیا کاک احمدی هه ر ل دهستیپکا تههنی ئهوی یا رون و ئاشکهرا بوو و دیار بو مروقهکی ساده و ساکار نه بوو، دیسان کهسهکی ب لیهای و تایبهته ئهوه هه ر د تههنی زاروکیینیدا چهند جاران ل خهویدا ل خزمهتا پیغههمهری (سلاقیین خودی لیین) دا دبیت و دگهلا درینیهت خواری و وانان فیردکهت، دووماهی جار هه ر ئهوه خهونهیه دبیته دهروازهیهک بو روناها خودایی و بهرهف ئهوی قه دهیت (Abdullah, 2014, r. 29).

کاک ئهحمده موفتیزاده دماوهیی تههنی خودا دوو ههقژین هه بوون، ژنکا ئهوی یا ئیکی ناقی ئهوی (حهسیبه خانم) بوو، ل دهستیپکا لاوینیا ئهویدا هیشتا فقهی بوو و ل گهرمیا لیگهریانی و گهنجایهتیا خودا بو ل دویف زانستی. وهکی دیار دبیت هه ر ل دهستیپکی کاک ئهحمده دگهل ئهقی ژن ئینانی نه بوو و ب باشی نابیت د ئهوی بارودوخیدا و ئهوی مژویل ب خواندن و ژنی قه بینیت (Ezzatyar, 2016, r. 50)، بهلی ژبه رهندی (حهسیبا خانم) خواریا دهیکا کاک ئهحمدهی بوو، واتا دهیکا کاک ئهحمدهی و دهیکا خیزانا ئهوی خویشکین ئیک بوون، دهیکا ئهوی دچیهت خازگینیا و ددهنه کاک ئهحمدهی، بهلی گهلهک پیناچیت دهردکهفیت بو ئیک نابن پشتی ماوهیهکی ژ ئیک جودادبن،

ژبه‌ره‌ندی کاک ئه‌حمه‌د د ئه‌وی ده‌میدا ل عیراقی وانان دخوینیت و ئه‌فی دکه‌ته بهانه خیزان و خزمین خو تیدگه‌هینیت ئه‌فی ژن و می‌ردینیی چ مفا نینه و د ئه‌فی بارودوخیدا نه‌شیت خیزانی به‌خته‌وه‌ربکه‌ت و بریفه‌ببه‌ت (Mufti Zade, 1386, r. 95).

ژنکا ئه‌وی یا دووی نا‌فی ئه‌وی (خه‌دیجه) یه و کچا (حاجی رحمان ئاغایی موهته‌دی بوکانه)، خویشکا (عه‌بدولا و سه‌لاحه‌دینی موهته‌دا) ئه‌ف هه‌ردوو که‌سه کو دبنه خزمین کاک ئه‌حمه‌دی ئانکو براین هه‌ژینا ئه‌وی نه و کورین حاجی رحمان ئاغایی مه‌ته‌دایی بوکان (Abdullah, 2014, r. 60). پشتی کاک ئه‌حمه‌د دچیته ته‌هرانی ل زانکویا ته‌هرانی وانا دبیزیت و دگهل بنه‌مالا (موهته‌دی) تیکهل دبیت سه‌لاحه‌دینی موهته‌دی ده‌رباره‌ی رۆل و که‌سایه‌تیا کاک ئه‌حمه‌دی دبیزیت: "من ل ده‌مه‌کی دیت ده‌می ئه‌و هاتیه ته‌هرانی و جل و به‌رگین مه‌لاتیی لبه‌ردابوون، مه‌لایه‌کی گه‌نج و گه‌له‌ک رح سفک و خوین شرین بوو، هه‌تا بیژی یی بلند و ئاخفتن زان بوو و گه‌له‌ک دگهل بابی من ئاشنایی په‌یدا‌کر، به‌ری دگهل من ئاشنایی هه‌رچه‌نده ته‌مه‌نی ئه‌وی بو هندی بوو دگهل من ئاشنایی، به‌لی ب ئه‌گه‌ری هاتن و چوونا ئایینی گه‌له‌ک هاتنوچون بو ده‌ف بابی من دکر و دگهل بابی من ئاشنا ببوو، و گه‌له‌ک ژی دقیا .. ئه‌فی په‌یوه‌ندیا گه‌رم و گور و هکر زیده‌تر بچیته دلی بابی من دا، ئه‌وی بخۆ دگوت ب ماموستا و بابی خو دزانم و بابی من ژی ئه‌و گه‌له‌ک دقیا، هندی کورین خو خوش دقیا" (Ezzatyar, 2016, r. 45-60).

کاک احمد هه‌ژینا دووی دگهل (خه‌دیجه موهته‌دی) پیکدئینیت و ده‌یکا ئیکانه‌ی زوروکی کاک احمدی (حه‌مه ژیان) یه، ئه‌ف هه‌ژینا ئه‌وی ل سالا ۱۹۷۱ کوچادوایی دکه‌ت و پشتی هینگی هه‌ژینی پیکه‌ئینایه، و ل ئه‌وی ده‌میدا ته‌مه‌نی کاک ئه‌حمه‌دی ۳۸ سالی بوو (Abdul Ezîz, 2017, r. 14-15). ل ۱۹۸۲/۸/۲۹ (کاک ئه‌حمه‌د) ل مالا بابا مه‌ردوخ‌ی روحانی زه‌لامی خویشکا خۆ ل باژیری ته‌هرانی ده‌یته‌گرتن و پینج سالا ده‌یته‌حوکمرن، پشتی ته‌مامبونا حوکمی ئه‌وی بیی هه‌چ هۆکاره‌کی شه‌ری و یاسایی پینج سالی دی حوکمی ئه‌وی هاته‌دریژکرن و هه‌تا هه‌فت سالان نه‌هه‌لا (کاک ئه‌حمه‌د) به‌یته‌دیتن (Abdul Ezîz, 2017, r. 20).

زیده‌تر ژ ۱۰ سالان هاته‌زیندانی‌کرن پشتی ئه‌شکه‌نجه‌دانی و ئازاردانه‌کا گه‌له‌ک یا روحی و جه‌سته‌یی سالی خوی دوماهی ل زیندانی‌دژیا و له‌شی ئه‌وی گه‌له‌ک لاواز و بی هیز دبیت و توشی کومه‌ک نه‌خوشیان دبیت ژ ئه‌وان ژی شکه‌ستنا هه‌ستیی پشتا ملی ئه‌وی هه‌تا روژا مرنا خۆ ژی هه‌ر چینه‌ببوو و یا ژ هه‌میان ژی ب ژانتر توشی نه‌خوشیا شیرپه‌نجه‌ ئانکو (سرطان) بوو و ئازهرکا گه‌له‌ک زیده‌دکشا (Kak Şêx, 2010, r. 9). ل روژا ۱۹۹۲/۸/۱ پشتی ئه‌شکه‌نجه‌دانه‌کا زیده‌کاک ئه‌حمه‌د ل زیندانی هاته‌ئازادکرن، پشتی شه‌ش هه‌یفان ژ ئازادبوونی ل ۱۹۹۳/۲/۱۸ ل ته‌هرانی مالئافی ل دونیایی کر و ل مه‌راسیمه‌کا مه‌زندا ب ئاماده‌بونا هزارن که‌سان ژ قوتابی و دوست و هه‌ولاتیین کوردستانی ل باژیری سنه‌ده‌یته‌فه‌شارتن (Abdul Ezîz, 2017, r. 21).

دشیان دایه‌بیژین ئه‌حمه‌د موفتیزاده چه‌ندین به‌ره‌مه‌ین گرنگ ل پشت خو هیلایه‌منا (سیسته‌می ئیسلامی، حیکمه‌تین په‌رستنی .....هتدر) و تیدا هزروبیرین خۆ ل دۆر سیسته‌می حوکمرانی ل ئیرانی، دیسان بریکا په‌یامین خۆ ئامۆزگاری ل مروّقان کرینه‌لدویف بنه‌مایین قورئانی و سوننه‌تی سه‌رده‌ریی بکه‌ن و زاروکی خۆ لدویف ره‌وشت و بنه‌مایین ئیسلامی فی‌ر بکه‌ن دا بین خودان که‌سابه‌تین

بهێژ. دیسان چه‌ندین په‌رتووک لدۆر پرسی نه‌ته‌وه‌یی کورد و کوردستانی نغیسانه‌ مینا (ده‌رباره‌ی کوردستانی) تیدا ناڤبری باسی کوردستانی و سیاسه‌تا پژیما په‌هله‌وی به‌رامبه‌ری پرسی کوردی ل ئیرانی کریه.

## 1.2. هه‌ولین ئه‌حمه‌د موفیزاده‌ یێن خواندنا مه‌ده‌نی و شه‌رعی

زیره‌کی و بلیمه‌تی و تامه‌زرویا کاک ئه‌حمه‌دی بو خواندن و زانستی هه‌ر ل ده‌ستپێکا ته‌مه‌نی ئه‌وی دا ده‌ردکه‌فیت، ل ئه‌وی ده‌می ته‌مه‌نی ۱۳ سالیی ته‌مام نه‌کریوو، کاک ئه‌حمه‌د مروقه‌کی گه‌له‌ک زیره‌ک بوو و زیره‌ک یا ئه‌وی یا زنده‌ ناهیه‌ته‌ پیناسه‌کرن، زیره‌کیا ئه‌وی ب جوره‌کی بوو وه‌کی ئه‌و بخو دبێژیت: "گه‌له‌ک ژ په‌رتووکین خو هه‌تا دووماهیی من نه‌خواندبوو، به‌لکو من هنده‌ک ژێ دخواند ئه‌وا دی ب پشتبه‌ستن ب ئه‌وی پیشه‌کی ئه‌وا ل ده‌ستپێکی هه‌ی من دزانی کا ئه‌و په‌رتووک هه‌می به‌حسی چ دکه‌ت" (Abdullah, 2014, r.23).

ل ده‌ستپێکی ماوه‌یه‌کی ل ده‌ف مه‌لا مه‌حمودی بابی ئه‌وی و مه‌لا ئه‌حمه‌دی حه‌واری نه‌سه‌ب و مه‌لا محمادی ئه‌فشاری سالار دخواند، ئه‌ف ماموستایه‌ دبێژیت: "ب راستی ئه‌حمه‌د نابیه‌غه‌ و هه‌لکه‌وتبوو .... ل هه‌فت سالیی لده‌ف من دخواند ل ماوه‌یی دوو سالا زانستین کلیلا زمان و ئه‌ده‌بیاتین عه‌ره‌بی و عه‌بدولا یه‌زدی ل زانستین مه‌نتیقدا لده‌ف من یا خواندی" (Abdul Ezîz, 2017, r. 12-13).

ل ۱۲ سالییدا بۆ ماوه‌یی چه‌ند هه‌یفه‌کا دچیه‌ باژیری مه‌ریوانی، پاشی بۆ ماوه‌یی دوو سالا ل (۱۹۴۹ - ۱۹۵۱) دچیه‌ باشوری کوردستانی بوماوه‌یی هه‌یفه‌کی ل مزگه‌فتا (بن ته‌به‌ق) ل باژیری سلیمانیه‌ی لده‌ف ماموستا مه‌لا مسته‌فایی زه‌لمی یی خاندی، پاشی دچیه‌ گوندی عه‌بابه‌یلی و باژیری هه‌له‌بجه‌ و بیاره‌ و خانه‌قین، پاشی ل سالا (۱۹۵۱) ل باژیری ته‌ویلێ هه‌ورامان لده‌ف ماموستا مه‌لا محمه‌دی خورمال کوری ماموستا مه‌لا به‌های بیاره‌ دخوینیت، بۆ ماوه‌یه‌کی ژێ ل باژیری به‌یاره‌ یی هه‌ورامانی لده‌ف ماموستا مه‌لا که‌ریمی موده‌ریس په‌رتوکا (جمع‌ الجواع) ی ل زانستی (أصول‌ الفقه) دا دخوینیت. کاک ئه‌حمه‌د موفتیزاده‌ ل ئه‌وی ماوه‌یی ل باشوری کوردستانی خواندی، به‌لاڤه‌یه‌کا هه‌یفانه‌ یا فره‌هنگی، سیاسی، کومه‌لایه‌تی، ب خه‌تی خوه‌ یا نغیسی و دناڤ فه‌قیان و حوجه‌ و مزگه‌فتین گه‌له‌ک ژ ناڤچه‌یێن کوردستانی و به‌اریکاریا هه‌قالین ئه‌وی یا هاتیه‌ به‌لاڤه‌کرن (Abdul Ezîz, 2017, r. 13-14).

## 1.3. چالاکیی ئه‌وی یێن ره‌وشه‌نبیری و روژنامه‌فانیی

حاکم شه‌رع (دادوهری شه‌رعی) پوسته‌کی تایبه‌ته‌ ل وه‌لاتی (ئیرانی) ب هنده‌ک که‌سایه‌تیێن زانا و ناڤدارین ئایینی یێن ناڤچه‌یه‌کا تایبه‌ته‌ ده‌یه‌ته‌ دان ئه‌و زانایین ئه‌فی پوستی دده‌نی ده‌سته‌ه‌لاته‌کا تایبه‌ته‌ یا هه‌ی و کاری بو چاره‌سه‌رکنا بابه‌تین ئایینی و شه‌رعی و تاکه‌ که‌سی دکهن، وه‌کی بابه‌تین (نیکاح، ته‌لاق، میرات و ئیکلاکنا ناکوکییێن جو‌راوجو‌ر یێن د ناڤه‌را خه‌لکیدا) ئه‌قان جو‌ره‌ بابه‌تان په‌یوه‌ندی ب دادگه‌هی فه‌ نینه‌، هه‌ر که‌سه‌کی کیشه‌یه‌ک د ئیک ژ ئه‌قان بابه‌تاندا هه‌بیت و په‌یوه‌ندیی ب دادگه‌هی کرمان دا دادگه‌ه‌ راسته‌وخو ره‌وانه‌ی (حاکم شه‌رعی) دکه‌ت و دا ئه‌و چاره‌سه‌ریا ئه‌وی کیشی بکه‌ن (Abdullah, 2014, r. 77).

بابی کاک ئه‌حمه‌دی (ماموستا مه‌لا مه‌حمودی موفتی) هه‌م موفتی بوو و هه‌م حاکم شه‌رع بوو، پشتی کوچا دووماهیی یا بابی کاک ئه‌حمه‌دی ئه‌و و برایی ئه‌وی، حاجی ماموستا مه‌لا خالد موفتی

بهرپرسياره تيا كاري دگريته ستويي خو، ل سالا ۱۳۵۵ كوچي هه تاقي ژبهه كومهكا هوكاران دادوهري گشتي (حاكم شهرع) بجهدهيليت، بهلي هه تا دزيانيدا مابوو ههه موفتي ما بوو (Ezzatyar, 2016, r. 52). ل نهوي ده ميده كومك ژ كاربهه ستين دادگهه يين نيزيك (كاك نههمهه) دنيا سي و ل شيان و داهيتان و پيشنيار و حال رهوشه نيري ب تاييه تي ل بابه تين (كومه لايه تي، سياسي و خيزاني) چه ند يي شاره زايه و نهوان بخوژي گهلهك مفا ژ بابه تين نهوي وهرگرتبون، ژبلي هندي نهوان گهلهك دقييا لدويف پيشنيارا نهوان دا دادگهه برياردا (كاك نههمهه) وهك حاكم شهرع دامه زرينيت (Abdullah, 2014, r. 23).

پشتي موفتيزاده دچيته كرماشان ب نامه يا راسته وخو كاك نههمهه بخو نهف كهسه دببته حاكم شهرعي سنه، كو هه تا نهوي ده مي كاك نههمهه حاكم شهرع بوو و (حه سه ني نه ميني) ده فته را حاكم شهرعي د هه لاويست، پشتي كوچا موفتيزاده ل پايزا سالا (۱۳۵۸ كوچي هه تاقي) دا بو كرمانشاني، ب حوكمي ده مي گوتني و نفيسينا (كاك حه سه ن) ي و چه نديين ماموستايين دي يين ئايني ههه ماوه يه كي ئيك ژ نهوان ل جهي كاك نههمهه دبنه حاكم شهرع، ل بهروارا ۱۳۵۹/۱۱/۴ كوچي هه تاقي كاك نههمهه نامه يه كا تاييه ت بو وهزاره تا داد يا كوردستاني و نهركي حاكم شهرعي د سپيژيته كاك حه سه ني نه ميني (Mufti Zade, 1386, r.120).

## 2. پولي نههمهه موفتيزاده يي ئاييني و نه ته وه يي ل روژه لاتا كوردستاني

### 2.1. پولي نههمهه موفتيزاده يي رهوشه نيري و ئاييني دنابره ۱۹۶۳-۱۹۷۷

كاك نههمهه ل ده ستپيكا ده ست ب كار و چالاكيين خو ههه يي بتني بوو، د نه فني قوناغي دا بهري دامه زراندا مه كته ب قورئان كار يي بو ديني كري، واتا كاركرن بو نه ته وه يه كي مه حروم (Ezzatyar, 2016, r.53)، ههروه سا كاريي كري بو رزگاركرنا هه ژاران ل هه مي دونيايي دا، كاك نههمهه پشتي زيندانيكري كاردكهت و ده يته ل ناف كه ساند و شوره شا گوهوريني دروستدكهت، ژبه رهندي دشين بيژين فورمين كاك نههمهه موفتيزاده، كاك نههمهه ژ تاكان ده ستپيدكهت، بريكا پيگه هاندنا كه سان و كومه لگه هه كا ساخ و ساخلم ژلايي ئاييني و نه ته وه يي فه (Abdullah, 2014, r. 25).

نههمهه موفتيزاده گهلهك جاران د گوتارين خودا، كو خيلافهت پشتي ئيمام عه لي خيلافهت بيت، چونكي شورا يا ل نافبري، يان ژي هندهك تيگه هشتن يين ههين بو مه رجين نه نامين شورايي و دهسته لاتدارين حاكم كو بو دهسته لاتداريه ته كا مه زن يا وهكي سيسته مي شارستانيا ئيسلامي نه شيت (Xawarî, 2017, r. 9).

كاك نههمهه موفتيزاده گهلهك ههولين داين بو نه هيلانا چينا يه تيي دناف كومه لگه هيدا و گهلهك جاران گوتارين گوتين ده رباره ي ئيقيلابا فرهه نكي، ههروه سا كاك نههمهه موفتيزاده، ئاماژي بهندي دكهت كو د كومه لگه ها ئيسلامي دا دوو كاره سات يين ههين كو بشيم كومه لگه هه كا ساخلم هه بيت دقيت نهف دوو كاره ساته دناف كومه لگه ها ئيسلامي دا نه بن كاره ساتا مه عنه وه ي و كاره ساتا مادي

(Abdullah, 2014, r. 193)، ئەگەر د کۆمەڵگەهەکی دا ئەگەر چ کەس خۆ ژ کەسێن دی مەزنتەر نەدانن و ب گشتی وەکی خۆشک و برایا بن و هزر بکەن کۆ هەمی یێن د ئیک پلە و پوست دا، و دبێژیت بۆ چارسەریا چینیایەتییی د کۆمەڵگەهە دا بتنی سیستەمی ئیسلامی یە، د ئەقی سیستەمی دا تیگەهێ چینیایەتی نامینیت و ل ناف دبت، ئەگەر ل سیستەمین نە ئیسلامی دا هەر چینیایەتی یا هە (Ezzatyar, 2016, r. 80). دقیرە دشین هەدک ژ پەیف و هەولین ئەحمەد موفتیزادە یێن ئایینی و رەوشەنبیری دیاربکەین:

## 2.1.1. پەيامین ئەحمەد موفتیزادە یێن گرنگ

\* بەردەوام چاقەرئ یی بەرامبەری خۆ نەبە تشتەکی بۆتە بکەت، واتە چاقەرئ کیمترین پینگاف ژلای دۆستی خۆفە نەبە، ژبەرکۆ ئەگەر بچوکیترین چاکی لگەل تە یان هەر کەسەکی دی کر، پیدقییە ئەو و باشییا ئەوی دگەلتە مەزن بیت و ستایشا ئەوی بکە، دیسان دەرەمبەردا ب ئومید بە زۆرتین خیر و باشی لدەف تە بۆ دۆستی تە هەبن، ئەگەر کیمترین دەرەفەت بۆتە هاتە پیش کەمتەرەمی دئەقی چەندیدا نەکە، ئەگەر وەختەکی تە کیمترین دەرەفەت د رەفتار و سەرەدەریین خۆدا بەرامبەری دۆستی خۆ ژ دەست دا، هینگێ گازندەیان ژ خۆ بکەن و دشین ئەقی چەندئ لبر روناھیا ئەقی پەيامی رونتەر بکەین: "تو وەسا هزر دکەن دۆستەکی تە پیدقی هاریکاری و سەرمایی تەبە ب بەلاشی بۆ پیدقیین ژیان، دی تو ژ ی ب هەمی شیانین خۆ سەرمایی خۆ بی بەرامبەر ئیخییە دزەمتا ئەویدا، دبیت رۆژەکا وەسا بەهت تو ژ پیدقی هاریکاریین ئەوی بی ب (قەرز) بۆ پیدقیین ژیان، ئەو ژ ی ب هیچ شیوەیەکی نە ب بەلاشی و نە ب دیاری نادەت تە، لدەمەکی تو خودان هەلۆیستەکی مروقایەتی بووی، ئەو هەلۆیستە ئەوی پیدقی ب شەپزەبووی، سەرەدەرییەکا نەدروست و بریاردانا خەلەت ناکەت، چونکی ئەو دەمی ئەو دۆستی پیدقی ب هاریکاریا تە بوو، تو ب ئەرکی خۆ یی مروقایەتی یی رابوو و ئەو تو چاقەرئ تە بۆ کر، زۆرتین خیر، باشی و هاریکاری تە ل یی بەرامبەری خۆ کر و تە ب ئەقی کرپاری پەياما خۆ یا راستەقینە گەھاند، ئەقە لدەمەکیدایە لدەمی تو پیدقی ب هاریکاریا ئەوی، ئەوی وەفاداری و پەياما خۆ بۆتە نە سەلماندا" (Kak Şêx, 2010, r. 33-32).

\* ئەگەر دین ل مروقی وەرگریقە وەکی ئەوی یە کو غەریزی ل گیانەوهری وەرگری (Abdullah, 2014, r. 39).

دپەيامەکا دی یا گرنگ دا یا لژیر نافونیشانیین (نیاسینا دۆژمنی راستەقینەیی مروقی) موفتیزادە دیار دکەت مروقی بەردەوام بۆ شکاندن و تیکشکاندنا دەروون و کەسایەتیان روی ب روی و کەسایەتیین دەورووبەریین خۆ دبیت، ب هەمی هیژ و شیانین خۆ یێن ماددی و مەعنەوی بەرەقانیی ژ هەبوون و بی گونەھیا خۆ دکەت و بەھانە و بەلگەیان بۆ پاراستنا کەسایەتیا خۆ دەھینیت، ب هەمی هیژ و شیانین خۆ یێن ماددی و مەعنەوی هیژشی دکەین دۆژمنین دەورووبەریین خۆ و ب (هۆکار و کەسان) دزانین، دەرەمبەردا موفتیزادە ب شیوەیەکی هویر و پری روناھی لژیر سیبەرا پەياما خودی یا راستەقینە ئەقی چەندئ دیار دکەت (نەخیر) دۆژمنی راستەقینە و سەرسەختی مروقین ب ئەقی رەنگی (نەفس و شەیتان)، و پیدقییە لجهی هەر دۆژمنەکی بزیتین وەخت روی ب روی ئەقان هەر دوو دۆژمنین راستەقینە ببین و تا مرنی دچەپەری دژایەتیکرنا ئەوان دا بین- (Kak Şêx, 2010, r. 61-63).

\* ب گشتی بهروبومی ئیمانی پیکدهیت ل کارئ چاک. کارئ چاک بخو دناڤ تیگههئ ئیمانی دا نینه، ئیمان پیکدهیت ژ مهعریفهتی و جیهانگیریی، بهلی بهروبومی ئهوی یی بهرچاقه، مفایین دیارین ئیمانی دبیته کارئ چاک، ههر ژ بهر ئهفی ژی دگهل پهیفا ئیمانی دا کارئ چاک دهیته بکارئینان (Abdullah, 2012, r. 32).

لدور دانپیدانی ب خهلهتیان موفتیزاده دیار دکهت سروشتی مروڤان وهسایه هندی پله و پایهیین ئهوان یین دهروونی و کومهلایهتی بلندترین و سهختر دبیت دانپیدانی ب خهلهتی و سهردههریین خو یین نهگونجایی بیت و لهر چاف، دل و گوهرین خهلهکی ئهفی چهندی بیژیت: "ئهز خهلهت بوم و من نهعهقی یاکری، ئهو بهردهوام دچوارچوڤهیی پله و پایهیین خو یین ئاییندا هزردهکن و دیار دکهن ئهگهر دانپیدانی ب خهلهتی خو بکن لدور ئهوی چهندا مهکری یان گوتی دناڤ جفاکیدا، هینگی دئ بیته خالهکا رهش لسه سیمایی کهسایهتیا ئهوان یا ئایینی و پشتی هینگی ئهگهر راستیان ژی بیژین دئ ب چاڤی گومانی بهریخودهن مه، بهانهیین بهرپرس و سهرپهرشتین خهلهکی ژی دئ ئهفه بیت، کو ئهگهر مه دانپیدان ب ئهوان خهلهتیین مهکرین یان گوتین کر، هینگی دئ باوهرییا ریفهبرنی یا ددلی خهلهکیدا ژ دهست دهین، پشتی هینگی ههر ئهکهک و مافهکی بو دیار دکهن دئ نهرازیبونا خو دیار کهن و نهشین پوی ب پوی مهترسیا خهلهکی بین و ئیکریزبین بو لپرسینا خهلهکی و هزرا قوربانیدانی دل و گیانی ئهوان دا بچینن، بهرامبهری ئهفی چهندی ئهحمده موفتیزاده روی ب روی ئهقان ههمی هزاران بوویه سههرهپای هندی ههمی پله و پایهیین ئایینی کومهلایهتی، رهوشهنبیری و سیاسی ههبوون ب توندی رهخنه ل ئهفی خو سهپاندنا دهروونی مروڤی بوویه و ب نهخوشیهکا گوشنده یا مرنا دلی مروڤی زانییه (Kak Şêx, 2010, r. 64-65).

ئیسلام (ئینسان) دروستدکهت، نابیت ب زوری و شهری بکهت دگهل مروڤی، بهلکو ب دههکی، واتا ب لبن روناھیی دئ دروستکهت، کو وژدان و دهرونی مروڤی یه ئازادی سفرهیهک نینه هاتبیته دانان، و بیژن: وهره قوربان بخو (Abdullah, 2014, r. 30-35).

لدور تهساموح، لیڤوردن و گهردهنا ئازایا د دلا، موفتیزاده دیار دکهت مروڤ دناخ و سروشتی خودا چوار بهشن: مروڤی ههیی زویی توره دبیت و زویی ئاش دبیت، مروڤی ههیی دهرنگ توره دبیت و دهرنگ ئاش دبیت، مروڤی ههیی زیکا توره دبیت و دهرنگ ئاش دبیت و مروڤی ههیی دهرنگ توره دبیت و زیکا ئاش دبیت، موفتیزاده ئاموژگارییان ل مروڤی دکهت و دبیت هندی ژته بهیت کیم توره به، ئهگهر ب نهچاری ژی توره بووی ژ ئهوان به یین دهرنگ توره دبن و زوی ئاش دبن، چ جارن ژ ئهوان نهبه یین زوی توره دبن و دهرنگ ئاش دبیت، چونکی هزروبیرین ئهوان تارادهیهکی زور دلرهق و دهروون رهشن، بارانی پهحم و دلوقانیی کیلگهیا سنگی ئهوان تهر نهکرییه و زهنگا مهترسیی ئهو ژ خهو توندوتیژ هشیار نهکرییه. هندی بشی دگهل دهرووبهر و ههقالین خو باشبن، بریکین نهپم و سهردههریا باش دئ دل و دهروونی دۆستین خو خوشکهی، ئهگهر نهشی خوشقییاتی بدیی دهرووبهرین خو، دل و دهروونی ئهوان هنج هنج نهکه، کا چاوا دل رهق و کهربووکین ئاستهنگن دریکا گههشتنا تهدا بو پله و پایهیین بلند، لیڤورین ئهو تیگههئ کویری ئایینی یه نهشین ب شیوهیهکی ئاسان و بناخهیی ببین، لدهمهکیدا نهبیت دشین ئهفی چهندی دسهردههریا یین دهرووبهرین خودا ببینن (Kak Şêx, 2010, r. 67-68).

دشین لیۆۆرینی ب ئەفی رهنگی پێناسه بکهین، لیۆۆرین دیوارکرن و بنپیکرنا مافهکی یان کۆمهلهک مافین مادی و مهعههوی یین کهسهکی یان گرووپهکی مرۆفان یی دیارکریه ب شیوهیهکی ئەنقهست ژلای کهسهکی یان گرووپهکی مرۆفین سنۆر بهزینقه هاتیه پيشلکرن، پشتی هینگى ئەو کهس یان ئەو گرووپى ماف خواران، پادبن دهست ب لیۆۆرین و چاقتانندن و دهستبهردارى مافین خۆ یین مادی و مهعههوی ب شیوهیهکی لیۆۆردن دن و دهستی رهمی دهخشیت لسهر ئەوان یین مافین ئەوان پیشلکرن و ب ئەفی چهندی دهست بهردان ژ مافین خۆ و رهم برن ب ئەوان یی مافین ئەوان هاتیه پیشلکرن ب لیۆۆردن دهینه نیاسین (Kak Şêx, 2010, r. 67-68).

## 2.1.2. دامهزاندنا مهکتەب قورئان

مهکتەب قورئان ئەو ریکخستنا ئایینی یه کو یا رهین ئەوی لسهر دهستی ئەحمەد موفتیزاده ل سالا 1977 دناف گهرماتیا شۆرهشا گهلین ئیرانیدا هاتینه دروستکرن (Mofidi, 2015, r. 83)، وهکی سهرحهم ریکخستن و ریکخراوین مهزههبی یین دی ب رهوانگهیا پهروهدهیی دروست بوو و خۆ وهکی رهوتهکا فکری و ئایینی دانیا سین. موفتیزاده پشتی چهند سالا ل گوتنا وانهیین ئایینی، ل بن کاریگهريا هندک رهوشهنبیرین ئایینی ل فارس و عهرهبا، چوارچووهیی خۆ گوهوری بۆ پیکهاتهیهکا ئایینی و سیاسی و ل سالا 1977 ل ماریوانی مهکتەبا قورئانی ب مههما پهروهدهکرنا گهناجان دامهزاند، کۆ ل دهستپیککی نافی ئەوی مهدرهسا قورئانی بوو (Mukrî, 2019, r. 143).

ل سالا 1978 مکتەب قورئانا سنه دهیته دروستکرن و ئارمانجا ئەوی یا سهرهکی فیکرن و پهروهدهیهکا ئایینی و نهتهوهیی یا دروستبوو (Mofidi, 2019, r. 82-83). پشتهفانین مهکتەب قورئان ههلدا گرنگی ب پهروهدهیا ئایینی ل سهرا نسهری کوردستانی بدهن، ل دهستپیکا پودانین شۆرهشا گهلین ئیرانی قوتابی و پشتهفانین ئەفی مهکتەبی ب شیوهیهکی ئایینی تیکهلی چالاکیین سیاسی بوون و دهست ب چالاکیان ب دژی رژیما شاهی کرن، ب ئەفی چهندی هیدی هیدی مهکتەب قورئان شیوازهکی ئایینی و سیاسی بخۆفه گریدا. (Berhevoka Nivîskaran, 2016, r. 120-121).

دگل هندی دا موفتیزاده ئاگههداری بوچوون و کاریگهریین سهید قوتب بوو، بهلی رهوتا ئەوی وهکی ئیخوانی نهبوو بهلکو ب تهمامی یا جیاواز بوو، پرسا کوردستانی ئیک ژ ئەوان بناخهیین ل هزا ئەوی دا دهاته دیتن، بهلی پرسهیا نهتهوهیی ل ناف ئیسلاما سیاسی دا یا فهشارتی. دهمی موفتیزاده ریکخستنا مهکتەب قورئان دامهزاندی، ب ئەگهری ههبوونا پارت و ریههین سیاسی و ئایینی یا ئەوی دهمی ل پۆژههلاتا کوردستانی، کۆ پیکههی کومهلایهتی و جهماوهری یی بهیز ههبوو، نه دشییا ب ساناھی و بی پالپشتی دهربهکفیت-59 (Khosravi, Aghapouri & Hamehморad, 2016, r. 73) ههر ژبه رهندي ل دهستپیکا شورهشو گهلانی یا ئیرانی ب شیوهیهکی ئاشکرا پشتهفانی ل کۆمارا ئیسلامی کر و ب ئەفی ریکی خۆ و مهکتەبا قورئانی ئینا ل ناف کاری سیاسی یی پۆژههلاتا کوردستانی و ئیرانی. ل دهستپیککی ئارمانجا مهکتەب قورئان پهروهده و پیکههاندنا کهسین کومهلگههی بوو، بهلی لدويفدا ل چوارچووهیی هزا نوخوازا ئایینی، کۆ پهيوهنديا سیاسهتی و ئایینی ب پیدفی زانی و ههلدا سیاسهت و ئایین وهکی دوو پهیرین تهمامکه رین ئیک نیشانبههه و ب ریکا زانستی سهردهم ئایینی نویکه نهفه، ب ئەفی شیوهی ریکخراوا خۆ کره ریکخراوهکا سیاسی (Kerîm & Haşmend, 2022, r. 101).

مه‌کته‌ب قورئان ب سه‌رۆکاتیا ئه‌حمه‌د موفتیزاده ب شیوه‌یه‌کی تۆند دژایه‌تیا ه‌زروبیرین چه‌پ‌ه‌وین کورد دکر و دیاردکر ه‌زروبیرین چه‌پ‌ه‌وین کورد دگهل جفاکی کوردستانی ناگونجن و پیدقییه‌ ل‌دویف بنه‌ماین که‌لتووری و ئایینی داخوازا مافین خۆ ژ ده‌سته‌لاتا نوی یا ئیرانی بکه‌ین (Mofidi, 2019, r. 88–89). ئه‌ف بو‌چوونین موفتیزاده ل بن کاریگه‌ریا چه‌ند لایه‌نه‌کاندا بوون ئه‌فه ژبلی هندئ کۆ باوه‌ریا ته‌مام ب فه‌گه‌ریانی بۆ ده‌سته‌پیکین ئیسلامی و ئیسلاما خه‌لیفه‌ خوازی یا پشتی پیغه‌مبه‌ری (س. خ) هه‌بوو، کۆ به‌حس ل شوری دکه‌ت، ژبه‌ره‌ندئ داکوکی ژ ئه‌فی ئیسلامی دکر. هه‌روه‌سا لبن کاریگه‌ریا ه‌زومه‌ندین وه‌کی ره‌شید ره‌زا دانا بوو، کۆ دقییا ده‌سته‌لاته‌کا سه‌رده‌میانه‌ یا ئیسلامی ب دامه‌زرینیت، ژبلی ل پاراستنا به‌ایین دینی و فورمه‌کا سیاسی دای، ل لایه‌کی دژی هه‌ر چه‌نده‌ موفتیزاده که‌سایه‌تیه‌کی خودان ه‌ز و بو‌چوونین خۆ بوو لسه‌ر ئیسلاما سیاسی، به‌لی کاریگه‌ریا عه‌لی شه‌ریعه‌تی شیعه‌ مه‌زه‌ب یا لسه‌ر دیاره‌ (Mukrî, 2019, r. 143).

ل‌قیره‌دا ده‌ردکه‌فیت کۆ ئه‌حمه‌د موفتیزاده بیروبو‌چوونین ئه‌وی لسه‌ر ئیسلاما سیاسی، هه‌م دیدا ئیسلاما سیاسی یا عه‌ره‌بی و هه‌م ئیسلاما سیاسیا شیعی یا ئیرانی پیغه‌ یا دیاربوو و زیده‌تر دقییا ئیسلاما سیاسی ل چوارچووه‌یی ئیسلاما سوسیالیستی بده‌نه‌ نیاسین، ئه‌فه تاییه‌ته‌ندیا ئیسلاما سیاسی یا ئیرانی یه، چونکی هه‌می ره‌وتین ئیسلاما سیاسی مه‌لین و چه‌ین د ئیرانی دا و بین لبن کاریگه‌ریا ماکسیزم دانه، کۆ هه‌م شه‌ریعه‌تی و هه‌م سوسیالیستین موجه‌ید ژی بخو‌فه‌دگريت، ژبه‌ره‌ندئ پشتی ده‌رکه‌فتنا مه‌کته‌ب قورئان وه‌کی حیزبه‌کا ئایینی یا سیاسی و داخوازه‌را مافان ده‌یته‌دانان، کۆ داخوازا هه‌می مافان دکه‌ت ژبلی مافی مه‌زه‌به‌ی (Kerîm, 2023, r. 102).

هه‌می ئه‌ف بیر و بو‌چوونین مه‌کته‌با قورئانی، کۆ ل ئه‌وی ده‌می نا‌فی ئه‌وی هه‌ر مه‌ده‌سه‌یا قورئان بوو، وه‌کر ل قوناغا شوره‌شا ۱۹۷۹ هانا گروپین سننه‌ بده‌ت کۆ پشته‌قانی شوره‌شا گهلین ئیرانی، موفتیزاده مه‌ده‌سه‌یا قورئانی ب هه‌می شیانین خو‌فه‌ هاریکاریا خومه‌نیان دکر (Muffî Zade, 1359, r. 79). سه‌ره‌رای پشته‌قانیکرنا شوره‌شی، به‌لی هه‌ول ددا بۆ بده‌سته‌ئینانا مافین گه‌لی کورد ب شیوه‌یی خودموختاری ل چوارچووه‌یی ئیرانه‌کا دیموکراتدا (Mahmoud, 2012, r. 64).

پشتی فه‌گه‌ریانا خومه‌ینی بۆ ئیرانی، ئه‌حمه‌د موفتیزاده پشتی بورینا هه‌فته‌یه‌کی سه‌ره‌دانا باژیری ته‌هرانی دکه‌ت و چا‌فی ئه‌وی ب خومه‌ینی دکه‌فیت، ئه‌حمه‌د موفتیزاده پیچه‌وانه‌ی حیزب دین یین کوردستانی، ده‌رباره‌ی کارکرانی دگهل رژیما نوی یی گه‌شبین بوو، و ئه‌فه بو ئه‌گه‌ری زیده‌تر توره‌کرنا لایه‌نی چه‌پ ل پۆژه‌لاتا کوردستانی ده‌رباره‌ی ئه‌حمه‌د موفتیزاده (Izzatfar, 2719, r. 353). توره‌یا ئه‌فان لایه‌نین کوردستانی یین بزاقا چه‌پ بو ئه‌حمه‌د موفتیزاده کیم نه‌دبوو ژ به‌رکۆ راسته‌خو دژی ئارمانجین ئه‌فان بزاقان بوو و ب دژی ئیسلامی ددانان (Kerîm, 2023, r. 103). خومه‌ینی ل پۆژا ۱۹۷۹ / ۳ / ۳۰ وه‌کی پۆژا ریفرا‌ندومی ل ئیرانی دیارکر، کۆ ئه‌فی ریفرا‌ندومی بتنی ئیک هه‌لب‌زارتن هه‌بوو، ئه‌وژی دقیت رازیین ب کۆمارا ئیسلامی یا ئیرانی یان نه، ئه‌فی بۆ ئه‌گه‌ری هندئ کۆ لایه‌نین دی یین پۆژه‌لاتا کوردستانی دژی ئه‌فی چه‌ندئ بن (Serdeştî, 2002, r. 559). به‌لی لایه‌نگیرین مه‌کته‌ب قورئان ل باژیری کوردستانی ب ربه‌ریا ئه‌حمه‌د موفتیزاده به‌شداریکر ل ریفرا‌ندومی ده‌نگ ب کۆمارا ئیسلامیا ئیرانی دا (Kerîm, 2023, r. 104–105).

### 2.1.3. ه‌زروبیرین ئه‌حمه‌دی موفتیزاده ل‌دۆر دروستکرنا حکومه‌ته‌کا ئیسلامی

#### 2.1.4. بۆچۈۋىتىن ئەحمەد مۇفتىزادە لدۆر ھىزا پىشما رگەيچ مۇسلمان

پشتی کونترولکرنا دەرچوونا ئاسایشا باژیرین کوردی و ب تایبەتی باژیرین سنە، ئەحمەد موفتیزادە ب فەرمی داخوای دکتە هەندەک پیتقیین سەربازی بدەنە لایەنگریا ئەوان بو هندی کو بشین ل بن چاقدیری راستەوخوایا ئەوان دا کار بو فەگەراندنا ئاسایشی بو باژیرین سنە و مەریوانی بکەن و د هەمان دەم دا کارەک بەیتەکرن کو چەک ب ساناهی نەگەهیتە دەستی هەر کەسەکی و ژلای پوولیس و ئاسایشی فە بەیتە کونترولکر (Cabi, 2019, r. 1-12).

بەلێ دەمی کو ئەف پیتشمەرگەهین موسلمان دەرەکەف راستەوخو پیتقیین سەربازی ددەنە ئەوان و بەرەفدکەن بۆ شەری، هەر ئەفەژی دبیته ئەگەری هندی کو ئەحمەد موفتیزادە ب هەولەکا مەترسیدار بزانیته بۆ سەر ئاسایش و ئارامیا هەولایتین کورد، ئەحمەد موفتیزادە دەستدەکتە ب ریگریکرنی ل دژی ئەفی هیزی (Abdullah, 2022, r. 39).

هەرەسا دەستەلاتی دقیا کو نافین کوردان توماربکەن د ئەفی هیزی دا، بو ئەفی مەبەستی ژێ خەلک هاندان، ئەحمەد موفتیزادە هەولەکان بو ریگریکرنی ل دروستبوونا ئەفی هیزی هەتا وی رادە کو پەیوەندی دکتە ب دەستەلاتداران ل تەهرانی کو ئەف هیژە دروست نەبیت ژبەرکو ب هزرا ئەوی ئەف هیژە مەترسیە بۆ نافخو، هەرەسا هەولەکا دگەل ئەوان گەنجان و کەسان بناخفیت یین کو پەیوەندی دکتە ب ئەفی هیزی کو پەشیمان بکەن ل بەشداریکرن ئەوان د ئەفی هیزی دا، هەرەسا دگەل سەرکردەیین کورد ژێ د روینشتە خاری و مەترسیا ئەفی هیزی بو ئەوان شروقه دکر. هەرەسا دگەل کەسین بەرپرس و دەستەلاتدارین ئیرانی دناخت و ئاگەهداریا مەترسیا ئەفی هیزی یا گەهانیدە ئەوان، پشتی کو بو ئەوی روون و ئاشکرا دبیت کو چ ژ ئەفان نەشین هاریکاریا ئەوی بکەن و ریگریکرن ل دروستبوونا ئەفی هیژا پیتشمەرگەیی موسلمان رادبیت ب ئاگەهدارکا ملەتی دەربارە مەترسی و هەولین ئەفی هیزی ئەفی هیزی (Abdullah, 2022, r. 39).

## 2.2. پۆلی ئەحمەد موفتیزادە د خوپیشاندانین سالا ۱۹۷۸ ل پۆژەهەلاتا کوردستانی

سیاسەتا نە دروستا شاهی ل ئیرانی جیاوازیەکا زیدە ل ئیرانی دا دروستکر و ئیران ئیخستەنە ل بەرتەنگیەکا کویرا سیاسی و کومەلایەتی و ئابوری و فەرەهنگی و ل پتیریا باژیر و گوندین کوردستانی جادە نەبوون و کارەبا و خویندنگە و دکتور و بنگەهین تەندروستی هەتا وی رادە ئاقا فەخوارنی ژێ نەبوو (Gawharî, 2011, r. 13). شیعیەیین ئیرانی ب فەرمانا ریبهری خۆ ل روژا ۱۹۷۸/۱/۸ ب کومەل خۆ گەهانە باژیر قووم دەمی کاربەدەستین ساواک ب ئەفی چەندی زانی ژمارەیهکا زیدەیا چەکاران ل قووم کومکرن بو هندی کو کونترولبکەن (Abdullah, 2022, r. 40). تریشکا راپەڕینی ل باژیر قووم سەرەلدا و لدویدا ل روژانین ۱۱ - ۱۲/ ۱/ ۱۹۷۸ ل باژیرین تەهران و مەشەد و شیرازی گرتن، ل مهاباد و باژیرین دی یین کوردستانی و ئازەربایجانی ژبلی تەوری بەژداری ل خوپیشاندانادا نەدکر ژبەرکو چ ریخکراو نەبوون کو ئەو خەلکی خەباتگیر کومبکەت. ل مهابادی کەسایەتیین دیموکراتخواز و لاوان بوچوونین خۆ ل گروپین بچویدا دژی ریژمی بەیاننامە دقیسین و ب شەف بەلاقدکر (Gawharî, 2011, r. 16-19).

موفتیزادە ل سەر بیروباوەڕین نەتەوهیی هاتبوو گرتن، پشتی ئازادبوونی دەست ژ هزیرین نەتەوهیی و ناسیونالیستی بەردا و چوو دناف چالاکیین ئیسلامی دا و هیدی هیدی و سالین نیزیکی شورەشا

گهلین ئیرانی چالاکیین خۆ زیدهتر لیکرن و یی مژوولی ریکخستنا که سین وهکی خۆ بوو ژلایی هزرانقه، دگهل ئهوان که سان ژى په یوهندی دکر یین کول باشورئ کوردستانی قهدهگریان و ئهوین هه لگرین په یاما سیاسی یا ئیسلامی (Elias, 2020, r. 153). ئەف لقینه هه ر چهنده د لاواز و ب شیوهیی نههینی بوون، بهلی ب ئەفی جوری هه تا شورهشا گهلین ئیرانی چوونه پیشفه (Abdul Ezîz, 2017, r. 276). ل دوماهیکا ۱۹۷۷ و ل دهستیپکا ۱۹۷۸ ههولدا ل رویدانین کوردستانی و قوناغین شورهشی رولی هه بوونا خۆ هه بیت، ژبه رهندي ل باژیری مه ریان و سنه و دهووبه رین ئهوان لایه نگرین خو کومکر و ریکخراوا مه کته ب قورئان دامه زران د کو ئیکه مین ریکخراوا ئیسلامیه ل چوارچیوهیی ئیسلاما سیاسی ل پۆژه لاتا کوردستانی دهستیکاربوو، ئەفی ریکخراوی و کاک ئەحمه دی رولهکی دیار هه بوو د به لاقرنا په یاماندا و پشتیگیریکرنا شورهشی (Subhani, 1997, r. 3).

### 2.3. رۆلی ئەحمەد موفتیزادە ل ئەنجامدانا کونگرین شورایی شمس یین کوردستانی دا

پشتی ئەوی کۆ کاک ئەحمەد موفتیزادە ل زیدی خۆ سنه دگهل هه قالین خۆ کوچ دکته بو کرمانشانی، وهکی دهیته گوتن کۆ ب تهامی نیاز و مه رمین حکومه تی بۆ روون دبیت روژ بۆ روژی دهسته لاتا ئیرانی ل په یمان و سوزین خۆ پیشه مان دبیت ئەوین ب مله تی کورد و خه لکی سوننه داین، ژلایه کی دی ژى قه مژوولی کومکرنا کومه ک ژ مه لا و که سین سوننه یین سه ربه خۆ ب ناڤونیشانین نوینه رین سوننه فریکه نه په رله مانی، کاک ئەحمه دی گوهلیبوو کو حکومه ت یا مژیه ل دهقه رین جیاواز کومه ک ژ که سان بناڤی شورایه ک کۆ بۆ خه لکی سوننه دی دروستکته، ژبه رهندي ده می کاک ئەحمه دی ئەفه زانی ب زیره کانه هزر ل دروستکرنا شورایه کا هه لپژارت بو خه لکی سوننه کر. دروستکرنا شورایا (شه مس) ئیک ژ هه ولین دیه یین موفتیزادە بو ئیک دهنگرنا داخوایین مله تی کورد ب تایبه تی و خه لکی سوننه ب گشتی (Abdullah, 2014, r. 111).

#### 2.3.1. کونگرئ ئیکی یی شورایا مه رکه زی (شمس)

ل بهارا سالا 1981 ل کرماشان گه له ک جارا هه قالین کاک ئەحمه دی لدهف کومدبوون، سه ره رای ئەو گرفتین جوراوجورین ئیرانی و ئالوزین که شوه وهای سیاسی و پاراستنا کوردستانی، گه له ک جارا دهاته گوهلیبوون حکومه تا ئیرانی د ئەوی هزریدایه ژماره یه کا که سین پشته قانیا شوره شی و دهسته لاتئ کۆ شوره یه کی دروستیکته و ئهوان ب نوینه رین خه لکی بهینه نیاسین (Jong & Ebrahimzadeh, 2024, r. 9-10). ژبه رهندي کاک ئەحمەد ل هه یفا ئادارا سالا ۱۹۸۱ دگهل دهووبه رین خۆ و ژماره یه ک ژ که سایه تیین دهقه رین دی یین ئیرانی، که فتنه د راویژ و گوهوړی نا هزروبیان، بو گریدانا کونگره یه کی بو خه لکی سوننه یی ئیرانی، بو هه لپژارتنا شوره یه کا شه رعی ل زانا و که سایه تیین خه لکی سوننه و گوتنا وان نه حقی و ئەو سته مین هه ر ل سه رده می شاه ی ئیرانی دژی کوردا ب تایبه تی و خه لکی سوننه ب گشتی ها تنه کرن (Abdul Ezîz, 2017, r. 28).

بۆ ئەفی مه به سستی ژى کاک ئەحمه دی په یوهندی کر ب که سایه تیین ناقدارین خه لکی سوننه، وهکی (مه وله وی عبدالعزیز ل به لوجستانی، مه وله وی عبدالحمید ل زاهدانی، مه وله وی الله یاری ل بیرجه ندی و مه وله وی سه یدفازل ل مه شه دی)، و ژماره یه کا دی یا زۆر ل زانا و بانگخوازین خه لکی سوننه. سه رئه نجام پشتی راویژ و گوهوړی نا هزروبیان ل روژین ۱ - ۳ / ۴ / ۱۹۸۱ ل باژیری ته هرائی، کونگره یه ک گریدا، و به ندبوو لسه ر کاک ئەحمه دی موفتیزادە (Abdul Ezîz, 2017, r. 29).

### 2.3.2 کونگرئ دووئ یئ شورا یا مه رکه زی (شمس)

پشتی سالهک و چوار هه یفان ژ کونگره یئ ئیکی کونگرئ دووئ یئ (شمس) ل مالا کاک ئه حمه د بخۆ ل باژیرئ کرمانشانی، ل که شوه وه وایه کی گه لهک نه ساز و ئالوزئ سیاسی و پاراستنی دا ل روژا ۵ و ۶ / ۸ / ۱۹۸۲ زاینی هاته سازکر (Ezzatyar, 2016, r. 80). بهرپرستین حکومه تا ئیرانی گه لهک دژی گریدانا کونگره ی بوون، ژ بهرهندي پاریزگاری کرمانشانی و بهرپرستین پاراستنی یئ باژیرئ، کاک ئه حمه د ئاگه هدارکر کو بریارا گریدانا کونگره ی ب هه لوه شینیت، و بهرپرستین وه لاتی ب هه یچ شیوه یه کی ریکی ناده ن ئه و کونگره یه به یته گریدان. کاک ئه حمه د و ب ئاماده بوونا نوینه رین سونه یان کونگره هاته گریدان. ل روژا دووئ یا کونگره دوو که س ژ هه قالین کاک ئه حمه دی هاتنه ده ستگیرکر و سی روژا پشتی کونگره ی ۱۰ که س ل باژیرئ کامیران هاتنه گرتن و پشتی هه فته یه کی ل باژیرئ سنه ۳۰ که س هاتنه گرتن و پشتی پینچ هه یفان ژ کونگره ی کاک ئه حمه د و هه قاله کی خو بناقی ئه مینی ئه کبه ری ل ته ه رانی هاتنه گرتن (Abdul Ezîz, 2017, r. 40-42).

ئه حمه د موفتیزاده ی رۆله کی گرنگ یئ ره وه شه نبیری، ئایینی و سیاسی ل رۆژه لاتی کوردستانی هه بوو، ئه و ی هه ولدا خه لکی کوردستانی ل سه ر بنه ماین ئایینی ئیسلامی پهروه رده بکه ت داکو میله تی کورد لدو یف بنه ماین راسته قینه یئ ئیسلامی شاره زابن و دهسته لاتین ئیرانی ب ریکا ئایینی ئه وان نه خاپینیت، چونکی ئه و باش دسروشتی دهسته لاتدارین ئیرانی گه شتیوو، له ورا ئه و ی هه ولدا بریکا گو تار و چالاکیین خو کوردان هشیار بکه ت، دیسان ئه و ی باش دزانی دهسته لاتدارین ئیرانی ب هه یچ رهنگه کی ب چ دوریشمین سیاسی یئ دویژ ژ ئایدو لۆژیا ئه وان رازی نابیت، له ورا ئه و ی هه ولدا بریکا سیسته می ئیسلامی داخو ازا مافین نه ته وه یی کورد پیشکیشتی حکومه تا ئیرانی بکه ت و بو ئیکگرتنا په یامین کوردان ئه و ی هه ولدا چه ندین کومبوونان دگه ل سیاسه ته دارین کورد ئه نجام بده ت و بو دیار بکه ت پیدقییه دچوارچووه یی بنه ماین ئیسلامی داخو ازا مافین خو یئ نه ته وه یی ژ تاران بکه ی، ژ بهرکو دهسته لاتدارین ئیرانی باوه ری ب چ سیسته مین دی یئ دهسته لاتنی نینه.

#### ده رنه نجام

ئه حمه د موفتیزاده ئیک ژ که سایه تیئ بهرچا قین ئایینی و کومه لایه تی و سیاسی ل رۆژه لاتا کوردستانی بوویه، ژ یانا خو هه مییدا خو بو پرسا نه ته وه یی کورد و چاره سه رکرنا مه زه به ی ل ئیرانی کرییه و بو دهسته لاتا ئیرانی دیار دکر پیدقییه لدو یف بنه ماین ئایینی ئیسلامی نهک مه زه به ی شیعی سه ره ده ره یی دگه ل پرسا کوردی.

ئه حمه د موفتیزاده د بواری ئایینی دا ل رۆژه لاتا کوردستانی رۆله کی بهرچا ف هه بوویه ژ بهرکو ب ئیک ژ ماموستایین ئایینی ده یته دانان، و دشیین بیژین ئیک ژ ئه وان که سان بوویه پهروه رده یه کا ئایینی یا دروست نیشا خه لکی بده ت و په یامین خو یئ ئایینیدا داکوکی له سه ر هندي دکر پیدقییه کیشه یئ ئایینی لدو یف بنه ماین سونه ت و قورئانی به یته چاره سه رکر.

ئەگەر ژلایێ کومەلایەتی تەماشە ی ئەحمەد موفتیزادە بکەن، دێ بینین ل ئێرانی ب گشتی و پۆژەهەلاتا کوردستانی تایبەتی چەندین چالاکیێن جوراوجور ئەنجام دایە و د ئەفی بواری دا شیاوە خزمەتەکا بەرچاڤ پیشکەشی بکەت و بەردەوام پرانی خەلکی ریز لیدگرت و بەردەوام پشەقانی خەلکی دکر و ب خەمخوری خەلکی دەیتە دانان.

ل دەستپیکا پشەهاتین روودانا شۆرەشا ئیسلامی ل سالا 1978 ل پۆژەهەلاتا کوردستانی ئەحمەد موفتیزادە خو نیزیکی ئەوان کەسان دکر یێن بیروبوچوونین ئەوان نیزیکی یێن ئەوان، هەرەسا دگەل ئەوان کەسان ژێ پەیوەندی دکرن ئەوین ل باشوری کوردستانی قەدگەریانە پۆژەهەلاتا کوردستانی ئەوین خودانین هەلگرتن پەیا ما سیاسی یا ئیسلامی و لایەنگرتن خو ل باژێرین مەریوان و سنە و دەورووبەرین وان کومدکەت و پشنگیریا شۆرەشی دکن.

ب مەرەما بەیژکرنا پیگەهی کوردان و چارەسەرکرنا پرسیا کوردی لدوێڤ پره‌نسیپین ئایینی ئیسلامی و نه‌هێلانا به‌هانه‌ییان لده‌ڤ حکومه‌تا ئێرانی، ئەحمەد موفتیزادە مەکتەب قورئان ل باژێری مەریوانی ددامەزینیت، ئەفی ریکخراوہیی خو وەکی رەوتەکا فکری دانیا سین و ل دەستپیکێ گوتارین ئایینی ددان، بەلێ لژیر کاریگەریا هەندەک ژ رەوشەنبیرین فارس و عەرەبان چوارچووقەیی ریکخراوہیی ھاتە گوھارتن بو ئایینی و سیاسی، و چارەسەرکرنا پرسیا نەتەوہیی کورد ل ئێرانی ئیک ژ بناغەیین ئەفی ریکخراوہیی بوو، ئەحمەد موفتیزادە دقیاا دچوارچووقەیی ئیسلاما سیاسی میللەتی کورد بگەیتە مافین خو یێن رەوا، لەوړا هەولدا پشکداریی دپرسین هەستیارین ئێرانی مینا ریفاندۆما 1979 دا بکەن داکو ب دروستی هەلوێستی ئێرانی ژ پرسیا کوردی بۆ دیار بیت.

62

دیسان دئەوان هزروبیرین خو یێن ئاییندا دیارکریه‌ ئەگەر دەستەهەلاتا ئێرانی مافین کوردان دچوارچووقەیی ئیسلامیدا نەدەت ئەوان و هیزان بناڤی ئیسلامی ب دژی کوردان پالده‌ت هینگێ دێ بناڤی ئیسلامی زولمی ل کوردان کەت، لەوړا هزروبیرین ئەوی بو هیزا پشەمرگەهین موسلمان ئەو بوو یە ئەف هیزە دێ بیتە ئەگەر ئیکدانا ئاسایشا نیشتمانی و نه‌ ئارامیا هەولایتین کورد ل پۆژەهەلاتا کوردستانی، ژبەرەندی ئەحمەد موفتیزادە هەولدان ریکری ل دروستبوونا ئەفی هیزێ بکەت و بو ئەفی مەبەستی پەیوەندی ب بەرپرسی ئێرانی ل تاران دکەت و مەترسیا ئەفی هیزێ بو ئەوان دبیژیت پاشی ئەو ھاریکاریا ئەوی ناکەن، لەوړا میللەتی کورد ل پۆژەهەلاتی کوردستانی لدۆر مەترسیا ئەفی هیزێ ئاگەھدار دکەت..

پشتی بو ئەحمەد موفتیزادە روون بۆی دەستەهەلاتارین ئێرانی نەقین ئەوان سۆز و بەلینین ب کوردان و خەلکی مەزەه‌بی سوننه‌ داین جیبه‌جیبه‌کەت، ژبەرەندی کاک ئەحمەد هزر د دامەزراندنا شورایەکی دا دکەت، داخوای ژ نوونەرین کوردان و سوننه‌ مەزەه‌بان دکەت ب شیوہیەکی ئیکگرتی داخوایین خو یێن ئایینی و نەتەوہیی پیشکەشی تاران بکەن داکو پرسین ئەوان لدوێڤ بنەماين ئیسلامی و دچوارچووقەیی ئێرانەکا ئیکگرتیدا ب ئەوان بدەت، پشتی چەندین کومبوونان و فیکرنا داخوایین خو بۆ تاران، حکومه‌تا ئێرانی داخوایین ئەوان پشت گوھاڤیتن، لەوړا ئەحمەد موفتیزادە لسەر دژایەتیکرنا خو ب دژی تاران بەردەوام بوو.

ئەحمەد موفتیزادە بو ماوہیی چەندین سالان ل زیندانین ئێرانی دا دمینیت و توشی چەندین ئەشکەنجەدانین دژاور دبیت، ئەف چەندە دزقريت بۆ هزروبیرین ئەوی یێن نەتەوہیی و ئایینی ب دژی

سیاسەت و ھەڵۆیستێ حکومەتێ ئێرانێ بەرامبەری پرسا کوردی و ئایدۆلۆژیا ئەوان یا ئایینی یا ھەقدژ دگەل کوردان. دگەل ئەوێ سیاسەتا توندا تاران بەرامبەری ئەوێ پەیرەوکاری، ب ھیچ رەنگەکی ئەوێ دەست ژ ھزروبیرین خۆ یێن نەتەوہیی و ئایینی بەرنەدابوو.

## ژێدەر

ئەلیاس، بابان. (٢٠٢٠). ئاوردانەمیەك لە سەر ھەلدانی ئیسلامی سیاسی لە پارچەکانی کوردستان، گوڤاری تیشك، (٥٤).

ئەمین، كاك ھەسەن. یاد ایام (چاپێكەفتن)، گوڤاری راھما، ١٠. (١).

براوینسن، مارتین ڤان. (٢٠١٧). ئیسلام و سیاسەت لە کوردستانی ئێران لە سەرووبەندی شورش دا: ژيانى ئەحمەد موفتى زادە، گوڤاری لێکۆلینەوی کوردی، (١).

حکیم، گوران. (٢٠١٦، چریا ئیکێ٢). ئەحمەد موفتیزادە <https://shorturl.at/Q4XP9>، (روژا سەرمەدانی ٤/١٢/٢٠٢٤).

خاوەری، جەھاد. (٢٠١٧). حیکمەتەکانی پەرسەش کاک ئەحمەدی موفتى زادە، چ ١، ب. ج.

زادە، كاك احمد موفتى. (١٣٨٦). دیوانی شیعری (دیاری بو یاران). مەکتەب قورئانی کوردستان.

سوبحانی، ناسر. (١٩٩٧). مروف و رییازی ژیان. عبدالله علی (وەرگیران). دەزگای پەخشان.

سەردەشتی، یاسین. (٢٠٠٢). کوردستانی ئێران لێکۆلینەویەکی میژوویی لە جوولانەوی رزگارپخوازی نەتەویی گەلی کورد (١٩٣٩ - ١٩٧٩). (چ ٢). چاپخانەى سیمما.

عیزەتیار، عەلی. (٢٧١٩). شورشى کوردستان و بزوووتنەوی مەکتەبی قورئان. رمزا فتحالله نژاد (وەرگیران)، گوڤاری تیشك، (٥٤).

عەبدوللا، سەروەت. (٢٠٢٢). ئەحمەدی موفتى زادە - سەركردمیهكى کاریزما و قوتابخانهیكى کردار. چاپخانهى سیمما.

عەبدوللا، سەروەت. (٢٠١٢). خەرماتیک لە وێه زێرینهکانی كاك ئەحمەدی موفتى زادە. (چ ٢). چاپخانهى سیمما.

عەبدوللا، سەروەت. (٢٠١٤). كاك ئەحمەدی موفتى زادە دەروازمیەك بو ناساندنی كەسایەتی و خەباتی نەناسینراو. (چ ٣). چاپخانهى سیمما.

عەبدولعەزیز، عومەر. (٢٠١٧). خەباتی کورد و رەھەندی ئیسلامی کاریگەری ئیسلام لەسەر شورش و راپەرین و رێکخراوە سیاسییە کوردییەکان ١٨٥٠ - ١٩٥٠. بلاوکر اوەکانی رێکخراوی زانست بو باس و توێژینەوه.

عەبدولعەزیز، عومەر. (٢٠١٧). دەریایەك لە خوشەوێستی پوختەیهك لە ژیاننامەى كاك ئەحمەدی موفتیزادە و بیرمۆرییەکانم لە خزمەتیدا. بەرێوەبەرایی گشتی کتێبخانە گشتیەکان.

عەبدوللا، سەروەت. (٢٠١٤). بونیادنانی خیزان و پەرورەمەکردنی تاك لە دیدی بیرپاری کورد ئەحمەد موفتى زادە. (چ ٢). چاپخانهى سیمما.

عەبدوللا، سەروەت. (٢٠٢٢). ئەحمەدی موفتى زادە یار یان نەپاری ھیزی پێشمەرگەى موسلمانى کورد (١٩٧٩ - ١٩٨٠)، گوڤاری وەرزانەى ئێرانناسی، (٥).

عەلامە، زانا یوخ. (١٣٨٧). ئەوەی زانیاری زورە و زەبەندی لە ھەموو بواریکدا ھەیە. دانشگاه کردستان فرهنگ فارسی.

کاک شیخ، عبدالقهار شیخ قادر شیخ محمد شیخ نوری گەردەشینەیی. (٢٠١٠). ئەحمەدی موفتى زادە ترووسکی لە پەیمەکانی. (چ ٢).

کۆمەڵێک نووسەر. (٢٠١٦). سەلفیزم لە کوردستان. ماجد خەلیل (وەرگیران). چاپخانهى حمدی.

کەریم، سوران ئەسەد، مەحمود، ھوشمەند عەلی. (٢٠٢٢). ئیسلامی سیاسی لە رۆژھەلاتی کوردستان (١٩٧٩ - ٢٠٠١). رەوتی مەکتەبی قورئان و دەعوەت و ئیسلام بە نموونە. گوڤاری زانکۆی کۆیە بۆ زانستی مەروفاپەتی و کۆمەڵایەتیەکان. (٢).

گەوھەری، حامید. (٢٠١١). رۆژھەلاتی کوردستان لە دە سال دا ١٩٧٨ - ١٩٨٨، چ ١، ھەولێر: چاپخانهى رۆژھەلات.

مفتی زادە، کاک احمد. (١٣٥٨). حکومت اسلامی. شورای مدیریت مکتب قران.

موفتیزادە، کاک ئەحمەد. (١٣٥٩). دەریارەى کوردستانى. نور.

موفیدی، سەباح. (٢٠١٩). ئایین و سیاسەت لە کوردستاندا لە سیاسەتی مەعنەوییەوه بۆ سیکۆلایزم، زارا بووکس.

- موکری، رزگار. (۲۰۱۹). مهکتبهی قورئان بهرانبهر گوتاری نهمهویی له چواچیهی ئیسلامی سیاسی هاوچهرخدا، دهزگای پهروهرده و لیکولینهوی حیزبی دیموکراتی کوردستان ئێران، گوکاری تیشک، (۵۴). مهحمود، هوشمند علی. (۲۰۱۲). رۆژهلانی لوردستان لیکولینهویهکه ل دوخی سیاسی بزوتنهوی رزگاری خوازی کورد (۱۹۷۹ - ۱۹۸۹)، ههولێر: چاپخانهی حاجی هاشم.
- Abdul Ezîz, O. (2017). *Têkoşîna kurd û pîvana îslamî bandora îslamê li ser şoreş û serhildanên kurd û rêxistinên siyasî 1850 – 1950*. Weşanên Zanistê de Rêxistina Nîqaş û Lêkolînê.
- Abdulaziz, O. (2017). *Kurteyek ji jînenîgariya birêz Ehmedî Muftî Zade û bîranînên min di xizmeta wî de*. Rêveberiya Giştî ya Pirtûkxaneyên Giştî.
- Abdullah, S. (2022). Ehmedî Muftî Zade yar an hêza pêşmerge ya neyarî ya kurd a misilman (1979 - 1980). *Kovara Îranolojiyê ya Çaryeka Çaran*, (5). 24 -45.
- Abdullah, S. (2022). *Muftiyê Ehmedî Zade - Rêberekî karîzmatîk û mektebeke pratîkî*. Çapxaneya Sima.
- Abdullah, S. (2012). *Xermanek ji bo zerînan li gorî Muftiyê Ehmedî Zade*. (Çapa 2), Çapxaneya Sima.
- Abdullah, S. (2014). *Avakirina malbatê û perwerdehiya takekesî li gorî ramanwerê kurd Ehmed Muftî Zade*, (C2), Çapxaneya Sima.
- Abdullah, S. (2014). *Birêz Muftiyê Ehmedî Zade: Deriyek ji bo nasandina kesayetî û têkoşîna nenas*. (Ç3). Çapxaneya Sima.
- Alama, Z. (2008). *Zanîna awayî li ser u zebendî hemo bowarekê yê heye*. Zanîngeha Çanda Farisî ya Kurdistanê.
- Berhevoka Nivîskaran. (2016). *Selefîzm li Kurdistanê*. Mecîd Xelil (Wer.). Çapxaneya Hemdî.
- Brawenson, M. V. (2017). *Îslam û siyaseta li Kurdistanê Îranê di beriya şoreşê de: Jiyana Ehmed Muftî Zade*. *Kovara Lêkolînên Kurdî*, (1). 80- 87.
- Cabi, M. (2019). The last mufti of Iranian Kurdistan and its revision of Kurdish history. *Journal of Ethnic and Cultural Studies*, 6(3), 1-12.
- Elias, B. (2020). Nîrxandinek li ser bilindbûna îslama siyasî li parçeyên Kurdistanê. *Kovara Tîşk*, (54). 146-155.
- Emînî, B. (B. M). *Yad Eyam (Hevpeyvîn)*. *Kovara Rahma*, 10 (1). 20-35.
- Ezzatyar, A. (2016). *The last mufti of Iranian Kurdistan: Ethnic and religious implications in the greater Middle East* (p. 95101). Palgrave Macmillan.
- Gawharî, H. (2011). *Rojhilatê Kurdistanê di navbera salên 1978-1988an de*. Çapxaneya Rojhilat.
- Hakim, G. (2016, Cotmeha 2). Ehmed Muftî Zade. <https://shorturl.at/Q4XP9>.
- Izzatîar, E. (2019). Şoreşa Kurdistanê û tevgera Mektebên Quranê ji hêla Reza Fathallanejad ve. *Kovara Tîşk*, (54). 342- 375.
- Jong, A., & Ebrahimzadeh, S. (2024). Ahmad Moftizadeh and the idea of the islamic government: a discursive tradition analysis in the field of political Islam. *Religions*, 15(2), 220- 224.
- Kak Şêx, E. (2010). *Ehmedî Muftî Zade Truske di Peyaman de*. (Çap 2). Weşanxane Nine.
- Kerîm, S., Haşmend, E. (2022). Îslama siyasî li Rojhilatê Kurdistanê (1979-2001) tevgera Mektebên Qur'anê, dawet û îslah bo nimûne. *Kovara Zanistên Mirovî û Civakî ya Zanîngeha Koyê*, 5(2). 100-109.
- Khosravi, J., Aghapouri, H., & Hamehmod, L. (2016). The islamist Maktab-Quran in Iran and its challenges for Kurdish nationalism. *Journal of Ethnic and Cultural Studies*, 3(1), 59-73.
- Mahmoud, H. (2012). *Lûristana Rojhilat lêkolînek li ser rewşa siyasî ya tevgera rizgariya Kurd e (1979 - 1989)*. Çapxaneya Hacî Haşim.
- Mofidi, S. (2015). Religion and politics in Eastern Kurdistan (With a focus on Maktab Qur'an during Iranian Revolution, 1979). *Journal of Politics and Law*, 8(3). 36- 50.
- Mofidi, S. (2019). *Ol û Siyaset li Kurdistanê ji siyaseta rûhanî heta sekularîzmê*. Zara Books.
- MuftîZade, B.E. (1358). *hikûmeta îslamî, lijneya rêvebir a dibistana Quranê*.
- MuftîZade, B.E. (1970). *Derbarê Kurdistanê de*. Nur.
- MuftîZade, B.E. (2007). *Dîwanî Şî'rî (Diyarî bo yaran)*. Mekteba Quranê ya Kurdistanê.
- Mukrî, R. (2019). Mektebên Qur'anê li dijî gotara neteweyî di çarçoveya îslama siyasî ya hemdem de, Enstîtuya Perwerde û Lêkolînê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, *Kovara Tîşk*, (54). 121-135.
- Serdeştî, Y. (2002). *Kurdistanê Îranê lêkolînek dirokî li ser tevgera rizgariya neteweyî ya Kurd (1939-1979)*. (Ç2). Çapxaneya Sima.
- Subhani, N. (1997). *Mirov û Rêya Jiyane*. Abdullah Elî (wergerandin). Dezgayî pexşan.
- Xawarî, C. (2017). *Hikmetên Îbadetê Birêz Ehmedî Muftî Zade*. B.J. Weşanxane Nine.



# محەمەد زاهیر گولەنبەری (1869-1922): سەربوردەى موختیەکی هەلەبجەیی لە ئەرشیفی عوسمانیدا

Hemin Omar AHMAD

Muhammed Zahir Gulanberi (1869-1922):  
The Career of a Halabjani Mufti in the Ottoman Archives

Osmanlı Arşivlerinde Helebçeli Bir Müftünün Hayatı:  
Muhammed Zahir Gülanberi (1869-1922)

## Hemin Omar AHMAD

ORCID: 0000-0003-1985-9512 | heminahmad40@gmail.com  
Prof. Dr., Department of Kurdish Language and Culture, Salahaddin  
University, KRG-Iraq.

## Citation/Jêgir/Atrif:

Ahmad, H. O. (2025). Mihemed Zahîr Gul'enberî (1869-1922):  
Serburdey muftiyekî Hellebceyî le erşîfî 'Usmanî da. *Kurdiyat* (11),  
67- 82. DOI: 10.55118/kurdiyat.1689389

## Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Biography Article/Gotara Jinenigari/Biyografi Makalesi  
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 02.05.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 22.06.2026  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2025

## Peer-Review/Hekemti/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Tarafli Kôr Hakemlik-İki hakem

## Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

## Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been  
followed while carrying out and writing this study and that all the  
sources used have been properly cited./ Hatiye beyankirin ku di  
pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine  
şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu  
çalîşma yapilirken ve yazilirken bilimsel ve etik ilkelere uyulduđu ve  
kullanilan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduđu beyan  
edilir.

## Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties  
in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya  
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

## Grant Support/Alikariya Darayî/Maddi Destek:

The authors acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı  
desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul  
etmektedirler.

## Copyright & License/Mafê Telîfê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
haklarını saklı tutarlar.

## پوخته

زۆر زانای کورد، ئەو دەمەى له ولاتى خۆيان چوونهتەدەر، لەبەر شارەزایی و پڕ زانستییان له هەر شوینیک ژایان، پۆل و کاریگەرییان هەبوو و هەول و کۆششەکانیان لەنێو لاپەرەکانى میژووی ئەو ناوچەیدا تۆمارکراون. یەکیک لەو زانایانە بە ناوی (محەمەد زاهیر گولەنبەرى) کە زۆربەى ژيانى له دەرەوێ و لاتى خۆى بەسەر بردوو، بەلام پۆل و کاریگەرییەکی دیار و بەرچاوه و له پۆمى ئەوسا (خاکی بن دەستی عوسمانی) و له چەند شارینکی مسولماننشیندا وەك موفتی دەوری خۆى بینووه. لەنێو بەلگەنامەکانى عوسمانیدا و ئەرشیفخانەى مەشیخەتدا وێرای ئەوێ دەیان بەلگەنامە لەبارەى ژيان و چالاکییەکانى لەناو دۆسیەى تاییەتدا هەن، له هەمان کاتدا بەلگەنامەى تر دەربارەى ژيانى هەن و بە هەموویان دەرکۆى زۆر لایەنى ژيانى ئەو زانا گەورەیه پروناک بکەنەوه. ئەم توێژینەوێه تیشک دەخاتە سەر بەشیک له بەرهەمەکانى ناویراو، کە ئەگەر چى ئەم بەرهەمانە دەستناکەون، بەلام دۆزینەوێه ناوی بەرهەمەکان دەچیتە پیزی ناوی بەرهەمى ئەو زانایانەى کە کتیبەکانیان ون بوونە. گرنگی ئەم بابەتە لەوهدایە کە وێرای ئەوێ بۆ یەكەم جار تیشک دەخاتە سەر ژيانى زانایەکی هەلەبجەیی، له هەمان کاتدا گرنگە کە زانایەك له غەریبیدا ئەو پۆلە گەورەیه له شارە گەورەکانى ئەوسای عوسمانیدا بگێڕێ، بەتایبەت له سەردەمى هەستیارى کوتایى دەسلەلاتى عوسمانییهکان. لەگەڵ ئەوهدشدا ئەمە دەبیتە بەشیک له میژووی موفتییهکانى عوسمانى و میژووی کەسایەتییه کوردەکان لەناو دەولەتى عوسمانیدا.

**وشەى کلیل:** هەلەبجە، پۆم، زانای کورد، موفتی، ئەرشیفى عوسمانى.

## Abstract

Many Kurdish scholars, when they left their homeland, played significant roles and had influence wherever they lived due to their expertise and scholarly knowledge, and their efforts and endeavors have been recorded in the pages of history of those regions. One of these scholars was Muhammed Zahir Gulanberi, who spent most of his life outside his homeland, yet his role and influence were clear and evident. He served as a mufti in Rom of that time (Ottoman territory) and in several Muslim cities. In the Ottoman documents and the Meshihat archives, besides dozens of documents about his life and activities contained in a special file, there are also other documents about his life, and through all of them, many aspects of this great scholar's life can be illuminated. This research sheds light on some of the works of the aforementioned person. Although these works are not available, the discovery of the names of the works falls into the category of works by scholars whose books have been lost. The importance of this topic lies in the fact that, in addition to shedding light on the life of a Halabja scholar for the first time, it is also significant that a scholar in exile played such a great role in the major cities of the Ottoman Empire, especially during a sensitive period at the end of Ottoman rule. Moreover, this becomes part of the history of Ottoman muftis and the history of Kurdish personalities within the Ottoman State.

**Keywords:** Halabja, Rom, Turkistan, Kurdish scholars, mufti, Ottoman archives.

## Özet

Birçok Kürt âlimi, kendi ülkelerinden ayrıldıktan sonra, bilgi ve ilmi yetkinlikleri sayesinde yaşadıkları her yerde rol ve etki sahibi olmuş, çaba ve gayretleri o bölgenin tarih sayfalarında kayıt altına alınmıştır. Bu âlimlerden biri de Muhammed Zahir Gülanberi adında olup, hayatının çoğunu kendi ülkesi dışında geçirmiş, ancak rolü ve etkisi açık ve belirgindir. O dönemin Osmanlı topraklarında ve birçok Müslüman şehrinde müftü olarak görev yapmıştır. Osmanlı belgelerinde ve meşihat arşivinde, hayatı ve faaliyetleri hakkında özel bir dosyada onlarca belge bulunmasının yanı sıra, aynı zamanda hayatı hakkında başka belgeler de mevcuttur ve bunların tümüyle bu büyük âlimin hayatının birçok yönü aydınlatılabilir. Bu araştırma, adı geçen kişinin eserlerinin bir kısmına ışık tutmaktadır. Bu eserler her ne kadar elimizde bulunmasa da, eser isimlerinin tespit edilmesi, kitapları kaybolmuş olan âlimlerin eser isimleri sıralamasına girmektedir. Bu konunun önemi, ilk kez Halepçeli bir âlimin hayatına ışık tutmasının yanı sıra, aynı zamanda bir âlimin gurbette, özellikle Osmanlı iktidarının son dönemlerinin hassas zamanlarında, Osmanlı'nın büyük şehirlerinde bu büyük rolü oynamasının önemli olmasındandır. Bununla birlikte bu çalışma, Osmanlı müftüleri tarihinin ve Osmanlı devleti içindeki Kürt şahsiyetlerin tarihinin bir parçası olmaktadır.

**Keywords:** Halepçe, Rûm, Türkistan, Kürt âlimi, müftü, Osmanlı arşivi.

## پیشه‌کی

نووسینه‌وهی میژووی زانایان، بۆ خۆی بواریکی تایبه‌تی گرتووه. ئه‌گه‌ر پێشتر له چوارچێوه‌ی کتییی تایبه‌تی میژووی زانایان، قافله‌ی زانایان، موعجه‌می عوله‌ما...هتد و ناوی جیا جیا بوون و ته‌نیا به کورتی باس له کورته‌ی ژیان و ناوی به‌ره‌مه‌کانیان ده‌کرا، ئه‌وا ئه‌مرۆ له چوارچێوه‌ی توێژینه‌وه‌ی زانستی و له‌به‌ر رۆشنایی به‌لگه‌نامه و ده‌ستخه‌ته‌که‌نه‌وه هه‌ول ده‌دری تیشک بخه‌ریته سه‌ر ژیان و به‌ره‌مه‌ی ئه‌و زانایانه‌ی که له سه‌رده‌مێکدا رۆلێکی کاریگه‌رییان هه‌بووه. نووسینه‌وه‌ی میژووی زانایانی کورد وه‌ک به‌شیک له میژووی زانایانی ناوچه‌که و جیهانی ئیسلامی، زۆر نوێیه و ته‌مه‌نی له 150 سال زیاتر تێناپه‌ریت. شاعیرانی کورد له کۆنه‌وه به‌شیک بوون له زانایان و هه‌ندیکیان زانای دیاری سه‌رده‌می خۆیان بوون، بۆیه هه‌ول‌دان بۆ نووسینه‌وه‌ی میژووی شاعیرانی کلاسیکیش هه‌ر ده‌چینه چوارچێوه‌ی نووسینه‌وه‌ی میژووی زانایانه‌وه. له نمونه‌ی ئه‌م کارانه: کتییی شاعیر و موسه‌ننێفی د کوردستانی" هی مه‌لا مه‌حمودی بایه‌زیدی که ئه‌لیکساندار ژابا له سالی 1860 چاپی کردووه، هه‌روه‌ها دواتر ئه‌نجومه‌نی ئه‌دیبانی کوردی ئه‌مین فه‌یزی (فه‌یزی، 1920) که له سه‌رده‌می عوسمانیه‌کاندا له ئه‌سته‌نبول چاپ کراوه، تێیدا هه‌ردوو کتیه‌که باس له ژیان و به‌ره‌مه‌ی چه‌ند شاعیرێک ده‌کات، که ئه‌م شاعیرانه وێرای شاعیربوونیان وه‌ک زانایه‌کیش له‌ناو کوردان ناسراون. دوا‌ی ئه‌مه مه‌مه‌د ئه‌مین زه‌کی به‌گ له کتییی (ته‌ئریخی سلیمانی و وه‌لاتی) دا (زه‌کی، 1939) دا باسی ژياننامه‌ی نزیکه‌ی سه‌د که‌س له زانا، شاعیر و که‌سایه‌تیه‌کانی کورد ده‌کات و به‌شیک له سه‌رچاوه‌کانیشی سنجیلی ئه‌حوالی عوسمانیه‌یه. له دوا‌ی ئه‌وه‌دا چه‌ندین کتییی تر له‌باره‌ی ژياننامه‌ی زانا و که‌سایه‌تیه‌کانی کورد له به‌رگی و چه‌ند به‌رگی‌دا چاپ کراون.

### 1- ئه‌رشیفی عوسمانی و زانایانی کورد

یه‌کیک له سه‌رچاوه هه‌ره گرنگه‌کان بۆ نووسینه‌وه‌ی میژووی زانایانی ئیسلام به‌گشتی و زانایانی کورد به تایبه‌تی، به‌تایبه‌تێر زانایانی سه‌ده‌ی نۆزده و سه‌ده‌تای سه‌ده‌ی بیسته‌م، بریتیه له ئه‌رشیفی عوسمانی. له نێو ئه‌رشیفی عوسمانیشدا سنجیلی ئه‌حوال که تۆماری فه‌رمانبه‌رانی ده‌وله‌تی عوسمانی بووه، زۆر گرنگه، به‌وه‌ی به‌شیک له زانا کوردانه که فه‌رمانبه‌ری په‌سمی ده‌وله‌ت بوونه، جا چ نایب، حاکم، موفتی و زانای خاوه‌ن مه‌درسه بوونه، که‌م تا زۆر به‌گۆیره‌ی چالاکیه‌کانیان کورته ژيانیان نووسراوه‌ته‌وه. ئه‌م سنجیلی ئه‌حوالانه که به ده‌فته‌ری سنجیلی ئه‌حوال ناسراون، گرنگترین سه‌رچاوه‌ن بۆ نووسینه‌وه‌ی ژياننامه‌ی فه‌رمانبه‌رانی ده‌وله‌ت و له سه‌رده‌می سوڵتان عه‌بدوله‌حمیدی دووه‌مدا بۆ به‌دواداچوونی قوناغه‌کانی که‌شه‌پێدانی سیسته‌می کارگیریی ده‌وله‌ت ها‌ته کایه‌وه. کاره‌که له سالی 1879 ده‌ستی پێکرد و ده‌فته‌ره‌کان له ژماره 1 تا 201 پیکهاتوون و کارمه‌ندانی تۆمارکراو له نێوان سالانی 1200- 1310 ی کۆچی واته (1786-1892) ی تێدايه. دوا‌ی سه‌رده‌می مه‌شرووتیه‌ت له سالی 1909 دا کوتایی به سنجیلی عومومی هات و بۆ هه‌ر کارمه‌ندی که له ده‌زگاکه‌ی خۆیدا سنجیلی بۆ ده‌کرایه‌وه. (Sarııldız, 2009, r. 134) تا ئیستا ئه‌مه بۆته سه‌رچاوه‌یه‌کی زۆر باش بۆ دۆزینه‌وه‌ی ژياننامه‌ی که‌سایه‌تیه‌کانی کورد.

له‌گه‌ل ئه‌وه‌شدا ئه‌رشیفی مه‌شیخه‌ت که ئیستا وه‌ک کتیبخانه‌یه‌که و له ئه‌سته‌نبوله، به‌لگه‌نامه‌کانی ئه‌م ده‌زگایه له نۆ به‌شی سه‌ره‌کی پیکهاتووه، که یه‌کیک له‌وانه به‌لگه‌نامه‌کانی ده‌فته‌ری سنجیلی

ئەحوالە، لەگەڵ ئەوەشدا بۆ ھەر کەسایەتییەک لەوانە، چ قازیی، حاکم و موفتیی یان ھەر کەسایەتییەکی تری ئایینی کە بە فەرمانگەیی مەشیخەتەو پەيوەستکراو بوو، ئەوا وەک دۆسیەیک چى بەلگەنامە لەبارەى ئەو کەسایەتییەو ھەبوو، ھەولدارو بەخێتە ناو دۆسیەیک. (Yildiz, 2021, r. 5) ئەمەش ئەگەر ھەموو بەلگەنامەکانیش نەبن، بەلام زۆربەیانە و کارئاسانییەکی زۆرە و پالپشتییەکی گەورەى سیجیلی ئەحوالە.

ئەگەر چى تا ئیستا تاک و تەرا لێرە و لەوئى بۆ زانایانى کورد سوودیکى کەم لەم ئەرشیفە وەرگیراو، بەلام سەبارەت بەم زانایە، بۆ یەكەم جار نووسەرى ئەم وتارە رێبەرییەکی بۆ زانا و کەسایەتییەکانى ناو ئەرشیفخانەى مەشیخەت ئامادەکرد کە خۆى لە نزیکەى 500 کەسایەتیی دەبینیو و ژمارەى لاپەرە و کۆدى کەسایەتییەکانى تیدا نووسراو و تیدا بۆ یەكەم جار باس لەم مەلا محەمەد زاھیرە وەک ناوھێنان، سال و شوینی لەدایکبوون و شوینی کارکردنى ھینراو (Ahmad, 2021, r. 43). ئەم زانایە لەپال زاناکانى تردا کەرەستەى دەیان و سەدان توێژینەو، کە تا ئیستا زۆر بە کەمى کاریان لەسەر کراو. لە لایەکی تردا لەم وتارەدا ھەول دراو تەنیا پشت بە ئەرشیفی مەشیخەت نەبەستری، بەلکو ئەرشیفی عوسمانی سەر بە سەرۆکایەتى ئەنجومەنى وەزیرانى تورکیا، بە چپر چپرى پششى پى ببسەتري.

## 2-2 ھەلەبجە و پۆم

ھەلەبجەى ئیستا و گولەنەبرى پشستر کە زیدی ئەم زانایە، لە چوارچێوەى ویلايەتى موسلدا، سەنجاقي سلیمانى گریدراوى ویلايەتەکە بوو و یەکیک لە قەزایەکانى سەنجاقي سلیمانىش قەزای گولەنەبر بوو، کە شارى ھەلەبجە ناوەندەکەى بوو (Ahmad, 2024, r. 66) و سەردەمیکیش ناوەندەکەى خورمال-ى ئیستا بوو. ئەم دەقەرە لە پرووى زانستیەو ھەر لە کۆنەو پێگەیکى گەورەى ھەبوو و بەشیک بوو لە شارەزوورى کۆن، کە زۆر زانا لە مێژوودا بە پاشناوى شارەزوورى ناسراون. لە ھەمان کاتدا لە کوتایى سەدەى نۆزدەدا گوندەکانى تەویلە و بیارە وەک ناوەندیکی گەورەى زانستی لە ناوچەکە ناسراو بوو و زید و جیگەى شیخانى نەقشبەندى و بنەمالەى شیخ عوسمانى سیراجەددین بوو و تەنانت ئەم مەلا محەمەد زاھیرەش ماوہیک لەوئى و لە ناوچەى پینجوتینى خویندوو.

پۆم لە فەرھەنگی ئەدەبى کوردی ناوەندا بە مانای تورکی عوسمانى دیت (Arif, 2009, r. 469) و پۆمیش لەبەر کاریگەری قەلاى پۆمەکان لە ئەستەنبول، لەناو زەینى کوردیدا ھەموو تورکستانیک پۆما و ھەموو پۆمایەک تورکستانە.

فەقى تەیران دەلى:

بوویە ھەوار ھەوارە/ قەت پۆم نەبوو دیارە

خەبەر نەھات ژ پۆمى/ عاجزبوونە ژ دۆمى (Dêreşî û Alîcan, 2005, r. 44)

نالى (1877-1800) دەلى:

حوکمى قانونى سەفا پۆیى لە پەومى پەومەدا

تا هوویدا بوو له پۆما گهردی ئاشووبی عهجهه

یان سالم (1800-1866) دهلی:

موریدی خانهقا زۆرن له عههدی عهدهلی پۆمیدا

له ئاغاوانی بیهش حوجرهها جیی توبهکاران (Arif, 2009, r. 469)

حاجی قادری کویی-یش وشهه (پۆما) بهتهواوی بۆ ئهستهنبول بهکاردینی و دهلی:

له پۆما کهوته بهرچاوم کهسیکی هائیم و حهیران (Miran û Şareza, 1986, r. 91)

وێرای ئهمانهه سهرهوه، ههر یهکه له مهلاهی جزیری، ئهحمهدهی خانی و حهجیی جندی و زۆر له شاعیران و نووسهران ولاتی پۆمی و پۆم-یان بۆ تورکستان بهکارهیناوه.

جا له بهر ئهوهی ئه شوینانهی که ئه زانایه لێی بۆته موفتی، له سهلانیکی بگره تا دهگاتهوه ئهستهنبول، ماوهی ههژده سال کاری کردووه، له ههمووشیاندا موفتی خهلی مسوڵمانی تورک بووه، بۆیه وشهیهکی هاوبهش له (پۆم) بترازی بۆ ئه ههموو ناوچهیانه نهبوو، که ههندیکان ئیستا له بن دهسهلاتی تورکیادا نین و بهلکو له سنووری دهروههه کوماری تورکیادان.

## 2-کورتته ژبانی

### 1-1 ناو و زید و خویندنی

ناوی محهمهده و ناسراوه به زاهیر و باوکی ناوی عهزیز بهگ بووه، له بهگهکانی جافی نیو ههلهبجهن و بنهمالهکهیان بهگی (وهلهدهگی)یان پێ دهلێن. له سالی 1286ی کۆچی بهرامبهه سالی 1869ی زایینی له دهوروپهری ههلهبجهه سهر به قهزای گولعهنهر له دایک بووه. وهک خوی له ژياننامهی نیو ئهرشیفی مهشیختهتا نووسیویهتی سهرتا له قوتابخانهی نارهسمیی عهشیرهتهکهیدا دهستی به خویندن کردووه و قورئانی پیرۆز و ههندی کتیی فارسی دهست پێ کردووه. له سالی 1302ی کۆچی / 1885ی زایینی بۆ خویندن چۆته مهدرهسهی گوندی بیاره و دهستی به کتیه سهرهتاییهکان کردووه و پاشان دهچیتته ناحیهی پینجوی و لای عهلامهه بهناوبانگ مهلا عهبدولرحمانی گهرهه پینجوی دهخوینی و پاش ماوهیهک دهچیتته سلیمانی لای مهلا رهسوولی واعیز دهخوینی و لهویشهوه دهچیتته کهرکوک له مهدرهسهی حاجی ئهحمهدهگ لای مهلا عهلی حاجی وههابزاده دهخوینی و پاشان دهچیتته بهغدا لای زانای ناودار مهلا عهبدولرحمانی ابن الخياط دهمینیتتهوه و ئهنا دهگههیتتهوه ههلهبجهه و له مزگهوت و مهدرهسهی پاشا لای شیخ محهمهده قهرهههه دهمینیتتهوه. دواچاریش دهچیتتهوه پینجوی و له خزمهت مهلا عهبدولرحمانی پینجوی خویندنی تهواو دهکات و ههر لای ئهوهیش له تهمهنی 31 سالییدا و له سالی 1317ی کۆچی ئیجازهنامهی زانستی وهردهگری (ST.MFT. MSH.SAİD.0179.01).

دوای ئیجازهوههرگرتن، پینج سال له کوردستان یان بهغدا دهمینیتتهوه و به تهواوی نازانری مهلاهیهتی له کوی کردووه. بۆیه گومان دهکهین له بهغدا مابیتتهوه، چونکه که چۆته ناوچهی یونانی ئیستا، لای خهلهک به بهغدادلی خوجه، واته ماموستای بهغدایی ناسراو بووه، ئهگهر چی بهشیک لهوانهه پاشناویان بهغداییه، له بنهههتا کوردن، چونکه ئهوسا بهغدا ویلایهتیکی گهرهه بووه و له بیر خهلی

ئەستەنبول و دەورو بەریدا خەلکی عێراقی ئیستا بەگشتی بە بەغدادی ناسراو بوونە. پاشان مل بە ڕیگاوە دەنی و دەچیتە (سەلانکی) ی یۆنانی ئیستا-ئەو سەر دەمە سەر بە دەوڵەتی عوسمانی بوو- و لەوێ لە ساڵی 1323 ی کۆچی / 1905 ی زایینیدا لە مەدرەسە ی سەرای عەتیق لای مودەرپەسی خوالیخۆشبوو یەعقوب ئەفەندی ئیجازەنامە ی زانستی وەر دەگریت. وەک خۆی باسی دەکات، لە دامەزراوە ڕەسمییەکانی ئەو شارەدا داوای ئیجازەنامە ی لێدەکەن، ئەویش ئیجازەنامەکی خۆی کە لە مەلا عەبدولرحمانی پینجۆینی وەر یگرتبوو، لە ڕیگە ی گەشتەکیدایە وێ کردبوو، بۆیە بە ناچاری جاریکی تر دەخوینیتەو و لای ئەو زانیایە سەلانکی ئیجازە وەر دەگریتەو (ST.MFT. MSH.SAID.0179.02).

هەر لە هەمان ساڵدا و لە مانگی نیساندا لە قەزای ئۆرتاحەصار و لە مەدرەسە ی گوندی ئیستیفیجەدا بە مودەرپەس دادەمەزرێ. لە ساڵی 1326 ی کۆچی لە ناحیە ی ساری شەعبان و لە گوندی منجونس لەسەر وەسیەتی مودەرپەسی خوالیخۆشبوویان، خەلکی گوند داوایان کرد و بەو ھۆیەو لەوێ دامەزراوە. لەو مەدرەسانەدا دەرسەکانی، نەحو، صەرف، ئادابی موناژەرە، حیکمەت و کەلام، ئوسولی فیقھ بەیان، مەعانی، بەدیع، عەرەوز، حیساب، ماتماتیک، تەشریحی ئەفلاک ی گوتۆتەو. زمانەکانی تورکی، عەرەبی و فارسی بە پلە یەکی زۆرباشی قسەکردن و نووسین زانیو و لەگەڵیشیدا وەک خۆی نووسیویەتی بە کوردیی قسە دەکات (ST.MFT. MSH.SAID.0179.01).

## 2-2- بەرھەمەکانی

وێک نەریتیک، زانیان لە سیجیلی ئەحوالی فەرمانبەری خۆیاندا ئەگەر کتیبیان ھەبوا یە ناوی کتیبەکیان دەنووسی و ئەگەر نەیانبوا یە دیاننووسی ھیچ بەرھەمێکی نییە. ئەم زانیایە ناوی چوار لە دانراوەکانی خۆی نووسیو، کە بریتین لە:

1- کتیبیکی لەبارە ی مەنتیق وێک تەعلیقات لەسەر کتیبی (برھان گلنوبی) ی ھەبە و ھەتا بەشی (تصورات) نۆھد لاپەرە ی نووسیو و تەواو نەبوو بۆیە چاپ نەکراوە.

2- مجمع الأنهر فی شرح ملتقى الأبحر ومعه الدر المنقى، شەرح کردووە (ئەم کتیبە و کتیبەکی سەرھو بە عەرەبی و چاپ نەکراوە).

3- دیوانیک یان کۆمەلە غەزەلیکی بە فارسی ھەبە و چاپ نەکراوە.

4- لەگەڵ چەند ڕیسالە یەکی تر. (ST.MFT. MSH.SAID.0179.01)

ھیچ یەکیک لەم کتیبانە لە ناوەکانیان بترازی، نەدۆزراو نەتەو.

## 2-3- زانیارییەکانی نۆ تەسکەرەکی

تەزکیرە ی سەر دەمی عوسمانی کە تا ئەم دواییانەیش لەناو کورددا بە (تەسکەرە) ناسراو، لە جێی ناسنامە ی ئیستابوو و لە بەلگەنامە کەدا وێنە ی تەزکیرە کە دەبینرێ و ئەم زانیارییانە ی خوارەو ی تیدا تۆمار کراوە:

ناو و نازناو: مەلا محەمەد ئەفەندی

ناوی باوک: خوالیخۆشبوو عەزیز بەگ

ناوی دایک: خوالیخۆشبوو نەشئەت

سال و شویانی له دایکبوون: 1284، گوندی قهره جان 1-ی دهووبهیری ههله بجه  
پیشه و خزمهت: مه دره سه نشین.  
باری خیزانی: یهک هاوسهیری ههیه.

شیوهی پروخساری

به ژن: مامناوهند

پهنگی چاو: زهردی کال

پهنگی پیست: گهنمی

توماری ناسنامه: سه لانیك

ناوی گوند: ئه حمه د سوباشی

ژمارهی خانوو: 122

له ناو به لگه نامه کاندای ناوی به مه لا محمه د ئه فهندی، محمه د ظاهر و محمه د ظاهر گولعه نهیری  
هاتوو (ST.MFT.MSH.SAID.0179.06).

## 2-4 نوسخه ی ئیجازه نامه که ی

وهک خوی ئاماژهی پیدابوو، له ریگای گه شته که ی بۆ سه لانیك، دهقی ئیجازه نامه که ی مه لا  
عه بدولرهمانی پینجیونی لی ون بووه و ناچار جاریکی تر ئیجازه نامه یه کی له زانییه کی ئه و دهقه ره  
به ناوی (یعقوب صدقی بن نعمان بن یوسف البهرام ددهوی اللنقطه وی) وهرگرتوو. له ئیجازه نامه که دا  
هاتوو:

الحمد لله الذي انيت دوحة العلم في صدور العلماء وجعل ثمارها انوار احكام الشريعة الغراء، اللهم  
رب الارباب مالك الرقاب، منزل الكتاب، محقق الحق وملهم الصواب الذي احاط بكل شيء علما ونصب  
من مصنوعاتك على كمال قدرته علما، صل وسلم على افضل من اوتى الحكمة وفصل الخطاب.....كاتب  
ناوی ئیجازه وهرگیشی هیناوه، ئاوا وهسفی کردوو: الاخ الامجد العالم الفطن اللبيب اللوزع الاديب، ذو  
الطبع السليم الوقار والذهن القوى النقاد (محمد ظاهر ابن عزيز بك الجافي گلغهنیری)...

ئیجازه نامه که درێژه و وهک دهستووری ئیجازه نامه کان نووسراوه، ئه و نموونه یه ی هینامانه وه،  
تهنیا بۆ ئه وهیه له ئیو دهقه که دا به په سنیکی زۆری وهک: برای سهروه، زانای لیتهاتوو و کارزان و  
ئهدیب و خاوهن که سایه تییه کی به ویقار و زهینیکی به هیز محمه د زاهیر کوری عزیز به گی جافی  
گولعه نهیری، ناوی ئه مانه مان هاتوو. وایاره ئیجازه نامه که ییش له 1323 ی کۆچی / 1905 ی زایینی  
له مه دره سه ی ئه سکی سه رای (که گه ره کیکی گه وریه ی مسولمانه کانی سه لانیك بووه) نووسراوه.  
(ST.MFT.MSH.SAID.0179.02)

لیزه دا دهتوانین له سه ره ئه و خاله به سه نگرینه وه که ماموستای ناوبراو بۆته جینی سه رنجی  
ماموستای ئیجازه ده ره؛ که خاوهنی زانستیکی زور و که سایه تییه کی کاریگر و له هه مان کاتدا ئه دیبیش  
بووه، ئه مه ش به لگه ی سه لماندن ی ئه وهیه که ناوبراو دیوانیکی شیعی به فارسی هه بووه.

<sup>1</sup> ناوی ئه مانه گونده مان بۆ ساغ نه بوویه وه، قهرمان، قهرمان؟

## 5-2 مهلا محمەد و وەرگرتنی پایە ی عوسمانی

وا دیاره ناوبراو پایە یه کی زانستی گه وری هه بووه، بۆیه به فرمانیکی سولتانی که ناوی سولتان محمەد رەشادی له سهره، پایە ی مه خرەج (مخرج پایە لری) وەرگرتوووه. ئەمەش میژووی 17 ی رەبیعی لئاخەری سالی 1326 ی کۆچی له سهر نووسراوه. ئەم فرمانەیش له جەریدە ی عیلمییه دا پەخش کراوه. (جریدە ی علمیە، 1336:1090) لێرە دا دەر دەرکە ویت، ناوبراو پێش ئەو ی به پەرسمی بێتە موفتی و مودەرپیس ئەم پایە یه ی وەرگرتوووه، ئەمەش نیشانە ی ناوبانگیکی زۆری ئەو له ولاتی پۆمدا.

## 6-2 پیروزیابینامە ی مهلا محمەد به بۆنە ی جهژنی قوربان

دیاره ناوبراو وەک کاربە دەستیکی دیاری ئەوسا، که موفتی ناوهندی ویلایه تیکی گه وری وەک ئەدەنه بووه، له بۆنە کاندای وەک هەر کاربە دەستیکی تری دەوڵەت پە یامی خۆ ی هه بووه. بۆیه له 1339/1/6 ی کۆچی (1920/9/20) به ناوی موفتی ئەدەنه وه پیروزیابی جهژنی قوربانی پیروزی له عەتە به ی عولیای عوسمانی و پادشا کردوووه (BEO.004653.348972.001) و مۆری خۆیشی لێداوه که تێیدا له ناو مۆرە که نووسراوه (محمد ظاهر) (BEO.004654.348996.002).

## 7-2 بوونی به مودەرپیس و موفتی

له سالی 1327 ی کۆچی / 1909 ی زایینی له تەمەنی چلویهک سالی دا به پەرسمی بۆتە مودەرپیس مەدرەسە ی گوندی منجونسی ئورتا حەصار و دیاره خەلکی گوندە که داویان کردوووه و له سهر ئەو داویەیان دامەزراوه. به لām هیچ مووچه یه کی له دەوڵەت نه بووه و ئەو نووسراوی دامەزrandنی بێ مووچه ییه شی له فرمانگی موفتیایه تی ناوچه که له 1327/1/1 ی کۆچیدا تهسدیق کراوه. ناوبراو کاتیک ئەم کورته ژياننامە یه ی خۆ ی نووسیوه ته وه، له 21 ی جهمادی لئاخیره ی سالی 1328 (1910/6/30 ز) بووه، موفتی قەزای ئورتا حەصار بووه و مۆری خۆ ی لێداوه و له مۆرە که دا ناوی محمد ظاهر و میژووی سالی 1328 ی تیدا به دیار دەرکە ویت (ST.MFT. MSH.SAİD.0179.04).

ئەو ی لێرە دا به دەر دەرکە ویت ئەو یه، چوار سال به سهر ئیجازه وەرگرتنه کهیدا دەر وات، ئەنجا به پەرسمی وەک مودەرپیس و موفتی دادەمەزری. بۆ یه یه ئەم چوار ساله خۆ به خشانە یان له دەر وە ی کاری پەرسمیدا دەر سیداییتە وه.

مهلا محمەد له چەند شار و قەزایه کی ئەوسای عوسمانیدا بۆتە موفتی، له وانه:

### 1- موفتی ئورتا حەصار

ئورتا حەصار (کلکس) - به یونانییه که ی ناوکه (Palaio Gynaikokastro) یه ده که ویتە نیوه راستی مەکه دۆنیا و یه کی که له شارەکانی یۆنان و دانیشتوانه که ی مەکه دۆن و ئەلبان و تورکن و ئەوسا سهر به ویلایه تی سه لانیکی بووه. وا دیاره له بهر زانایی و لیها تووبی مهلا محمەد، خەلکی ناوچه که به زانا و پیاوماقووله وه نووسراویان بۆ فرمانگی موفتیایه تی کردوووه و داوی ئەو دیان کردوووه که محمەد ظاهر ئەفەندی ناسراو به مودەرپیس به غدا؛ سالی پێشوو له گوندیکی ئەو ناوچه یه دەستی به دەر سدان وه کردوووه و خاوهنی عیلم و کهمال و زوهد و وەرعه و سوودیکی زۆری به خەلکی ناوچه که گه یاندوووه، بۆیه شایانیه تی بێتە موفتی له و قەزایه و داوا ده کهن که پێش نیاز که یان به

هه‌ند وەرگیریت. نووسراوەکە لە 18 ی شەووالی 1327 ی کۆچی بەرامبەر 1909/11/2 کراوە (ST.MFT. MSH.SAID.0179.09)

بە گۆڕەدی بەلگەنامەیەک کە میژووی 18 ی مایسی سالی 1329 ی پۆمی (1913/5/31) لەسەر نووسراوە، مەلا محەمەد ڤاھیر ئەو کاتە موفتی قەزای ئورتاحەصار بوو، داخواینامەیکە بۆ مەشیخەتی عوسمانی نووسیوە و داوای ئیستیرحامنامە و یارمەتی کردووە. لە داخواییەکەدا ھاتوو کە بەندە چەند سالیکی لە قەزایەدا مودەرپس و موفتی و خزمەتی کردووە، تا ئیستا ھیچ ئیستیرحامنامەیکە پێ عەتا نەکراوە، بۆیە داوا دەکات یارمەتی بدرێ. لە سەر ناوی خۆشی؛ خۆی وەک موفتی و مودەرپسی ئورتاحەصار ناساندووە. دیارە داوای شەری بالقان و لەدەستدانی سەلانکی؛ ناوبراو مووچەیکە لە ئیزمیر وەرگرتوو و دواتر بۆ قونیه کۆچی کردووە.

## 2-موفتی لە قەزای ئەرەگلی قونیه

دیارە داوای لەدەستدانی سەلانکی و ھاتنی ھیزەکانی یۆنان بۆ ناو شارەکە کە بە شەری بالقان (1912/11/9) ناسراوە، عوسمانییەکان دەکشیئەو و مەلا محەمەدیش لەو شارە نامینی و ماوہیک لە رۆمی ئیزمیر دەبێ و دواتر لە قەزای ئەرەگلی (Ereğli) سەر بە شاری قونیه دەبیتە موفتی. بە گۆڕەدی بەلگەنامەیەک کە میژووی 4 ی جەمادولئاخیری سالی 1331 ی کۆچی (1913/5/11) لەسەر نووسراوە، ئاماژە بەو دراوە کە محەمەد ڤاھیر ئەفەندی لە جینی عەلی ئەفەندی لەو قەزایەدا بیتیە موفتی.

## 3-موفتی لە ئەدەنە

قونای سینیەمی موفتیەتی ناوبراو، لە ناوەندی ویلائیەتی ئەدەنە و سالی 1332 ی پۆمی بۆتە موفتی و ھەشت سال لەو پۆستەدا ماوہتەو. وەک لە بەلگەنامەکاندا دیارە لەو شارەدا وێرانی موفتیایەتی خاوەنی مەدرەسەیکەش بوو و بە رەسمی لەپال موفتیایەتیدا؛ خۆی وەک بەرپۆبەر و مودەرپسی ئولای مەدرەسەکەش ناساندووە. دیارە لەو سەردەمەدا ھیزەکانی فەرەنسای ئەدەنە بوونە و بۆیە لە نامەیکیدا لە 1919/12/14 داوای درێژکردنەوێ مۆلەتی لە فەرمانگە مەشیخەت کردووە بە ھۆی ھەبوونی ھیزەکانی فەرەنسای ئەدەنە.

ئەم قونایەتی ژبانی ناوبراو زۆرترین بەلگەنامە لەبارەو ھەبە، لە لایەکی ترەو لەم قونایەدا نەخۆشییەکە دەستی پیکردووە، بۆیە ئەو کاتە لە ئەدەنە موفتی بوو داوای لە ئەنجومەنی پزیشکی کردووە کە مۆلەتەیکە بۆ درێژبکەنەو (SD.02847.00007.002). دیارە گەنگەشە لەسەر مۆلەتەیکە ھەبوو و ھەر وەک لە بەلگەنامەیکەدا ھاتوو کە مۆلەتەیکە سەرەتا لە 11 ی تشرینی دووھمی سالی 1335 ی پۆمی بۆ 16 ی مارتی سالی 1336 ی پۆمی بوو و لەبەر سەختیی نەخۆشییەکە ماوہکە لە 16 ی مارتەو بۆ 1 ی اغسطوس ی سالی 1336 ی درێژکراوەتەو و دواتر دوو مانگی تریشی بۆ درێژکراوەتەو (BEO.004673.350407.002). ھەر بۆ ئەم بابەتە بۆچوونی دارایی وەرگیراوە و لەو بارەو دۆسیەیکە 43 لاپەرەیی لە نووسراوی فەرمانگە پەیوەندیدارەکان ھەبە (SD.02843.00058.018)

## 4-موفتی لە مقری کۆی

ئەم قەزایە کە ئیستا ناوەکەى گۆراوە بۆ (بەکرکۆی) سەر بە ئەستەنبۆل بوو. وا دیارە دواى نەخۆشکەوتنى و لەبەر ئەوەى زۆربەى کات بۆ چارەسەریی لە نەخۆشخانەکانى ئەستەنبۆل بوو، بۆیە لە ساڵى 1922 رازەکەى لە ئەدەنەوێ گواستۆتەوێ ئەم قەزایە و بۆتە موفتیی شارەکە، بەلام تەنیا هەشت مانگ لەسەر کارەکەى بەردەوام بوو و بەهۆى نەخۆشییەوێ وەفاتی کردوو. مانەوێشى لە ئەستەنبۆل وەک لە بەلگەنامەکاندا ھاتووێ زیاتر بۆ چارەسەر بوو، بۆیە ئەو کاتەى لە ئەدەنە دوور بوو، نووسراوى لایەنە پەيوەندیدارەکان ھەبوو کە ئاخۆ ئەو ماوێیەى لە ئەستەنبۆل بوو و بە میلاکیش لە ئەدەنە بوو، ئایا مووچەکەى بۆ خەرچ دەکریت یان نا؟ لەو بارەوێ گەنگەشەییەکى زۆر کراو و دواتر ناچار کراو کە رازەکەى بۆ بگوازنەوێ ئەستەنبۆل (ŞD.02843.00058.018).

## 2-8 نەخۆشکەوتن و وەفاتی

بەگوێرەى بەلگەنامەیک، کە ساڵى 1920ى لەسەر نووسراو، داخواینامەیکى ناوبراوى تێدایە و ئاماژەى بەوێ کردوو کە لە جیگا کەوتوو و تووشى نەخۆشى ھەوکردنى سێھەکان بوو و بەو ھۆیەوێ بۆ چارەسەرەگرتن چۆتە ئەستەنبۆل، بۆ ئەو مەبەستە داواى درێژکردنەوێ مۆلەتى دوو مانگی تری کردوو و لە فەرمانگەى فەتوا و مەشیخەتیش رەزامەندیی لەسەر مۆلەتەکەى دراو. پینشتیش لە بەلگەنامەیکدا ئەوێ نیشان دراو کە ناوبراوى نەخۆشى رۆماتیزمى ھەیە. لەنیو بەلگەنامەکاندا راپۆرتى پزیشکەیکەیشى تێدایە کە ناوى دکتۆر قودسییە -و لە ئەلمانیا خویندنى تەواو کردوو- و نۆرینگەکەى لە ئاکسەراى ئەستەنبۆل بوو و راپۆرتەکەى لە مانگی ئادارى ساڵى 1921 نووسیو و تێیدا ئاماژەى بە نەخۆشییەکەى کردوو و تەنانت لە 1922/1/10 کە هەشت مانگ پیش وەفاتیەتى، داواکاریى ناوبراوى سەبارەت بە مووچەکەى ھەیە و لەو بارەوێ بپار لەبارەى خەرچکردنى مووچەکەى دراو (ŞD.02847.00007.002) و وا دیارە ئەو نەخۆشییەى بەردەوام بوو تا سەرەنجام لە 1922/10/26 لە تەمەنى 53 سالیدا کۆچى دواى کردوو (ST.MFT. MSH.SAİD.0179.113). وا پێدەچى گۆرەیکەیشى ھەر لە ئەستەنبۆل بوو.

## ئەنجام

کورتەى سەربردەى فەرمانبەریی ئەم زانایە بریتیە لە:

لە 8ى زولحیججەى ساڵى 1327ى کۆچى (1909/12/21) بۆتە موفتیی ئورتاحەصارى سەلانیك، بە مووچەى چوارسەد قرووش و تا 16ى حوزەیرانى ساڵى 1329ى رۆمى (1913/6/29) بەردەوام بوو.

لە 16ى حوزەیرانى ساڵى 1329ى رۆمى (1913/6/29) بۆتە موفتیی قەزای ئەرەگلى لە ویلايەتى قۇنیە و تا 9ى تشرینی دووهمى ساڵى 1332ى رۆمى (1916/11/22) بەردەوام بوو.

لە 15ى تشرینی دووهمى ساڵى 1332ى رۆمى (1916/11/28) بۆتە موفتیی لە ناوهندی ویلايەتى ئەدەنە.

-له 23ی شوباتی سالی 1338 (1922/2/22) بۆته موفتی قهزای به کرکۆی به مووچهی ههزار قرووش له ویلايهتی ئهستهنبول و تا رۆژی وهفاتی له 26ی تشرینی یهکهمی سالی 1338ی رۆمی (1922/10/26) بهردهوام بووه (ST.MFT. MSH.SAİD.0179.88).

کۆی خزمهتهکهی دوازه سال و ههشت مانگ و ده رۆژ بووه. ئهگهر چی دواي مردنی وهک خانهنشینی ههموو رۆژانی خزمهتی دیاریکراوه، بهلام نازانری مووچهی خانهنشینییهکهی کێ وهریگرتووه، ئایا مندالی ههبووه، یان ههر هاوسهههکهی وهریگرتووه؟ زانیاری دیکه لهبارهی خیزان و بنهمالهکهی نازانین، ئهگهر چی دۆسیهیی ئهم زانیهمان یهکیکه له دۆسیه ههره دهولههمهدهکان و زیاتر له سهده لایههه نووسراوی رهسمی تیدایه.

-ناوبراو ماوهی زیاتر له ههژده سال دوور له ولاتی خۆی له دهقهری رۆم بووه به ههموو ناوچه جیاوازهکانهوه.

-چوار بهرهههمی نووسیوه، سێ له بهرهههههکانی له بواری زانستی ئایینین که کتیبی سهختن له تیگهیشتن و لهوسادا له حوجره و مهدرهسهکان دهخوینران.

-ئهم مامۆستایه شاعیر بووه و دیوانیکی شیعرێ به زمانی فارسی ههبووه و دیوانهکه تا ئیستا نه دۆزراوهتهوه.

-له رووی زانستییهوه، وێرای ئهوهی دوو ئیجازهنامهی زانستی وهرگرتووه، یهکیکیان له زیدی خۆی و ئهویتیشیان له ولاتی رۆم، لهگهڵ ئهوهشدا مودهپرسیکی سههرکهوتوو بووه و بهو هۆیهوه پایهی عوسمانی وهرگرتووه.

## Çavkanî

- جریدهء علمیہ (1336)، دردنجی سنه، عدد 36، اسطنبول.  
دیڕهشی و ئالیخان، سه‌عید و پیزانی (2005). دیوانا فه‌قیی ته‌یران، دهۆک: سپیریز.  
زه‌کی، محهمه‌د ئەمین (1939)، ته‌ئوخی سلیمانی و وه‌لاتی له‌ ده‌وره‌ی زۆر قه‌دیمه‌وه‌ تا ئه‌وه‌لی ئیحتیلال 1918م، چاپخانه‌ی النجاح، به‌غداد.  
عارف، محمد نوری (2009)، فه‌ره‌نگی دیوانی شاعیران-نالی، سالم، کوردی- ده‌زگای ئاراس، هه‌ولێر.  
فیضی، امین (1920)، انجمن ادیبان کرد، مطبعه‌ی ترجمان حقیقت، استمول.  
میران و شاره‌زا، سه‌ردار حمید-کریم مسته‌فا (1986)، دیوانی حاجی قادری کویی، ئەمینداریه‌تی روشنبیری و لاوان.


- Ahmad, H. O. (2021). The guidebook of administrative dossier of Kurdish scholars in Mashikhat archive in Turkey. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 7(13), 37-80.  
Ahmad, H. O. (2024). Osmanlı arşivlerinde Gulanbar kasabası hapishanesi ve suç tablosu (1912-1913) *Artuklu Kurdology* (17). 65-77. <https://doi.org/10.35859/akrd.1523580>  
Arif, M. N. (2009). *Ferhengî dîwanî şa'îran -Nalî, Salim, Kurdî-*. Dezgay Aras.  
Dêreşî, S. & Alîxan, P. (2005). *Dîwana Feqiyê Teyran*. Spîrêz.  
Feyzî, E. (1920). *Encumenî edîbanî kurd*. Metbe'ey Tercumanî Heqîqet.  
Mîran, S. H. & Şareza, K. M. (1986). *Dîwanî Hacı Qadîrî Koyî*. Emîndaryetî Roşinbirî û Lawan.  
Sarıyıldız, G. (2009). Sicill-i ahvâl defterleri. *TDV İslâm Ansiklopedisi*. (c.7, 134-136). Türkiye Diyanet Vakfı.  
Yıldız, E. (2021). *Meşihat arşivi belgelerine göre şeyhülislamlığın bürokratik yapısı*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). İstanbul Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü.  
Zekî, M. E. (1939). *Teoyxî Silêmanî û wellatî le dewrey zor qedîmewe ta ewwelî ihtîlal 1918m*. Çapxaney Alincâh.


## Arşiv Belgeleri

- B.O.A. BEO.004673.350407.002  
B.O.A. ŞD.02843.00058.018  
B.O.A. ŞD.02847.00007.002  
B.O.A. BEO.004653.348972.001  
B.O.A. BEO.004654.348996.002  
İST.MFT. MSH.SAİD.0179  
İST.MFT. MSH.SAİD.0179.04  
İST.MFT. MSH.SAİD.0179.113  
İST.MFT. MSH.SAİD.0179.88

## Pêvek: Hin belgenameyên erşîfa Osmanî.







حضور ساسی حساب مشیخناهی

درینو ساحتو افتخار حضرتی

سنة حاله ابول ماهنه عاید معاشنا اعطای و نه معامل سنا اجراسی محسنة دیوان محاسباته تودیع ایدلش سده

تاریخی تذکره سید ابلا اوقاف نظارت جلیله تبلیغ ایدلان شوری دولت مالیه نافع دایر سنا

مضبوطه توفیقها اعطای و نه معامل سنا اجراسی محسنة دیوان محاسباته تودیع ایدلش سده

مستبان اولمده در حالیکه دیوان بواجبه که نظرسنی و حوجه عدیده مردود و حقوق ضایعنا دی بولند یغنه بنا و رجوعه مملکت

محکم می عرض ایدلم اولای شوری دولت قرار مذکورینک داعیلین تطبیقی قرار مذکورده مصدر حکم بولان دایم

داعیلری ایدلر صفته اشتراکمه وابسته در حالیکه بواشرک با الکلیه مفعود در زیر قرار مذکورده حکم صادره بولان ذات

ایدلشرد داعیلری ایسره محل مأموریتدن ماذونیتل عودت ایدوب برای تدای ماذونیتل عید ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات

شوری دولت قرار مذکورینک قطعاً استناد ایدره و دنیا، دیوان محاسبات شوری دولت قرار مذکورینک ۲۸

تاریخی اتقی یلق بودجه قرار سنا ایکنی ماده سنی موضوع بحث ایکنی در میان ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات

بر دلیل تشکیل ایدره و زیر ماده مذکورده که امکان مجاره مجلسی مطلق اولوب مطلق بیوه افراد ندرن بر ذیل تبیینل تحقیق

ایدر انتقاسی ایسره اتقی بیون افراد سنا انتقاسیل محقق اولوب بوقاعده توفیقاً اظنه و لایبیل امکان مجاره اولوب موجود

اولوب اولمده یغنه تحقیق لازم کلیر بنا علیه امکان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

ایده دولت حالیکه نقطه نظر ندرن امکان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

نظر ندرن بولان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

معلوم بولنده نظر ولایت مذکورده امکان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

موجوبه اولمده ولایتی مأمورین معاش سنا موقوف طوطلمای ایجاب ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات ۲۸

ایشته دیوان محاسبات نظری محققاتی معروضه استو ابتدیکدن علمیه حاسب میرنده اظنه ولایتی مأمورین معاش سنا موقوف

طوطلوب طوطلمای یغنه ولایت مذکورده امکان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

مأمورین معاش امکان مجاره بولن میان مجاره بولنده داعیلینک تخصیصاً مرکز نقل ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات

مذکورده امکان مجاره سیمبر و ام بولنده یغنه تصدیق ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات ۲۸

حاصلیه ایدلشرد مجارات سیمبر و ام بولنده یغنه تصدیق ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات ۲۸

مرکز مأمورین معاش ایدلشرد امکان مجاره مجلسی مطلق سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

دانشا، دیوان محاسبات بواجبه که نظرسنی صحیح فرض ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات ۲۸

طوطلمای بولان معاش ندرن حرفات صلاحیتنی مالیه نظارت جلیله سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

جادی بولان استند عام مالیه نظارت جلیله سنا بر ذیل بولان مجارات مالیه اظنه و لایبیل مفعود

تصویب ایدلشرد نظارت واسطه سنا مقام مشیخناهی عرض ایدلشرد بنا برین دیوان محاسبات ۲۸

نظارت استعالی ایشته بولنده حقوق مقررده ملک ابطال بنیه اجتماعیه مرل استناد کاهی بولان عدل و حقه توفیقاً ۲۸

بناء کیفیت مذکورده سنا حقیقت ظاهر یغنه استناد کاهی بولان عدل و حقه توفیقاً ۲۸

معاذ بولنده سنا مستحضر ادبنا سنا هر حاله امر دایم حضرت سنا لایم که

باب مشیخ مأمورین میریتل فندن بارگنا

کاملاً


اطنه مرکز مقیسی

محمد ظهیر

OSMANLI ARŞIVI

|    |      |   |   |
|----|------|---|---|
| ŞD | 2847 | 7 | 2 |
|----|------|---|---|

ŞD.02847.00007.002



# EDEBIYATA BERXWEDANÊ

Resistance Literature

Barbara HARLOW

Wergera ji îngilîzî: Umran Aran, Yusiv Hemed

Pall, Diyarbekir, 2025, 272 rûpel,

ISBN: 978-625-98311-7-6

Ramazan KAYA

**Ramazan KAYA**

ORCID: 0009-0003-1473-5147 | remokaya@gmail.com  
Researcher Writer, Van, Türkiye.

**Citation/Jêgir/Atîf:**

Kaya, R. (2025). Nirxandina Pirtûkê "Edebiyata Berxwedanê".  
*Kurdiyat*, (11), 83-90. DOI: 10.55118/kurdiyat.1693970

**Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:**

Book Review/Nirxandina Pirtûkê/Kitap İncelemesi  
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 07.05.2025  
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 24.06.2025  
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2025

**Peer-Review/Hekemtî/Hakemlik:**

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

**Plagiarism Checks/Kontrola İntihalê/Benzerlik Kontrolü:**

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./  
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

**Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:**

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

**Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyan/Çıkar Çatışması:**

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokiya berjewendîyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

**Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddi Destek:**

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## Destpêk

Wêjeya berxwedanê, berhemên wêjeyî ne ku di nav têkoşîna li dijî pergalên siyasî yên zordar, dagirkerî, mêtîngerî, hegemonya çandî û şeweyên din ên serdestiyê de pêk tên. Ev wêje, bi gelemperî armanca bilindkirina dengê civakên bindest, zêdekirina hişmendiyê li dijî zordestiyê û xurtkirina têkoşîna kolektîf di hewînê. *Edebiyata Berxwedanê* (1987) ya Barbara Harlowê, di warê edebiyata postkolonyal de yek ji metnên bingeîn e û rê li ber gelek lêkolînên din ên di warê têkiliya di navbera wêje, berxwedan û siyasî de vekirî ye. Ev berhem di warê peywendiyên di navbera edebiyat û siyasî de xebateke pêşeng tê hesibandin. Di vê berhemê de Harlow li ser wêjeya berxwedanê ya li welatên Cîhana Sêyem disekine. Rola wêjeyê di têkoşîna li dijî mêtîngeriyê û serdestiya çandî de bi berfirehî analîz dike. Ew berhemên nivîskarên ji welatên cuda yên Afrika, Rojhilata Navîn û Amerîkaya Latîn dinirxîne û giringiya wan di pêvajoya azadiya bindestan de nîşan dide. Ew, behsa nivîskarên wekî Ghassan Kanafani (Filistîn), Ngũgĩ wa Thiong'o (Kenya), Mahasweta Devi (Hindistan), Mahmoud Darwish (Filistîn), Pablo Neruda (Şîlî) yên di bin bandora mêtîngeriyê de mane dike. Ev lêkolîn ji bo peywendiya di navbera wêje û siyasî de, bi taybetî di konteksta têkoşîna li dijî mêtîngeriyê de referanseke giring e. Harlow di vê pirtûkê de têgeha "wêjeya berxwedanê" pêşniyaz dike. Ev têgeh behsa berhemên wêjeyî dike ku di nav tevgerên rizgarîxwaz ên neteweyî de hatine afirandin û wek amrazek siyasî û çandî tene bikaranîn. Rola nivîskarên berxwedêr ji wek "şahidên dîrokê" û "dengê gelê xwe" radixe ber çavan. Ji bo Harlowê, wêje ne qada salonê yan jî ya takekesî ye, ew tomar kirina serpêhatiyên e, pevçûna hêzên dîrokî û tekoşîna jiyanê ya civakan e.

Ew gelên kolonîkirî yê ku bi salan di bin serdestiya Rojava û Amerîkaya Bakur de dijîyan, li dijî vê serdestiyê hem di warê siyasî û leşkerî de li ber xwe dan hem jî berhemên edebî yên ku rastiya gelên wan radixin ber çavan afirandin. Bi kurtasî edebiyata berxwedanê wek beşek ji têkoşînên rizgariya neteweyî û tevgerên berxwedanê li Afrika, Amerîkaya Latîn û Rojhilata Navîn derketiye holê. Ev herêm bi gelemperî wek welatên "cîhana sêyemîn" yan jî welatên ku di bin bandora mêtîngeriyê de mane, tên zanîn. Edebiyata van herêman bêguman bi têkoşînên rizgariya neteweyî ve girêdayî ye. "Rizgariya neteweyî" helbet tê wateya têkoşîna ji bo azadî û serxwebûna ji bindestiya kolonyalîzmê. Ev edebiyata ku wek edebiyata cîhana sêyemîn tê binavkirin, du armancên sereke dişopîne: Naskirina statûya xwe ya serbixwe, naskirina hebûna xwe ya wekî berhemên edebî. Ev edebiyat hem li hember kategoriya edebî û siyasî yên Rojavayê derdikeve, hem jî wan diguherîne, kanonên wan ên edebî bin pê dike, dixwaze perspektîfeke nû ya rexneyî bîne nav qada akademîk. Harlow xebata xwe wek hewldaneke perwerdehiyê pêşkêş dike. Ev tê wê wateyê ku armanc ne tenê agahdarkirina xwendevanan e, lê di heman demê de guherandina perspektîfa wan a li ser edebiyatê ye jî. Ew, edebiyata berxwedanê wek edebiyata ku yekser ji tevgerên azadiya neteweyî derdikeve pênas dike. Metnên vê edebiyatê, dibêje Harlow, ne bi şikl an forma xwe, bi erk û armancên xwe (bi piştgiriya li tevgerên azadiya neteweyî), xwe ji metnên din cuda dikin.

*Edebiyata Berxwedanê* rola wêjeyê di nav tevgerên rizgariyê yên ku di sedsala 20em de li "Cîhana Sêyemîn" dest pê kirîye û heta îro berdewam dike bi xwîner dide nasîn. Ev lêkolîn di heman demê de bi kategoriya edebî û siyasî yên Rojava re dikeve nav nîqaşê tûnd û wan vediguherîne. Mînak antropologê Fransî yê Afrikaya Bakur Jacques Berque îdia dike ku dîroka nûjen dê bi saya dekolonîzasyonê derkeve holê. Dîroknasê şerên gundiyan Eric Wolf jî di vî warê de xwediyê heman fikrê ye: Divê dîroka Ewropayê ji nû ve were nivîsandin û divê ev dîrok êdî "mirovên bê dîrok" jî bihewîne. Wolf, di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê *Europe and the People without History* (Ewropa û Mirovên Bê Dîrok) de, vê rastiyê tîne bîra xwendekarên dîroka rojavayî: "Ne Yewnaniya Kevnar, Roma, Ewropaya Xiristiyan, Ronesans, Ronakgerî, Şoreşa Pişesazî, Demokrasî û hetta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî wek bi îzole an tena serê xwe pêk nehatine. Ev geşedan encama têkiliyên civakî yên girift in ku her tîm jî aliyê demê û mekanê diguherin. Her pêşketin encama têkiliyêke pîralî ya di navbera civakan de bû. Bi gotina kurt û kurmancî, dîrok tenê ji çîroka kiryarên *zîlamên spî* pêk nehatiye" (Harlow, 2025, r. 39).

*Edebiyata Berxwedanê* bi kurtasî pêwîstiya şîroveyeke siyasî ya li ser metnên edebî diparêze. Harlow du pirsên giring derdixe pêş: "Ji bo kê" û "bi çi armancê" ev berhem hatine nivîsandin. Ev pirs hem ji bo xebata wê, hem jî ji bo berhemên ku ew lêkolîn dike giring in. Vegotinên berxwedanê yên di formên çîrok û romanê de hatine nivîsandin, hewldanên nivîskaran in ku serpêhatiyên xwe û şert û mercên maddî yên civakên xwe vediguherînin vegotinên dîrokî. Li gorî Harlowê, berhemên bi vî awayî, "mudaxele" ne, hewldanên serrastkirina tomarên dîrokî yên çewt ên hêzên zordaran in. Ango, nivîskar dixwazin ku serpêhatiyên xwe û yên civaka xwe di nav çarçoveya dîrokê de bi cih bikin. *Edebiyata Berxwedanê* qadeke

berfireh e ku gelek cure nivîs û nivîskarên di nav xwe de dihevin. Lîsteya çalakvan, rexnegir û “terorîstên çandî” yê ku edebiyata berxwedanê referans dide gelek berfireh e: Antonio Gramsci, C.L.R. James, Chinua Achebe, Nicolás Guillén, Wole Soyinka, John Berger, Edward Said, Angela Davis, Bessie Head, Mike Davis, Gayatri Spivak, Frederic Jameson, Nawal al-Saadawi, Pablo Neruda, Nelson Mandela, Rigoberta Menchu, Tariq Ali, Louis Althusser û gelek kesên din. Ev kes ji gelek welat û çandan in û bi piranî bi ramana çep û berxwedanê ve girêdayî ne. Li gorî xebata Harlowê, edebiyat ne tenê roman û helbest in, lê her wiha raporên mafên mirovan, belgeyên hiqûqî, bîranînên girtîyan, nûçe, rojname û heta nivîsên li ser kenarên rûpelan jî di nav xwe de vedigire. Vîzyon û derfetên ji bo afirandina civakeke adil û mirovane, mijarên sereke ne di berhemên nivîskarên wêjeya berxwedanê de. Berxwedan û berdêlên nivîskarên ên li hemberî hêzên serdest ku jiyan û ramanên wan sînoordar dikin jî di van vegotinên de cih digirin. Berhema Harlowê ne tenê ji ber giringiya edebî ya metnê ku ew dinirxîne, di heman demê de li ser pênasîya edebiyatê, cureyên wêjeyî û giringiya siyasî ya wêjeyê jî xebateke qîmetdar e. Armanca pirtûkê ew e ku gelek berhem û nivîskarên ku tê de hatine nirxandin, rengîn û berfirehiya wêjeya berxwedanê nîşan bidin.

Di bin sernavê Edebiyata Berxwedanê de, Harlow li ser jiyana nivîskar Ghassan Kanafani û tîkiliya wî ya bi edebiyata berxwedanê re bi rêzdarî radiweste. Ghassan Kanafani nivîskarekî Filistinî yê û di warê Edebiyata Berxwedanê de xwedî cihekî giring e. Kanafani di navbera dagirkerî û sirgûnê de, di bin zext û sansûrê de dinivîsand. Kanafani edebiyat ne tenê wek hunerekê, lê belê wek qadeke têkoşînê pênasî dikir. Edebiyata Berxwedanê, bi taybetî di mînakên Kanafani de, ne tenê hunerek e, lê belê beşek ji têkoşîna siyasî û civakî ye. Nivîskar di rewşên herî dijwar de, bi rêya nivîsandinê, li dijî neheqiyê û dagirkeriyê derdikeve û ji bo azadiyê tîdikoşe. Jixwe tîgeha "Berxwedan"ê cara yekem di sala 1966an de ji aliyê nivîskar û rexnegirê Filistinî Ghassan Kanafani ve di berhema wî ya bi navê *Literature and Resistance in Occupied Palestine* (Edebiyata Berxwedanê li Filistîna Dagirkerî) de ji bo pênasîkirina wêjeya Filistinî hatiye bikaranîn (Harlow, 2025). Kanafani, di navbera wêjeya ku "di bin dagirkeriyê de" hatiye nivîsandin û “wêjeya koçberiyê” de jî cudahiyek giring pêşniyaz dike. Li gorî vê ferqê, edebiyata berxwedanê tîkiliyeke kolektîf e, li ser niştîman, nasname û dozeke hevpar a politik hatiye honandin. Her wiha bi dîtina Kanafani, hewldanên wêjeya berxwedanê ya gelên ku hatine kolonîkirin, ji ber sedemên diyar bi gelemperî piştî rizgariyê bi ser dikevin. Lê Kanafani dibêje ku lîkoler divê bi xwe di nav tevgera berxwedanê de be, li ser erdên dagirkerî, yanî li cihê ku berxwedan pêk tê. Divê agahiyên di derbarê berxwedanê de rasterast ji devê beşdaran bê girtin. Bêyî van şertan tu lîkolîn nikare "temam" nabe.

Dema ku Ghassan Kanafani wêjeya Filistinî wek "wêjeya berxwedanê" bi nav dike, ew di çarçoveyêke dîrokî de dinivîse. Mebesta wî di vê çarçoveyê de bi temamî ev e: Ev helwest tenê bi têkoşîneke neteweyî re sînoordar nîne, rasterast di nav têkoşînên rizgarkirina neteweyî û tevgerên berxwedanê yê nûjen de li dijî desthilatdariya emperyalîst li Afrîkaya Bakur, Afrîkaya Navîn û Başûr, Amerîkaya Başûr, Rojhilata Navîn û Rojhilata Dûr a Asyayê cih digire. Kanafani bi îsrar li ser vê yekê tekez dikir; berxwedana çandî di stratejiya giştî ya berxwedanê de xwedî cihekî giring e. Berxwedan ne tenê bi çekan e, her wiha bi rêya çand û hunerê jî pêk tê. Eger em ê bi gotina wî ya bandordar bibêjin: “Eger berxwedan ji lûleya çekekê derdikeve, çek bi xwe jî ji daxwaza azadiyê derdikeve” (Harlow, 2025, r. 46). Daxwaza azadiyê bingeha hemû berxwedanan e. Ev daxwaz him berxwedana çandî him jî ya çekdarî dihevin. Berxwedan, bi gotineke din redkirina rewşa heyî û sîstema serdest e û helwesteke aktif e. Kanafani neçar e, ji êşa niha, gulên siberojê biçîne; ne wek Stendhal yan jî Dickens, ev ne perwaza baskên zêrîn ên xeyalê ye ji bo wî. Ev, rastiyeke çarenûsî ye ku di her hilma wî de dijî.

Yek ji nivîskarên ku di çarçoveya wêjeya berxwedanê de tê nîqaşkirin, nivîskar û akademîsyenê Kenyayî Ngugi wa Thiong'o ye û demeke dirêj e ji ber ramanên xwe yê siyasî li sirgûnê dijî. Tevgera “Mau Mau” serhildanek dijî-kolonyal bû li Kenyayê di salên 1950î de. Bandora wê ya li ser Ngugi nîşan dide ku ew bi pîrgirêkên netewî û kolonyal ve mijûl bûye. Ngugi komek kategoriyên cuda pêşniyaz kirine (1981), di gotara xwe ya bi navê "Wêje li Dibistanan" de. Bi dîtina Ngugi, di wêjeyê de du helwestên bingeîn hene: a) Estetîka zordarî û îstîsmarê: Ev helwest piştgiyariya sîstema kolonyal û emperyalîst dike. b) Estetîka têkoşîna rizgariyê: Ev helwest piştgiyariya têkoşîna ji bo azadiyê dike. “Wêje li Dibistananê”, di çarçoveya nîqaşê mezintir de hatiye nivîsandin. Nîqaş li ser naveroka bernameya wêjeyê ya li dibistanên Kenyayê bû. Komîteya xebatê ya 1973an jî bo guherandina bernameya wêjeyê ya dibistanan hatibû avakirin. Piştî serxwebûnê, Kenyayê hewl dida ku sîstema xwe ya perwerdehiyê ji bandora kolonyal rizgar bike. Rapora vê komîteyê wê demê di çapemeniya Kenyayê de bû sedema nîqaşên tund.

Rexnegir û teorîsyenê Perûyî Jose Carlos Mariategui jî di salên 1920an de li ser wêjeyê û civakê analîzên balkêş pêşkêş kirine. Ramanên wî di warê têgihiştina wêjeya welatên Amerîkaya Latîn de giring in. Mariategui dibêje ku ew rêbaz, cure û serdemkirinên wêjeyî yên ji hêla nivîskarên Ewropî ve hatine afirandin ji bo têgihiştina wêjeya Perûyê ne guncaw in. Li gorî Mariategui, wêjeya Perûyê xwedî taybetmendiyeke cuda ye ji ber ku di bin bandora kolonyal de bi pêş ketiye. Ji ber vê rewşê, divê em bi perspektîfeke cuda li wêjeya Perûyê binêrin. Mariategui pêşniyaz dike ku wêjeya wan welatan di sê serdeman re derbas dibe:

- a) Serdema kolonyal: Welat di bin bandora wêjeyî ya metropolê de ye.
- b) Serdema kozmopolît: Welat ji gelek çavkaniyên biyanî bandor digire.
- c) Serdema neteweyî: Welat kesayetî û hestên xwe yên taybetî bi pêş dixê.

Ew hewl dide ku di navbera nêrînên wêjeyî û civakî de hevsengiyekê çêbike.

Ev sê nivîskar û ramanwerên giring Ghassan Kanafani (Filistînî), Ngugi wa Thiong'o (Kenyaî), Jose Carlos Mariategui (Perûyî), li ser pirsgerêkên taybetî yên welatên xwe û demên xwe fikirîne. Helbet her dem û her civak xwedî pirsgerêk û pêdiviyên xwe yên taybet e. Çareserî divê li gorî van pêdiviyan bîn dîtin. Herçiqas pirsgerêk û çareserî cuda bin jî, ev sê nivîskar bi hev re parametreyên giştî yên berxwedanê derdixin holê. Ew diyar dikin ku serdestiya Rojavayê li ser *Cihana Sêyemîn* di gelek waran de heye: Aborî, leşkerî û siyasî. Ev serdestî bi *emperyalîzma çandî* re tê tamamkirin. Her nivîskarek li ser rewşa xweser a welatê xwe bifikirî jî, wan bi hev re çarçoveyeke giştî ji bo rizgarbûna ji "emperyalîzma çandî" pêşkêş kiriye. Ev çarçove dikare ji bo gelek welatan bibe bikaranîn. Ev nêrîn ji bo têgihiştina dînamîkên berxwedana çandî û siyasî li gelek welatên dagirkirî giring e.

Kanafani di 8ê Tîrmeha 1972an de, li Beyrûtê li ber malekê, bi teqîna bombeyek ku di erebeyekê de hatibû bicihkirin, jiyana xwe ji dest da. Îlana mirina Kanafani di rojnameya *Daily Star*ê de, ku bi îngilîzî li Beyrûtê diweşiya, wî wek "komandoyê ku tu carî çek bi kar neanî" pênase dikir û wiha didomand: "Çekê wî qelemek û rûpelên rojnameyê bûn, û wî ji komek komandoyan zêdetir zerer da dijmin." Îlan diyar dike ku bandora nivîsên Kanafani ji ya komek komandoyan mezintir bû, kuştina wî kiriyarek plankirî bû, ji ber ku ew jî bo dijminên xwe "mirovêkî xeternak" dihat hesibandin.

Ev tekst diyar dike ku têkoşîna ji bo azadî û mafê diyarkirina çarenûsê ne hêsan e û gelek caran bi zext û zordariyê re rû bi rû dimîne. Nivîskarên Edebiyata Berxwedanê di bin merc û zextên giran de dixebitin û şexs û berhemên wan di bin xetereyê de ne. Desthilatdar hewl didin ku belavkirina agahî û ramanên wan asteng bikin. Belge, kovarên dîrokî yên giring ên tevgerên berxwedanê bi zanebûn tînin îmhakirin. Armanca wan helbet jêbirina bîra kolektîf a civakê ye. Gelek caran ev nivîskar ji aliyê desthiladaren zordar ve tînin girtin û tînin kuştin. Gelek nivîskar û çalakvan bi rêya girtîgehê û terore hatine bîdengkirin. Lê girtîgeh di heman demê de ji aliyê hin girtiyên ve hatiye veguherandin, bi saya wan bûye navnîşaneke berhemdarî û nivîsandinê. Harlow hem yê ku hatine kuştin bi bîr tîne, hem jî giringiya berhemên wan girtîyan ên ku piştî mirina wan jî bandora xwe didomînin, radixe ber çavan. Vegotinên van nivîskaran li dijî sînordarkirinên girtîxaneyê derdikevin. Bi taybetî, bikaranîna zimaneke kolektîf ("em", "ya me") ku di girtîxaneyan de qedexeyê ye, bala mirov dikişîne. Lê belê, nivîskar bi bikaranîna van gotinan li dijî vê yekê derdikevin.

### Bîranînên Girtîgehê yê Girtiyên Siyasî

Hin kesên din bi salan di girtîgehê de mane, bi qasî karûbarên xwe yên siyasî ji ber nivîsên xwe jî hatine mehkûmkirin. Gelekên van nivîskaran bîranînên tecrûbeyê xwe ya girtîgehê nivîsîne yan berhev kirine û ev deqên wan kategoriyeke taybetî pêk tînin ku di çarçoveya berfirehtir a edebiyata berxwedanê de peyda bûne. Harlow di vê berhema xwe de giringiyeke taybet dide bîranînên girtîgehê. Van bîranînan wek çavkaniyeke giring a agahdariyê dibîne. Lewre bîranîneke girtîgehê ya ku bi awayekî takekesî hatiye nivîsandin, beşek ji dîroka kolektîf û civakî ye. Serpêhatiyên takekesî dikarin ronahiyê bidin ser bûyerên dîrokî yên mezintir û rewşên civakî. Beşek ji pirtûka Harlowê ji van vegotinên girtîgehê pêk tê. Li gorî Harlowê ev bîranîn ji bo têgihiştina dîroka sedsala 20an û wêjeya wê gelekî giring in. Her wiha ev bîranîn ji bo fêmkirina dîroka dirêj a têkoşîna li dijî emperyalîzm û mêtîngeriyê jî giring in ji ber ku ev girtiyên siyasî beşek ji vê têkoşînê ne. Ev bîranînên girtîgehê yê girtiyên siyasî, ne tenê çîrokên kesane ne, ew belgeyên dîrokî û civakî ne ku dikarin alîkariya me bikin ku em dîrok, wêje û têkoşînên civakî û siyasî yên

sedsala 20an baştir fêm bikin. “Bîranînên girtîgehê ji bo xatirê wê yekê nayên nivîsîn ku “kitêba yekî bi xwe” hebe, ew bêtir belgeyên kolektîf in, şahidî ne ku ji bo têkoşîna hevpar ji hêla takekesan ve tîn nivîsîn.” (Harlow, 2025, r. 162). Ji bo piraniya şoreşgerên azadiyê, zîndan bûne zanîngehek ku wan dikarî li wê têkoşîna xwe ya berê bidomînin û bi pêş de bibin. Piştî ku şoreşgerek tê girtin, ew di nav serboriyên dijwar re derbas dibe. Di nav sînorên teng ên çar diwarên de, di bin siya tarîtiyê de, gava ku ji bo li hemberî ceribandineke nû ya êşkenceyê stûyê xwe netewîne, hewl dide giyanê xwe û hestên xwe bihêz bike, pîrsek wek marekî ketiye dilê gelek girtiyên serhildêr û kul dide: “Çima min heta niha qet tiştek nenivîsand?” Maya Angeolu dibêje “Ti êşa girantir ji hilgirtina çîrokeke bédeng a di hundirê we de veşartî tune ye.”

Edebiyata zîndanan bi rastî perçeyekî giring ê dîroka berxwedana gelê kurd e jî. Di dirêjahiya dîrokê de, gelek nivîskar û helbestvanên kurd serpêhatiyên xwe yên zîndanê di nav rûpelên berhemên xwe de neqîşandine. Nivîskar û helbestvanên kurd ên ku ji nişên cuda wekî Musa Anter, Recep Maraşlı, Yılmaz Odabaşı, Ahmet Arif, İlhan Sami Çomak, Tonguç Ok, Murat Canşad, Menaf Osman, Mizgîn Ronak û Rıza Kazıcı, tevî tixûb û astengiyên li paş diwarên girtîgehan jî destê xwe ji afirandina wêjeyî neqîşand û ew kaniyan, gotin û helbestên xwe domandin. Ev cure berhem bi gîştî têkoşîna civakî û siyasî, lêgerîna nasnameyê û ruhê berxwedanê nîşan didin. Herwekî ku bi hezaran mirov ji ber têkoşîna Tevgera Azadiya kurdan a li hemberî neheqiyên ku di nav salên dirêj de domandine hatine qirkirin, bi hezaran mirov jî di hundirê tarîtiya zîndanan de hatine hepskirin. Têkoşerên kurd ên ku avêtine zîndanan, di warên mîna dîrok, mîtolojî û herwiha edebiyat û hemû qadên din de xwe perwerde kirine. Ew tiştên ku di dibistanên pergala mêtînger, di zanîngehan de qet nebihîstine, fêr nebûne, di nav çarçoveya girtîgehan de dixwînin, fêr dibin û li ser wan bi saetan nîqaşan dikin. Bi rêya pirtûk an jî kovaran serpêhatiyên xwe digihînin xwendevanên ji derve. Li dijî pergala ku hewl dide wan tune û kedî bike têdikoşin. Weşanxaneya Aram, wekî pêşengeke qada çap û belavkirinê, berhemên wêjeyî û ramyarî yên girtiyên siyasî yên kurd digihîne ber destê xwendevanan û di vî warî de xwediyê cihekî sereke ye. Li gorî Firat Çan (5.12.2022), têgeha “Wêjeya Zîndanê” şaş e ji ber ku zîndan, di heman demê de eniyêke şoreşê ye jî. Berhemên ku ji qada zîndanê derdikevin, beşek ji berxwedanê ne. Ez bawerim ku divê mirov rastiye neperçe bike û divê mirov wê di nav tevahiyeke de bigire dest. Ji ber ku ez wiha lê dinêrim, ez difikirim ku parçekirina wêjeyê jî bi xeterî ye. Bi taybetî dema ku mijar wêje be, divê navlêkirinên li gorî cihê ku hatiye nivîsandin, qet neyê kirin. Dema ku em wiha dikin, em zêdetir wate didin cihê ku em tê de ne. Lê belê ji bo me, tiştê wateyê, bi rûmet û giring ne cihê ku em tê de ne, lê çawa ku em li wir dijîn. Li vir divê mirov bêguman giringiya cih înkâr neke. Em tenê dixwazin destnîşan bikin ku cih ne her tişt e.”

Bêguman, nivîskariya di nav sînorên zîndanê de gelek astengî û dijwariyên xwe jî dihevwîne. Mirovê ku di zîndanê de dinivîse, li her çar aliyên wî/ê diwarên betonî bilind dibin. Ji ber vê yekê ew neçar e ku bi hêza xeyalan, sînorên dem û mekan bişkîne. Di nav çarçoveyê de teng de afirandina gerdûneke xeyalî ya bêdawî ne karekî hêsan e. Yek ji astengiyên mezin jî windabûna derfeta çavdêriyê ye. Nexasim gava ku ew li ser wargehên ku ji salên dirêj ve jê bi dûr ketine destnîvîsên xwe diafirînin, bîranîna gelek hûrgiliyan pîr zehmet e. Herwiha nivîskar, hewceyî pirtûk, kovar û çavkaniyên ku dikarin jê sûd wergirin hene lê hem pirtûk hem jî weşanên demkî yan nedemkî ji bo wan sînardar in. Sê pirtûk, pênc kovar û divê ev kovar û pirtûk jî di sansûra girtîgehê re derbas bibin. Heke Barbara Harlow ji çavkaniya wêjeya berxwedanê ya kurdan a di nav tarîtiya zîndanan de peyda bûye agahdar bûya, bêşik wê di beşa “Bîranînên Girtîgehê yên Girtiyên Siyasî” ya pirtûka xwe de, ronahiyeke mezin biavêta ser vê mijarê û wê gelek nimûne û mînakên hêja pêşkêş bikira.

### Edebiyata Kurdî, Edebiyata Berxwedanê ye?

*"Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya rizgarî û xweşiyê vedike"*

Di çarçoveya taybetmendiyên ku Harlowê ji bo pênasekirina edebiyata berxwedanê destnîşan kirine, gelo em dikarin edebiyata kurdî jî wek edebiyata berxwedanê pênase bikin? Ji bo bersivdana vê pîrsê, divê berîya her tiştî em taybetmendiyên ku Harlowê ji bo edebiyata berxwedanê destnîşan kirine bibîr bînin. Ji bo edebiyata berxwedanê taybetmendiyên sereke yên ku Harlowê balê dikişîne ser wan xalan ev in:

1. Derketina rasterast ji tevgerên azadiya neteweyî
2. Çalakî û dilsoziya bo têkoşîna li dijî zordestiyê

3. Giringiya erk û armancên edebiyatê li şûna şikl û formê

4. Piştgiriya tevgerên azadiya neteweyî

Li gorî van taybetmendiyên helbet em dikarin qismekî edebiyata kurdî ya modern jî wek edebiyata berxwedanê pênase bikin. Clémence Scalbert-Yücel di gotara xwe ya bi navê Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebiyata Kurmancî ya li Tirkîyeyê de, edebiyata kurdî dixê nav kategoriya edebiyata berxwedanê. Lewre, bi erk û armancên xwe edebiyata kurdî ya nûjen piştgiriya tevgerên azadiya neteweyî dike, nivîskarên wê/î bi piranî milîtan yan çalakvan in. Xaleke din a giring ku Clémence Scalbert-Yücel balê dikişîne ser ev e: Nifşa yekem a rewşenbîrên kurd (Musa Anter, Mehmet Emin Bozarslan, Cigerxwîn), rewşenbîrên pîrralî ne. Ew xwedanên gelek sifetan in, wek dîroknas, rojnameger, zimanzan, nivîser û hwd. "Bi regekî yekser îlhama xwe jî çîrokên gelêrî, jî zehmetiya jiyana rojane, jî şertên giran ên civakî û siyasî û jî hewlên berxwedanê werdigirin." (Scalbert-Yücel, 2014, r. 73).

Nifşa duyem (Fîrat Cewerî, Mehmet Uzun, Mahmut Lewendî, Xelîl Dihokî, Hesenê Metê, Lokman Polat, Laleş Qaso, Zeynelabidin Zinar, Mehmet Emin Bozarslan Fîrat Cewerî, Mehmet Uzun, Mahmut Lewendî, Xelîl Dihokî, Hesenê Metê, Lokman Polat, Laleş Qaso, Zeynelabidin Zinar, Mehmet Emin Bozarslan) a nivîskar û rewşenbîrên kurd wek "nifşê sirgûnê" jî tê binavkirin, jî ber ku piraniya wan li derveyî Kurdistanê, bi taybetî li Swêdê, dijîn. Gelek jî wan beriya 12 îlonê endamên partî û rêxistinên kurdan bûn ku piştî derbeya leşkerî hatin qedexekirin. Wan li welatên bîyanî jî milîtanîya siyasî berê xwe dan xebatên edebî û zimanî. Hewl dan ku formên nû yên edebî wek roman û çîrok pêş bixin li şûna helbestan, lewre helbest formekî kevn bû û jixwe têra xwe berbelavtir bû di nav derdora milîtanên siyasî de. Armanca wan ew bû ku edebiyata kurdî bigihînin asta navneteweyî, li hember înkara ziman, nasnameya kurd û asimilasyonê rawestî, birewerî û şahidiyên xwe bigihînin nifşên nû û dîrok û têkoşîna kurdan bidin nasîn di nav civaka navneteweyî de.

Nivîskarên nifşê sêyemîn di edebiyata kurdî de, heta radeyekê encama guherînên siyasî û çandî yên di salên 1990î de li Kurdistanê û Tirkîyeyê ne. Ji salên 1990î ve, Stenbol bû navendeke giring a sazûmankirinê jî bo ziman û çanda kurdî. Di van salan de li Bakur tevgera kurd bû hêzeke serdest di siyaseta kurdî de û gelek kesayetên rewşenbîrên kurd ên kevin û nû ber bi xwe ve kişand. Di 28ê Îlona 1991ê de Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) hate damezrandin. Di 18ê Nîsana 1992yan de jî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê vebû. Xebatên NÇMê bêtir li ser afirandina hunerî bûn, lê yên Enstîtuyê bêtir li ser lêkolîn, berhevkirin û zanîna bûn. Rojnameya Welat jî di nav vê tevgera berfireh de, bû yekem rojnameya kurdî ku ji sala 1992yan ve dest bi weşanê kir. Nemaze kovarên Rewşen (1992-1996) û Jiyana Rewşen (1996-2000) cihekî giring digirin jî ber ku wan nifşek nivîskar perwerde kirin û bingeheên edebiyata modern a kurdî li bakurê Kurdistanê danîn. Clémence Scalbert-Yücel vê nifşê wiha pênase dike: "Endamên vî nifşê ne milîtan in, belku ciwan in û alîgirên doza kurdî ne lê dixwazin "bi awayekî din" xizmetê li doza kurdî bikin. Di demekê de ku nivîsîna bi kurdî sala 1991ê serbest dibe, û ku yekemîn rojnameyên kurdî jî ber pêdiviya bi rojnamegeran derfetên berçav didine nivîseran, û ew rojname xwîner û nivîseran bi nivîsa kurmancî re çavnas dikin, endamên vî nifşê edebî bi taybetî bala xwe didine ser çîrok û helbestê. Ev nifş dengê welatî vediguhêzin." Xebata Scalbert-Yücel a li ser edebiyata kurdî helbet hemû deverên Kurdistanê nagire nav xwe, serdemkirina wê bi beşa Bakurê Kurdistanê ve sînordar e.

Zülküf Ergün jî di gotara xwe ya "Gotara Dîjkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de" li ser gotara dij-mêtingeriyê û naveroka di berhemên nivîskarên kurd ên li dora kovara Hawarê kom bûne hûr dibe. Li gorî Ergün berî her tiştî, "yekem car, Hacı Qadirê Koyî bû berdevkê vê serdema nû di edebiyata kurdî de. Hacı, Kurdistan wek welatekî "bindest û pestkirî" pênase kir û bi dengê qube bang li kurdan kir jî bo serxwebûnê" (Ergün, 2014, r. 23). Rêxistina Xoybûnê û kovara Hawarê di pêşxistina hîzrên berxwedanê de jî bo kurdan qonaxeke dîrokî ne. Kovara Hawarê di sala 1932yan de li Şamê, paytexta Sûriyeyê, jî aliyê çalakvan û rewşenbîrên kurd ên penaber ve hat weşandin. Damezrînerên sereke Celadet Alî Bedirxan û birayê wî Kamiran Alî Bedirxan bûn. Piraniya nivîskarên Hawarê, piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd ji Tirkîyeyê reviyabûn û li Sûriyeyê bi cih bûbûn. Kovar bû platformek jî bo pêşxistina edebiyata neteweyî ya kurdî û berdewamkirina daxwazên neteweyî yên kurdan. Nivîskarên Hawarê bi rêya berhemên xwe yên wekî gotar, helbest, çîrok û hwd. hewl dan ku nasname û hişmendiya neteweyî ya kurdî xurt bikin. Her wiha kovarê Kurdistan wek welatekî kolonîkirî û gelê kurd jî wek gelekî bindest û çewisandî pênase dikir.

Bi rastî jî, wê demê hemû şert û mercên ku di mêtîngehekê de serdest in, li Kurdistanê jî xwe nîşan didan. Wek ku Ergün jî neqil kiriye, Celadet Alî Bedirxan di çîroka xwe ya "Ber Tevna Mehîfûrê" de, Bakurê Kurdistanê di bin dagirkeriya tirkên de nîşan dide û diyar dike ku bi destê wan gelek serok, şêx û mezinên kurdan hatine bidarvekirin, jin û zaroyên wan hatine kuştin, mal û milkên wan hatine talankirin û jin û zarokên wan ên bêxwedî li bajarên xerîb birçî û tazî hatine hiştin (Bedir-Xan C., 2012: 51). Zülküf Ergün, bi hûrgilî karakter û bûyerên di berhemên gelek nivîskarên kurd (Celadet Bedirxan, Kamiran Alî Bedirxan, Nûredîn Üsîf, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Telet Qedûr Hecî Elî Begzade û Hevîndê Sorî) ên ku di kovara Hawarê de hatiye weşandin analîz kiriye û gihîştîye vê qinyata zelal:

"Edebiyata Hawarê ji aliyekî ve edebiyata neteweyî ye, ji aliyê din ve jî edebiyateke dijkolonyal e. Ji bo vê jî, di gelek deqên Hawarê de, kesayetên edebî di riya rizgariya neteweyî û têkbirina desthilata kolonyal a tirkên de bi nasnameya xwe ya neteweyî dihesin û bi vê nasnameya kolektîf roleke çalak û erênî digêrin. Kesayetên deqên edebî yên Hawarê di çarçoveya rizgariya neteweyî de bi deng û rengên xwe yên dijkolonyal derdikevin pêş. Nivîskarên Hawarê bi armanca pêgihandina lehengên xwe yên neteweyî gelek caran dimenên çewisandina welat û bînpêkirina nîrxên neteweyî berçav dikin û bi vî awayî jî êş û şerpeztîya gel û niştîman kesayetiyên neteweyî yên dijkolonyal diafirînin. Ji ber vê jî, nivîskarên Hawarê, di deqên xwe yên edebî de, bi rûdanên trajîk zemîna hişyarî û haydariyê amade dikin" (r. 34).

Hawar ne tenê kovarek bû, di heman demê de platformek bû ji bo têkoşîna çandî û zanistî li dijî kolonyalîzma dewleta tirk. Wek ku em di mînakê kovara Hawarê de jî dibînin ku têkoşîna li dijî kolonyalîzmê ne tenê bi awayekî çekdarî, lê bi riya perwerdehî û zanîne jî pêk tê. Celadet Bedirxan û hevalên wî bi rêya Hawarê hewl didin ku li hember vê "zanîna kolonyal" zanîneke "dijkolonyal" belav bikin û nasnameya kurdî û zimanê kurdî biparêzin û pêş bixin.

Edebiyata kurdî ya modern bi gelemperî li gorî berxwedana neteweyî û çandî ya kurdan bi pêş ketiye. Bi pirsgerêkên civakî û siyasî yên gelê kurd ve têkildar e. Li hember zordarî, asimilasyon û înkara mêtîngeran, wek qadeke berxwedanê hebûna xwe heta îro parastîye û piştgirî daye têkoşîna rizgariya neteweyî ya kurdan. Her wiha bikaranîna zimanê kurdî bi tena serê xwe helwestek e, li hemberî mêtîngeran ji bo parastina nasname û çanda kurdan. Ev edebiyat ne tenê refleksiyoona civakê ye, her wiha hewl dide ku bandorê li ser hişmendîya neteweyî û çandî ya kurdan bike. Wek tê dîtin edebiyata kurdî gelek taybetmendiyên edebiyata berxwedanê di xwe de dihevine. Pîvanên edebiyata berxwedanê yên Harlow jî her alî ve bi edebiyata kurdî re gelek hevaheng in. Di sala 1987an de, berhemên kurdî yên wergerandî bo îngilîzî mixabin kêmbûn, ev jî bû sedema nebûna beşeke taybet ji bo edebiyata kurdî di xebata Harlowê de ya bi navê *Resistance Literature*.

Bûyerên dîrokî û qeyranên global di vê sedsalê de jî bi awayekî wêranker hebûna xwe diparêzin. Wêrankirina ekolojîk û krîzên îklîmê, pandemiya vîrûsê, gelên bê dewlet, penaberên li çar aliyên cîhanê belavbûne û hwd. Barbara Harlow di vê serdema aloz de derbarê rola edebiyatê de pîrseke giring dike. "Di serdema mayîn û HIV/AIDSê de mirov edebiyatê çawa binivîse? Serdemeke sîvîl li hemberî mirovahiyê ku ev sîvîl plotan hilawestî, bûyersaziyê şikestî, jeneolojiyan jihevqutkirî û nîşan wîndî dihele." (r. 19). Bêguman ev yek ji pîrsên ku bersivdana wan gelek zehmet e. Lê bersiv helbet di nav tekstên Harlowê de weşartî ye. Ew pêşniyaz dike ku ji bo têgihîştina edebiyata berxwedanê, divê em berê xwe bidin ezmûn û pratîkên berxwedêran bi xwe. Ew rêyên ku berxwedêr lê meşîyane û ew şopên ku li pey xwe hiştîne, ji bo me armanc û rola edebiyatê jixwe diyar dike.

Yek ji misyonên Harlowê jî ew bû ku têkoşîn û berhemên berxwedêran wek beşek ji mîrateya çandî ya mirovahiyê ji nîşên paşerojê re bihêle. Harlow dixwaze ku nîşên nû hay ji fedakarî û hêviyên wan berxwedêrên berê hebin û vê mîrateyê biparêzin. Hêza wêjeyê ya di qada siyasî de ew e ku dikare tiştêkî ji textê wî daxîne, û bi vî awayî, deriyê welatên xeyalan li ber me vedike da ku em li şûna wî, tiştêkî nû, tiştêkî çêtir di hizra xwe de biafirînin û pê jiyaneke nû bixemilînin.

**Çavkanî**

- Can, F. (2022, Berfanbar 5). Zindan deşil direniş edebiyatı. *Yeni Özgür Politika*.
- Ergün, Z. (2014). Gotara dijkolonyal û wêneyê serdestiya tirkan di kovara Hawarê de. dnd. Remezan Alan, Ergin Öpengin (Ed.). *Tîr û Armanc Gotarên rexneyî li ser edebiyata kurdî ya modern*. (23-48). Peywend.
- Harlow, B. (2025). *Edebiyata berxwedanê*. (Ji îngilîzî: Umran Aran, Yusiv Hemed). Pall.
- Sacalbert-Yücel, C. (2014). Paratekst û berxwedan di pênasoya edebiyata kurmançî ya li Tirkîyeyê. dnd. Remezan Alan, Ergin Öpengin (Ed.). *Tîr û Armanc Gotarên rexneyî li ser edebiyata kurdî ya modern*. (71-86). Peywend.